

naveroke

SERGOTAR <i>Editor</i>	ÇIROKA TAVA XWÎNŞIKESTIYAN <i>Evdile KOÇER</i>
2	51
PIRÊN ŞIKESTÎ <i>Serwet DENİZ</i>	C(J)ANA MIN <i>Şêrko</i>
3	52
RASTBÎNÎ ANGO REALÎZM <i>Adar JIYAN</i>	ŞEVRÛYAM <i>Ayhan GEVERÎ</i>
7	53
KEDKARÊ KELEPORA KURDÎ: MELE XELEFÊ BAFEYÎ <i>Faysalê ÜSIV</i>	KODA DARÎN <i>Sîpan XIZAN</i>
9	54
ŞOPA BAVÊ MIN <i>Behlûl ZELAL</i>	ZAGONA ZIKMAKÎ <i>Şengul OGUR</i>
11	55
PELÊ DAWÎN <i>O HENRY</i>	DU PEŞK <i>Dilxwaz HERDEM</i>
15	56
XWÎNA STRANÊN MEHEMED ARIFÊ NEMIR <i>Omer DILSOZ</i>	BI XATIRÊ TE <i>Xangul OZBEY</i>
19	57
HÊVIYA LI DÛ MIRINÊ MAYÎ <i>Dilawer ZERAQ</i>	EM BIÇIRISIN HEVALINO! <i>Azad RONAKBAR</i>
20	58
DI HELBESTA CEGERXWÎN DE ŞÊWEYÊK: HELBESTNAME <i>Arjen ARÎ</i>	ŞANO (TEATRO) <i>Ayhan MERETOWAR</i>
22	59
	SÊ METHELOK <i>Koçer</i>
	63

dosye

DOSYE – SEYDAYÊ TÎRÊJ <i>Amadekar: Enise ŞÎRÎN - Azad ZAL</i>	SEYDAYÊ TÎRÊJ DI ÇEND RÛPELAN DE <i>Ciwanê ABDAL</i>
25	35
SEYDAYÊ TÎRÊJ Û DÎWANA YEKEM XELAT <i>Zinar SORAN</i>	ŞÎNA SEYDAYÊ TÎRÊJ <i>Ciwanê ABDAL</i>
27	38
PÊŞGOTINA DÎWANA YEKEM XELATÊ <i>Zinar SORAN</i>	XWENDINEK LI DÎWANA XELAT A SEYDAYÊ TÎRÊJ <i>Îbrahim EBDÎ</i>
28	39
DU HEVPEYVÎN BI SEYDAYE TÎRÊJ RE <i>W</i>	BILBILÊ DÎLŞADÎ <i>Seydayê TÎRÊJ</i>
30	42
HELBESTVANEKÎ JI NÎFŞÊ KEVN BI NÎFŞÊ NÛ RE DIPEYÎVE <i>Hevpeyvîn: Konê REŞ</i>	TÎRÊJÊ BILBILÊ DÎLŞAD <i>Mizgîn AYDIN</i>
31	43
“EM HEMÛ BERPIRSIYARÊ ÊŞA VÎ GELÎ NE” <i>Hevpeyvîn: Dildarê Midî</i>	JIN DI HELBESTÊN TÎRÊJ DE <i>Daner: Mahmûd BADILÎ</i>
33	45
XEWNA MIN Û BERSIVA CEGERXWÎN <i>Seydayê TÎRÊJ</i>	EY WELAT <i>Seydayê TÎRÊJ</i>
34	47
BERSIVA NAYIFÊ HESO <i>Cegerxwîn</i>	PÊ XWEŞ IM <i>Seydayê TÎRÊJ</i>
34	48



Weşana Enstîtuya Kurdî ya Amedê
Kovara Dumehane
Hejmar 16
Rezerber - Kewçêr 2007

Xwedî & Berpirsiyariya Nivîsaran:
Semra OZBEY
Editor:
Enise Şîrîn ÇAGER - Azad ZAL
Sererastkirin:
Semra OZBEY - Serwet DENİZ
Mizanpaj & Berg
Azad ZAL
Şewirmendê Hiqûqê:
Av. Muharrem Erbey

Çapxane:
Berdan
Navnîşan:
Kalem Sk. No: 32 Huzurevleri
DIYARBAKIR
Tîf:
(0412) 237 43 16
E-Mail:
kovaraw@yahoo.com
kovarawe@hotmail.com
WEB:
www.kovaraw.com
Şertên Abonetiye:
Nava Welat, salek: 20 YTL
Welatên Dereke, salek: 60 EURO

Banqe & Nimroya Hesabê:
Semra OZBEY
Türkiye İş Bankası 8300 Diyarbakir
YTL: 8300 195 27 89
EURO: 8300 071 16 47
USD: 8300 071 16 52
Nimroya Hesabê PTT'ê:
Semra Ozbey - 5426215

*Nivîsên ku ji bo weşanê ji kovarê re tîrên şandin, li xwediyên wan nayên vegerandin.
Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji Edîtor...

Merheba

Piştî demeke ji her aliyê ve germ, careke din dem xweş be xwendevanên hêja!

Ji bilî germa havînê germa hîlbijartinan jî gelek bandorker bû. Di pêvajoya hîlbijartinê de bi gelek mebestan qala zimanê kurdî jî hat kirin û hinek nîqaşên sivik jî hatin kirin. Lê bi rastî zimanê kurdî çawa ku nebû zimanê hîlbijartinan wisa jî ji bo zimanê kurdî bernameyek ji hîlbijartinan derneket. Hêviya me ew e ku parlamenterên li ser navên kurdariyê hatine hîlbijartin di demên pêş de ji bo zimanê me bi bernameyêke têr û tijî dakevin qada têkoşînê.

Di hejmara 15'ê emîn de wek dosye me Erebe Şemo hilgirtibû dest. Lê ji ber navê "Erebê Şemo" rêzdar Yaşar Eroglu di rojnameya Azadiya Welat de rexne li redaksiyona me girtibû. Di nav jiyana de wekî din jî çend kesan qala heman mijarê kir. Ji bo vê yekê em ê wiha bibêjin: Wek ku Eroglu jî gotiye ji aliyê mantiqê ziman ve tu çewtî di kirina me de tune ye. Lê tê gotin ku wî bi xwe jî xwe re gotiye 'Ereb Şemo'. Bi rastî me jî li ser pirtûkên wî yên ku berê hatibûn çapkirin bi wî awayî xwendibû. Lê di dema sererastkirina nivîsan de ev nav bi awayên cur bi cur derket pêşberî me. Diviya bû ku em biryarekê bidin. Em fikirin ji ber ku kesên ku pê re jiyabûn û ji nêz ve nas dikirin, bi awayê "Erebê Şemo" nivîsibûn û ya ku li xwezaya zimanê kurdî jî dihat ew bû, me jî ew hîlbijart. An na nêzikahiyeke me ya ku em navê kesan biguherînin nîn e. Û her tim jî derfeta mirov çênabe ku mirov her tiştî li gora dilê xwe vekole. Li pêşiya me demeke kin hebû, em mecbûr bûn ku biryarekê bidin. Heman pirsgirêk di vê hejmarê de jî heye. Mînak, navê Seydayê Tîrêj bi çend awayan hatiye nivîsandin, wek Naîfê Heso, Nayîfê Heso, Nayîfê Heso û Nayîf Heso. Niha ji vanê hanê kîjan rast e? Navê gundê wî ku tev tevî hev peyvek e, bi sê awayan hatiye nivîsandin wek Nicim, Nicîm û Necîm. Yên ku nivîs nivîsîne jî tev yê ku ji nêz ve nas dikin û li ser jiyana wî lêkolîn kirine ne. Rewş ev rewş e. Ku çewtiyek hebe ji ber vê rewşê ye.

Xwendevanên delal;

Di vê hejmarê de jî me hewl da ku kovareke têr û tijî bigihînin ber destê we. Di vê hejmarê de ji bilî dosyeyê Serwet Denîz, Adar Jiyan, Faysalê Ûsiv, Behlûl Zelal, O Henry, Omer Dilsoz, Dilawer Zeraq, Arjen Arî, Ayhan Meretowar, Koçer, Ciwanê Abdal, Îbrahîm Ebdî û Mahmûd Badilî bi nivîsên xwe; Evdile Koçer, Şêrko, Ayhan Gevêrî, Sîpan Xizan, Şengul Ogur, Dilxwaz Herdem, Xangul Ozbey û Azad Ronakbar bi helbestên xwe wê bibin mêvanê we.

Di dosyeya vê hejmarê de jî me Seydayê Tîrêj yê ku ji kaniya hestên xwe helbestên welatparêzî, evînî û lehengiyê herikandiye kir mêvanê we. Ew ê ku dibêje "Ey bilbilê dîlşadî hela wer bike fixan / Derdê me giran e ey bira, birîna me kûr e". Ew çinara ku rehên wê hem ji rûbarê kevneşopiyê û hem jî ji rûbarê nûjeniyê avê vedixwin...

Me di hejmarên berê de diyar kiribû ku em ê bi tenê kesan wekî dosye negirin dest; em ê heyam û berhemên ku li wêjeya kurdî bandor kirine jî bigirin dest. Di hejmara 17'an de jî em ê li ser mijarek cuda bisekinin. Mijara me 'Di Pêşketin û Xurtkirina Wêjeya Kurdî De Çanda Medreseyê û Rista Seydayên Xwedî Îcazet' e.

Bi hêviya ku 'kirin' ciyê 'gotin'ê bigire, heta hejmareke din bimînin di xweşiyê de....

Pirên Şikestî

Serwet DENÎZ

Di hejmara beriya viya de me wek dosye **Erebê Şemo** girtibû dest. Bi vê mebestê rêzdar Cihan Roj li ser “*Pirên Şikestî û Îzolasyona Gewr*” sekinîbû û gelek pirsên balkêş pirsibû. Ew pirs divê bên nîqaşkirin û bersivên baş bên dayîn da ku hinek gelş û gelemşeyên wêje û zimanê kurdî bên çareserkerin. Ku bersiva van pirsan bê dayîn û tespîtên baş bên kirin wê rêya kesên ku di van qadan de dixebitin ji ronî bibe û bergeheke nû li ber wan ji vebibe. Ez ê ji di vê nivîsê de hewl bidim da ku li ser pirên şikestî bisekinim û ji bo jinûveavakirina wan piran çend pêşniyaran deynim.

Ji bo BAKUR ev pir kîngê, çawa û çend caran şikestin? Ji bo bersivandina van pirsan bi kinasî be ji divê mirov qala dîroka wêjeya kurdî û rewşenbîriya kurdî bike. Ez bawer im şikesteka herî mezin bi hatina Îslamiyetê re lê ketiye. Bê guman wê beriya wê ji hebin lê em baş nizanin. Qe ne be em dikarin bibêjin; guherîna her alfabeyekê derzek e, şikestekek e. Mixabin ew beşên dîroka me bi giştî tarî ne. Palpiştên xurt di destê me de tune ne. Ji ber vê yekê em ê ji li ser hatina Îslamiyetê û serdemên piştî wê binihêrin. Bi hatina Îslamiyetê re carekê alfabe guheriye, lê mesele ne ew bi tenê ye. Zimanê perestîne, pîroziyê, zanistê û hwd. guheriye. Kodên hiş bi tevahî guherîne. Van guherînan ji kiriye ku tîkiliya bi serdemên berê re qut bibe. Pireke girîng li vir şikest! Gelo îro çend mînakên wêjeya kurdî ya berya Îslamiyetê li ber destê me hene? Ji ber ku pir şikestiyê em nikarin destê xwe dirêjî aliyê din bikin.

Jixwe lêkolînên li ser zimanê me kêr in. Em bi qonaxên pêşketina zimanê xwe nizanin. Mînak; zarava û devokên zimanê

me di kîjan heyama dîrokê de derketine holê; di bin bandora kîjan mercan de mane, xweza, siyaset, aborî, çanda jiyanê û gelên cîran bandoreke çawan li ser hiştine ne zelal e. Me çi daye derdora xwe û çi jê stendiye baş nehatiye vekolan.

Lê dîsa ji em dizanin ku li gorî mercên rojê pirên nû ava dibin, dezgehên nû dertên holê. Li herêmên ku di bin desthilatiya mîrekên kurdan de ne ziman û wêjeya kurdî ji nû ve vedije. Helbestvanên kurdî digihîjin asta ku bi helbestvan û edîbên xelkên din re qayîşe bikişînin. Melayê Cizîrî gava dibêje

Ger lûlûyê mensûr ji nezmê tu dixwazî

Wer şî'rê Melê bin te bi Şîrazî çi hacet ()*

An jî

Feyza me şubhê Nîl e em Dicle û Furat in

*Ger şêx û wer îmam e vêra ye min keşakeş(**)*

vê yekê piştrast dike.

Berhemên ku tîn afirandin li tevahiya welat belav dibin. Û yên ku ew afirandine li her derê tîn nasîn. Bi hilweşîna pergala mîrekiyê re gelek derfet ji holê radibin. Bêguman bi awayekî lawaz be ji hilberîn didome, hin kesên navdar ji dertên lê êdî Cizîrî û Xanî nagihên.

Sedsala 19'emîn ji bo wêje û rewşenbîriya kurdî sedsaleke taybet e. Tîkiliyên kurdan ên bi cîhanê re zêdetir dibin. Bayê fikir û ramanên ku li cîhanê belav dibin digihîje nav kurdan jî. Wek netewperweriyê. Em ji gelek çavkaniyan hîn dibin ku kesên wek Mîr Bedirxan û Mîr Mihemed xwendekar şandine Ewropayê. Lê mixabin em nizanin ka van hewldanan çawa encam dane. Çi bandora wan li ser rewşenbîriya kurdî çêbûye an nebûye. Lê tiştê zelal e. Yên ku wek sirgûnî diçin Stenbolê, di dawîya sedsala 19'emîn û serê sedsala 20'emîn de himên rewşenbîriyeke nûjen datînin, alav û amûrên nûjen dixebitînin, dest bi nivîsandina cureyên wêjeyî yên nûjen dikin. Hewldana çêkirina alfabeyeke latînî ji dest pê dike (*Ez bawer im vê hewldanê ji ber pêdiviya bi cîhanê re dest pê kiriye. Ji aliyê ramanê ve êdî ji Ewropayê xwedî dibûn û ji bo xwedibûneke baş pêdivî bi tîkiliyên hîn xurt hebû, bikaranîna heman alfabeyê wê ev tîkili hêsatir bikirina, astengiyek ji holê rabikira.*) Ji xwe heta avakirina komarê jî



navenda rewşenbîriya kurdî Stenbol e. Ji wê rojê û vir ve rewşenbîriya kurdî li sirgûnê ye û hîna jî sirgûnê venegeriyaye. Li Stenbolê û gelek deverên din (Kahîre, Bêrût, Şam, Bexda, gelek welat û bajarên Ewropayê) xebatên rewşenbîriyê hatine kirin wek ku me li jor jî got; gelek derfetên nûjen jî bi dest xistine lê hilberîna wan baş negihîştîye gel ew bi xwe jî jî gel dûr ketine, bûne biyanî gava ku xwestine vegehin welat û hinek tiştan bikin wan û gel jî hev fêhm nekiriye di şûna ku gel li dû wan bimeşe li dû serdestan meşiyaye. Ev jî nîşaneke pir girîng a şikestina pirekê ye. An jî neavakirina pirê...

Piştî avabûna Komara Tirkiyeyê jî xwe tevahiya piran dişikên û pê re jî pirên ziman û wêjeyê. Derbasbûna alfabeya latînî ya kurdî û tirkî tenê pirên navbera rabirdû û dahatûyê naşikêne her wiha pirên navbera beşên civakê yên li welatê cihê jî dişikêne. Kurd bi sê alfabeyan dinivîsin û her alfabeyek pirekê dişikêne. Ez nabêjim guherîna alfabeyê ne pêdivî bû, bêguman pêdiviyeke bingeîn bû û baş bû ku guherî lê pirsirêkên ku derdixe

holê û pirên ku dişikêne jî rastiyeke in. Ev pir hîna jî şikestî ne.

Piştî salên 60'î li Bakur û Tirkiyeyê pêleke nû radibe, heta salên 80'yî didome û koçî Ewropayê dike. Wek serê sedsalê bingeha vê pêlê jî ne li welat e. Hilberîn li metropolên Tirkiyeyê pêk tê, rojev jî aliyê hinekên din ve tê diyarkirin rojeva kurdan ya xweser nîn e. Dam û dezgehên hilberîna rewşenbîrî li welat tune ne. Li vir ez ê bibêjim pireke neavakirî heye. Dibe ku hinek nepejirînin û hêrs jî bibin. Bi rastî ku pirek hebe ew jî wiha ye; gopirek li Stenbol û Enqereyê hatiye danîn û di şûna ku gopirê din li Amedê bê danîn li Ewropayê hatiye danîn di şûna ku pir bi vî aliyê de dirêj bibe li aliyê din dirêj bûye. Divê ez vê yekê jî bibêjim çi xebatên ku jî bo ziman û wêjeya kurdî hatine kirin li ber dilê min pîroz in. Kes nikare biçûk bibîne. Lê em mecbûr in ku rewşa xwe baş tespît bikin. Têkilî bi gel re nehatiye danîn. Bi qasî serdestan bandorker nebûye. Tiştê ez dixawazim bibêjim ev e.

Di nîveka salên heştêyî de hilberîna rewşenbîrî jî nû ve û dîsa li Stenbolê dest pê dike. Wek weşandina pirtûk, kovar û rojnameyan û xebatên çandî ên wekî din. Di serê salên nodî de ev xebat gur dibin, digihîjin asta sazibûnê. Enstîtuya kurdî û NÇM li Stenbolê tînin avakirin, rojnameya xwerû kurdî li vir diweşe. Ji bo fêmkirina çawaniya şikestina piran, bi bawerîya min ev xal gelek girîng in. Her çiqas hilberîn jî bo welat hatibe kirin û berhem jî demên berê pir û pirtir jî gihîştibin ber destê gel jî bi bawerîya min, rewşenbîriya kurdî an jî karên zimanê kurdî hîna li sirgûnê bûn. Lewre hilberîn li ser axa welat pêk nedihat. Hîna îro jî gelek kurd bi çavê navendê li Stenbolê dinihêrin, Stenbolê wek navenda rewşenbîriya kurdî dibînin. Lê rastî ne wisa e. Ew, tenê bendixaneyek e. Li Stenbol û Amedê heman zagon derbasdar bûn lê tiştên ku li Stenbolê serbest bûn li Amedê qedexa bûn. Bi rastî jî gelo ew qedexekirin jî ber asayiş û propagandayê bûn? Na. Armanca sereke ew bû ku nehêlin li welat rewşenbîriya kurdî bi pêş bikeve. Ku rewşenbîriya kurdî jî bin nîrê rewşenbîriya tirkî derbiketa wê gelek tişt îro ne wiha bûna. Ku tîkiliya kurdan a bi cihanê re di parzûnê tirkî re derbas nebûya wê dîsa rengê gelek tiştan cihê bûya. Kin û kurt;

Stenbol ne ciyê azadî û serbestiyê ye, ciyê kontrolkirin û fetisandinê ye. Di vê serdemê de jî pira navbera rewşenbîriya kurdî û welêt qels e. Pira ku mirov ê di ser re derbasî perçeyên din bibe xuya nake.

Bi vê rewşê em gihîştin serê sedsala 21'êmin. Hêdî hêdî hinek rewş diguherin. Baweriya 'karê ziman û wêjeya kurdî divê li welat bîn kirin' xurtir dibe. Hinek kes û sazi vegeyran jî. Wek rojnameya Azadiya Welat. Ya din jî ji salên 90'î û şûnde li welat pêşketinên berbiçav derketin holê. Nifşeke nivîskarên ciwan derket holê. Kursên bi dizî her tim hebûne, paşê yên fermî jî hatin vekirin û girtin. Li Amedê weşanxaneyên kurdî vebûn, pirtûk kovar û her wekî din hatin weşandin. Lê mixabin hîna li welat çapxaneyêke ku ji pêdiviyên re bibe bersiv tune. Bi baweriya min heta ku li welat çapxaneyên ku rojname, kovar û pirtûkan çap dikin neyên sazîkirin wê **'nîrê Stenbolê'** her tim li ser stûyê me be. Qesta min a ji **'nîrê Stenbolê'** hişmendiya serdestan e. Çi çandî û wêjeyî çî jî siyasî û aborî.

Ku bi kinasî em dubare bikin; jî ber sedemên siyasî, olî û civakî tîkiliya me û nivîşên kevî jî hev qut bûye. Ji ber ku çend caran alfabe guheriye û hîna jî alfabeyên cihê tîn xebitandin pir şikestine, şikestî ne. Ji ber ku rewşenbîriya kurdan a nûjen li sirgûnê aj daye û hîna jî bi giranî li sirgûnê ye di tîkiliyan de kêmasî hene. Ji ber ku di demên cihê de û li derên cihê xebat hatine meşandin ev xebat li navendekê kom nebûne. Ew xebat bi nifşekê re sînorkirî mane. Piştî ku ew nifş jî holê çûye xebatên li wê derê jî jî holê rabûne. Ji ber ku ew xebat ne li welat bûne û nebûne malê gel bê xwedî mane. Ji bilî rewşenbîran an jî kadroyên siyasî haya kesî jî wan kes û xebatan tune. Li Kurdistanê zêdebûna zarava, devok, ol û mezheban tîkiliyên nav civakê qels kirine. Kirine ku hinek kom xwe nêzî serdestan bibînin û dev ji çand û zimanê xwe berdin. Perçekirina bi sînoran jî aliyê serdestan ve kula herî mezin û derdê ser derdan e. Pira

me li derekê û carekê neşikestiyê, li gelek deran û gelek caran şikestiyê.

Niha derfeta avakirina pirên nû, jî nû ve avakirina pirên şikestî û jî bin nîrê hişmendiya serdestan derketinê heye. Lê ku ev xebatên li jêr bîn kirin.

Her çiqas em bibêjin em di heyama internetê de dijîn jî û bibêjin, sînor jî holê rabûne jî jî bo me rastî ne wisan e. Em jî gelek tiştan haydar dibin lê bi vî awayî pîrsgirêkên me çareser nabin. Ji bo çareserkirinê divê em xwediyê stratejiyan bin. Stratejiya yekem dikare wiha be; parastin û berhevkirina tiştên li ber windabûnê. Ji peyvan bigire heta berheman.

Ji wêjeya devkî bigire heta wêjeya medreseyê û wêjeya nûjen. Ev peywireke sereke ye û ez bawer im di bernameyên gelek saziyan de heye. Wek fikir her kes erê dike, lê yên ku li gora wê peywirê tevdiagerin hindik in. Hinek jî ber xemsariyê hinek jî jî kêmderfetiye.

Stratejiya duyem jî mirov dikare wiha deyne; divê tevahiya berhemên ku li derve hatine afirandin li welat bîn berhevkerin û çapkirin. Bi vî awayî dê navenda rewşenbîriya kurdan bê welat û wê bingeheke xurtir bê danîn. Em ê baştir xwe û pêşiyên xwe nas bikin, wê baweriya me bi me bê. Hem jî ev berhem wê

bibin malê gel. Gava ku nifşên nû rabin wê herin li nav gel li berhemên pêşiyên xwe bigerin naçin li muze û pirtûkxaneyên Ewropayê nagerin. Di çarçoveya wê stratejiyê de, berhemên ku bi alfabeyên cihê hatine nivîsîn divê bi alfabeya latînî jî nû ve bîn nivîsandin (Lewre jî bo bakur jî alfabeya latînî veger nîn e).

Stratejiya sêyem divê li ser berhemên berya Îslamiyetê be. Ez bawer im li gor derfetên îroyîn ya herî zehmet ev e. Materyalên ku hatine bidestxistin jî serdestan li gor dilê xwe û li gor berjewendiyên xwe şîrove kirine. Her sal gelek deverên welatên me tîn kolan û bi hezaran berhem tîn dîtin, em nizanin ev çî ne û çî yî me tê de heye, paşiyê bi ku ve tîn

Bi
baweriya
min heta ku li
welat çapxaneyên
ku rojname, kovar û
pirtûkan çap dikin
neyên sazîkirin wê nîrê
Stenbolê her tim li ser
stûyê me be; qesta min
a ji 'nîrê Stenbolê'
hişmendiya serdestan
e, çî çandî û wêjeyî
çî jî siyasî û
aborî

birin. Ev karekî dûdirêj e. Karê saziyên wek Zanîngehan û kadroyên ku li gor van karan digihîjin e. Lê divê di aliyekî hişê me de her tim hebe.

Li gor van xalan karên ku bi lezgînî divê bên kirin; berhemên ku dawîya sedsala 19'emîn û serê sedsala 20'emîn li Stenbolê hatine afirandin û weşandin divê ji nû ve li welat bên weşandin. Xebatên ku di vê çarçoveyê de li Ewropayê hatine kirin bi piranî negihîştine ber destê xwendevanên li welêt. Gelek kes lê digerin lê bi dest naxin.

Berhemên ku li Sovyeta Berê û bi taybetî li Ermenistanê hatine çapkirin divê li welat ji nû ve bên çapkirin. Ji bo danîna hîmên nû û tîkiliya nav perçeyan wê pir bi kêr bin. Gelek ji me ji vê gencîneyê haydar in lê heta niha me jê sûd wernegirtiye. Ji bilî çend berhemên Erebe Şemo li bakur nehatine çapkirin. Ji xwe li gor ku Çerkezê Reş par di Rojên Wêjeyê de digot li vê qadê jî êdî edib û nivîskarên nû nagihên. Ango ew gencîneya li wê derê jî bi windabûnê re rû bi rûye.

Dîsa berhemên Nîfşê Hawarê pêwîst e ku bi tevahî bigihîjin ber destê xwendekarên ciwan. Em nikarin bibêjin xebata ku hatiye kirin bes e. Mirov li jînenîgariya kîjan nivîskarî dinihêre, dibêje nîzanim çend berhemên wî yên neçapkirî hene.

Berhemên ku bi zaravayên cihê hatine nivîsandin divê bi awayekî bigihên ber destê xwendevanên zaravayên din jî.

Kirina van xebatan bi zêdebûna xwendevanên kurdî ve girêdayî ye. Zêdebûna xwendevanan jî bi kursên ziman ve girêdayî ye. Tevî ku li gelek deran kurs hene û fêrkari didome jî xwendevan zêde nabin. Wisan be divê ev kurs û awayê fêrkariyê bên nîqaşkirin û guhertin.

Pergaleke belavkirinê ya berhemên kurdî pêdivîyeke sereke ye û niha tunebûna wê gelek astengiyan derdixe holê. Teqez divê li amedê çapxaneyêke baş bê avakirin. Êdî bes e me Stenbolî xwedî kirin. Ku tişteke wiha li Amedê bê damezirandin sazî û dezgehên ku weşanê dikin wê berheman hîn erzantir

bifiroşin xwendevanan û wê hejmara xwendevanan zêdetir bibe. Bi bawerîya min ev yek ji aliyê sembolîk ve jî xwediyê wateyeke girîng e.

Berhemên ku tîn weşandin ji çend salan carekê divê ji nû ve bên çapkirin da ku mirov her tim bikaribin bi dest bixin. Mînak niha li tu pirtûkfiroşan pirtûkên ku di serê salên nodî de hatine weşandin tune ne. Ku em nikaribin bi deh sal berê re tîkiliyê deynin em ê çawan bikaribin bi sed sal berê re tîkiliyê deynin û piran ava bikin.

Berhemên ku bi navê “Antolojî” an jî “Dîroka Wêjeya Kurdî” hatine amadekirin kêma in û gelek agahiyên çewt di nav xwe de dihevin. Her yek li

gor rîwayetekê tevgeriyaye. Gava ku mirov pirtûka Ebdullah M. Varlî ya bi navê “Dîwan û Jînewarî ya Ahmed ê Xanî” dixwîne mirov heyirî dimîne û dibêje wisan be tiştên ku min heta niha xwendine tev derew in. Ango di nivîsandina dîroka wêjeyê de divê dev ji propaganda û pesindanê bê berdan, şûna wan bi agahiyên rast bê dagirtin. Lewre pir bi berhemên vî awayî tîn avakirin. Ku ew kêma bin pir peywira xwe nayîne cî.

Ev tiştên ku min li jor rêz kirine ez bawer im di hiş û dilê her kesê/a ku tîkildarî ziman û wêjeya kurdî ye de hene. Lê ez viya jî ji dil û can dibêjim xebatên ku li ser ziman û wêjeya kurdî tîn kirin teqez divê li ser axa welat bên kirin, wek navend ji xwe re welat hilbijêrin. Ji ber ku kurd li cîhanê belav bûne, dibe ku li derve jî xebat hebin û wê hebin jî lê piştî nivşekê wê wînda bibin. Çiqas baş û pêşketî bin jî ji pîrsgirêkên me yên bingeîn re nabin çareserî

Li cîhanê rewş guherî, gelek dîwar hilweşîyan. Lê yê me kurdan hîna gelek dîwarên nehilweşandî hene. Heta ku em wan dîwaran hilneweşînin em ne dikarin îzolasyonê rakin ne jî dikarin pîrên şikestî ji nû ve ava bikin.

xunav2121@hotmail.com

Têbînî:

(*) Diwana Melaye Ciziri, Teb'a F. M. Nûrî, Çapa Misrê, Rp:27

(**) Diwana Melaye Ciziri, Teb'a F. M. Nûrî, Çapa Misrê, Rp:64

Rastbînî ango Realîzm

Adar JIYAN

Realîzm (**rastbînî**) an jî **rasteqînî**, wekî têgîneke wêjeyî, ji peyva **realîte** (**rastî/rastînî**) ya Fransî hatiye dariştin û li tevê dinê belav bûye. Realîzm-*bi wateya xwe ya giştî*- wekî feraseta ku jiyan û pêwendiyên mirov ên xwezayî hildide dest û rasterast vedibêje û derpêşî civakê dike, tê zanîn. **Realist** (**rastparêz**), wekî kesên ku bi vê ferasetê tevdigerin û bûyer û rûdanên jiyanê rasterast vedibêjin tîen qebûlkin. **Realistî** (**rastparêzî**) jî wekî têgeha ku bi ber û berhemên ku bi vê fersetê re der dibe û belav dibe, tê zanîn.

Îcar bê awarte “*rastî*” û “*rasteqînî*” wekî arîşeya herî mezin a hemû bizav û tevgerên wêjeyî û rêbazên hunerî tê ditin. Belê pirsgirêka mezintirîn nîqaşa watedayîn û têgihîştina realîzmê (rastbînîyê) ye. Her kes realîzmê li gorî hîzr û baweriya xwe rave û şîrove dike. Ji ber ku wateyeke wê ya misoger û neguherbar nîn e, ji gelek hêlan ve hatiye watedayîn ravekirin. Her wekî din jî wateyên cure bi cure lê hatine barkirin û li gorî wê wateyê jî nîrxandin û şîrove hatine kirin. Nîqaşa vê yekê her çendî ku di qirnê 19’an de dest pê kiribe jî, ev nîqaş xwe dispêre demên kevnaretir. Ango gelek hunermend û wêjevanên demê ‘*rastî*’ li gorî xwe şîrove kirine, xweza li gorî fikra xwe hildane dest û mirov li gorî baweriya xwe arasteyî jiyanê kirine. Di vî warî de gelek caran bi ser jî ketine. Bo nimûne, ronakbîrê ronesansa rojavayê, wênesaz û nûvedanê Îtalî Leonardo Da Vinci, piştî ku wêneyê Mona Lisayê çêdike vê peyamê dide û dibêje “*Heke hûn dixwazin fêm bikin ku wêneyên ku we xêz kiriye, bişibe tiştê ku we jê wergirtiye, pêşî neynikekê daynin ber û*

wêne û wêneyê ku di neynikê re xuya dike, beramberî hevdu bikin; Binihêre bê ew wêne û tiştê ku di neynikê de dixuye li hevdu derdikevin an na.” Heta ji Eflatûn û Aristo bi vir de ye ku mirovahiyê daye pey vê “*rastî*”yê û li gorî bingeha “*mîmesîs*”ê (**mîmesîs**: *nimana/tîmsala ku xwe dispêre lasayîkeriyên/textlîdên liv û bizavên mirov ên ku bi huner û wêjeyê tê vegotin*) ev feraset domandiyê. Ji do heta îro tiştê ku hatiye/tê nîqaşkirin ne nîqaşa **mîmesîsê** ye; nîqaşa awa û çawaniya wê ye.

Tiştê ku divê em li ser rawestin û serê xwe biêşînin, bizava wêjeyê ya ku di qirnê 19’emîn de derketiye holê ye. Ev bizava ku piştî salên 1880’yî dest pê dike, wekî raçava tiştêyî ya ku li ser hîmê felsefeya pozîtîv hatiye rûnandin, bi naturalîzmê (bi siruştîtiyê) re hebûna xwe kudandiyê. Digel gelek guherîn û veguherînên nû, wekî bizaveke wêjeyî heta îro didome. Bêguman realîzm jî wekî hemû bizavên wêjeyê yên din, felsefe û epîstemolojiyeke (sinc û exlaqekî) wê heye.

Şoreşa fransî ya ku di sala 1789’an de pêk hatiye, ligel ku bandora xwe li ser civaka Fransî hiştiye, hemû civakên rojava yên din jî ew çend kiriye bin banadora xwe. Hem jî hêla ramanî û ramyarî, hem jî hêla civakî û aborî û hem jî ji hêla çandî, hunerî û wêjeyî ve gelek guhertin û veguhertinên mezin jî pêk aniye. Pêşî pergal û sazûmanên ewropayê û pey re jî yên hemû deverên cihanê serobin kiriye. Têgehên mîna “*aştî*” “*azadî*”, “*yeksanî*”, “*dadî*” û “*mafê mirovan*” di dem û domanê de derketine holê. Li aliyê din, serdema ronîdariyê (şoreşa ronesansê) bû sedema gelek pêşveçûn û geşedaniyên nû û vedîtînen mîna kareba (elektrîk), teknoloji û çapemeniyê jî. Li aliyekî gelek derfetên jiyanê aram û li aliyê din jî hêz û qeweteke mezin daye çînên serdest û desthilatdar. Li aliyê din jî bû sedema dewletên ewropaya rojava ku bibe dagirker û mêtîngerên herî mezin ên cihana gerdûnî. Soxî, ev rewş û doman, mirovahî ber bi şerên cihanê yên ku bi hinceta parvekirina welatên dinê dest pê kir, bi encam bû. Hêzên Îngilîstanê li aliyekî welatê Hindê û li aliyê din jî welatê Misrê xistin bin desthilatdariya xwe û xwe wekî “*şahînsahiya ku roj lê naçe ava*” da nasîn. Hêzên Fransayê xwe dirêji Efrîqaya Bakur û

Rojihalata Dûr kirin. Îro ro jî DYA'yê daye ser vê riyê.

Dîrok, ji dokumanên nivîskî û wêje jî ji dokumanên ku ji xwezayê der dibin pêk hatiye. Dîroknas, veguhêzerên dema borî; wêjevan, vegotinerên dema niha; ramanwer jî, hişyarkerên dema bê ne. Di dîrokê de, der barê vê yekê de tiştê gelek balkêş heye. Gustave Flaubert, şîreteke li Maupassant dike û dibêje: "Her tişt ji dîtîne pêk tê. Dîtîne, belê dîtîneke rast. Ji bo ku tu bikaribî rastiye tenê bi çavên xwe -ne bi çavên zana û pîsporên dinê- bibîni hê wext zû ye. Divê tu hinekî din li bendê bî. Reseniya hunermendekî ne di tiştin mezin de, di tiştên biçûk de der dibe." Rast e. Şahkar û serberhemên mezin, bi têkilahiya mijarên sivik bi dest dikevin. Tiştên ku ji bo rastî û rasteqîniyê tene kirin hemû bi mebesta raçavkirina rêgezên mirovahiye û aramiya civakê tene kirin. Bi vegotîneke din, di relaîzmê de armanca mijara huner û wêjeyê, veguestina jiyana mirov a camidî (objektîf) e. Ji bo wê wêjevanên rastparêz, jiyana hemû çîn, kes û tebeqeyên civakê bi awayekî rastîn li ber çavan radixin. Di berhemên wan de, bi qasî ku behsa jiyana kesên dewlemend û maldar tê kirin, behsa kesên xizan û belengaz jî tê kirin. Bi qasî ku behsa bajarekî bihişmet tê kirin, behsa gundekî biçûk jî tê kirin. Bi qasî ku behsa kesên serdest tê kirin, behsa kesên bindest jî tê kirin. Bi kurtayî, mirovên rastparêz çîn, nîjad, netewe, zayend û ola mirovan çî dibe bila bibe, bêlayan, bêveşartin, bînepandin û bîsêrnixamtin rasterast tê vegotin û derpêşkirin. Belê bi gelemperî bêtir li ser jiyana çîna navîn û bindest radiwestin û balê dikişînin ser jiyana kesên xizan, reben belengaz û zehmetkêşên awarte.

Gava ku jiyana kesekî/ê hildidin dest, girêdayî wî/wê çîna wî/wê, jiyana der û dora wî/wê, rewşa malbat û êla wî/wê jî derpêş dîkin. Bo nimûne gava ku behsa jiyana karkerekî/ê dîkin, girêdayî wê jiyana çîna karker (proleteriyayê) jî disêwirînin. Her wiha gava ku behsa jiyana patron û karsazekî dîkin jî jiyana çîna serdest (burjuwaziye) li ber çavan radixin. Bi vî awayî car heye di şexsê kesekî/ê de jiyana civakekê, kevneşop, hest, raman û rewşa çînekê, aboriya tebeqeyekê, çanda neteweyekê jî derî çavan dîkin. Mirovên

rastparêz (realist), gava ku jiyana kesekî/ê derpêş dîkin, wekî yên siruştiparêz (naturalist) ku bi daneyên zanistî nêzîkî meseleyê dibin, nafikirin. Ew, hem jiyana mirov a borî û îroyîn û hem jî dahatûya mirov a nêzîk li ber çavan digirin. Di hizra kesên realist de her gav tipolojiyeke berxwedêr û serhildêr a ku civakê temsîl dike û pêş ve dibe heye. Ber û berhemên (helbest, roman, çîrok û hwd.) ku ji hêla kesên realist ve tene honandin, pêşniyara nûsazî (reform) û veguherînên civakî jî di xwe de dihundirîne. Wêjeya realist jî wekî ya klasîk hem xwediyê taybetiyeke fêrker hewisîner û hem jî xwediyê xisûsiyeteke ceribîner e.

Realîzm, jiyana civakên hemdem û îroyîn a rojane hildide dest û bi her awayî li ber çavan radixe û diferîşîne. Rastiya baş û nebaşiyê, ya qencî û xerabiyê, ya kerexî û xweşikiyê, ya serdestî û bindestiyê qet venaşêre. Realîzm, di vegotinê de cihêtiyê naxe navbera kar û xisarê. Ne pesnê başiyê dide û ne jî zema (hîciwa) xerabiyê dike. Rastî çî be wê dibêje. Biryar û şîrove ayidê civakê ye. Li gel vê yekê jî di dîroka wêjeyê de gelek rastparêzên rexnegir jî derketine holê. Ew, bêtir li ser rasteqîniya civakê rawestiyane û fikr û bîrdoza xwe tevli vegotinan kirine. Kesên mîna Balzac, Tolstoy, Çehov, Gorkî, Stendhal û hwd. li gorî hizra xwe başî û nebaşiya jiyana mirov a civakî, aborî, çandî û siyasî jî hevdu veqetandine û baş û nebaşiya wan bi awayekî aşkera destnîşan kirine.

Piştî şoreşa bolşevîk a 1917'an tevgerê nû ya rastparêz xwe dide der û li tevê dinê belav dibe. Mirov dikare vê tevgerê wekî realîzma Marksîzmê an jî realîzma sosyalist jî nîşan bide. Îro jî gelek nûser, ronakbîr û wêjenasên realîst ku vê bîr û bîrdozê dişopînin, li gorî wê tevgerê û her tiştî li gorî vê yekê disenîfinin, hene. Heta ku jiyana rasteqîn hebe, dê tevgera realîzmê û kesên rastparêz jî hebin. Wekî hemû liv û tevgerên wêjeyî û hunerî yên din, realîzm jî liv û tevgerê hemdem û gerdûnî ye. Heta ku wêje û tevgerên wêjeyê hebin dê realîzm jî hebe.

adarjiyan@mynet.com

Kedkarê Kelepura Kurdî

Mele Xelefê BAFEYÎ

Faysalê ÛSIV

Min ji zarokatiya xwe heta niha her dem navê **Mele Xelef** di nava şênîyên gundê **Bafê** de bihist. Mele Xelef deh salan li gundên Botanê geriya û kelepura kurdî berhev kir. Min ev yek ji devê gundiye Bafê girt. Lê Mele Xelef li ku bû? Demeke dirêj ez ketim pey serpêhatî û berhemên vî camêrî. Agahiya min stendi ev camêr berî 15 salan çûye rehmetê û gora wî li Cizîra Botan li meqbera mezin e.

Mele Xelef bi eslê xwe ji gundê Bafê ye ku niha bi Hezexa navçeya Şirnexê ve girêdayî ye. Navê bavê wî Remezan e û navê diya wî Bedrê ye. Jixwe di nava gundiyan de weke Mele Xelefê Bedrê tê naskirin. Xweheke wî ya bi navê Bihar û birayekî wî yê bi navê Emer hebûne. Mele Xelef du caran zewiciye. Kurên Mele Xelef ev in: Edîb, Bedridîn, Mes'ûd, Dostik, Sekvan û Metîn. Keçên wî ev in: Zibêda, Zînet, Le'li-Xan, Sîver, Pexşan, Evîn û (Newze ?) (Ebdilreqîb Yûsif).

Mele Xelef feqetiya xwe li bajarên weke Qulpê, Farqîn, Sason, Cizîra Botan û li gundê Xendekê kiriye. Seydayên wî yên ku em dîzanin Mele Ebdurahmanê Xendekî û mele Ebdilreqîb Yûsif in. Tiştê herî girîng ji kesê ku Mele Xelef teşfîqê berhevkarîya Kelepura Kurdî kiriye ev seydayê hêja Ebdilreqîb Yûsif e. Ev camêr alikariyeke mezin dide Mele Xelef. Ebdilreqîb Yûsif di pêşgotina pirtûka Dîroka Kelepura Mirnişîniya Botan de li ser feqehê xwe wiha nivîsandîye.

"Xelef xelkê gundê Bafê ye. Di bilindahiya hindava Dicle ji qeza Hezex li nik bavê min mele Yûsif û li nik mele 'Ebdilrehmanê Xendekî feqiyatî kiriye û demek ji li nik min xwendîye. Li gundê (Stewrik) li tenîştê Cizîrê bûye mele û li imtîhana Ewqafê derbas kir û bû îmamê resmî li Cizîrê heta wefat bû. Destê wî di hûnandina şî'rê de ji hebû û pir qesîdeyên wî hene û nihîni ji xizmet bo Kurdan kiriye û westan nedizani. Li ser daxwaziya min çûye Xesxêrê; gundê Bêdarê di nêvbeyna Xesxêrê û Meksê da heta dîwana Axawokê Bêdarî li nik neviyên wî peyda bike. Lê dunya sar bû û gehîştê Xesxêrê û li wê dê nexweş ketibû û zivirî."



Mele Xelefê BAFEYÎ

"Mele Xelef kurê Remezanê Bafeyî ji 'eşîreta Harûnan şehsiwarê kelepura me zêdetir ji çarhezar rûperan ji kelepore Xirvekirîye bi handan û rêpêşandana min ji sitran û metelok û serhatîyan û ji hemî babetan û gelek behs û hikayetên Mîrên Bohtan ji navê gelek stranbêjan û behsa jiyana wan ji nivîsîne. Feqehê min mele Xelef îşekî gelek mezin kir di mideha deh salan de. Lê mixabin di (31-5-1993) de li Cizîrê çûye rehmetê."

Weke ku bi van agahdariyên seydayê hêja, serpêhatiya Mele Xelef zelaltir dibe. Lê xebata mele Xelef kirî bi her awayî li ser Kelepura Kurdî ye. Wexta min got Mele Xelef çawa li ser kelepura kurdî dişixulî, yanî bi çi metodî berhevkarî dikir? Bersiva gundiyan Bafê ez şaş kirim. Ji ber ku Melayê gorbihuşt, bi alavên gelekî hemdem berhevkarî kiriye. Pêşiyê, di nav gundiyan de tiştên devkî; çîrok, mamik, stran bi teybê qeyd kirine û nivîsandine. Gava tiştên devkî xilas dibin, li derdora gundê ku berhevkarî kirî digere û fotografên deverên diroki û cihên taybetiya wan heye digire. Wî ev xebata xwe berî 30 salan kiriye. Îro ji bi van metodan berhavkarî tê kirin. Mele Ebdilreqîb Yûsif jî, pesnê şiklê xebata wî dide. Li gorî gundiyan Bafê wexta ku Mela mamikek an ji stranek dibihîst, heta bi koka meselê diçû û carinan bi rojan dikete pey gotinekê. Gelek caran gundiyan ew fam nekiriye û henekên xwe pê kirine. Îro ji li gundê Bafê wexta ku kesek bikeve pey gotinekê gundi dibêjin; *"Tu li me bûyî Mele Xelef!"*

Ew xezîneyeke bê ser û bin bû. Li gorî gundî dibêjin, waxta ku tişteke dinivîsî ew tucaran wînda nedikir. Ebdilrêqîb Yûsif jî dibêje carekê mele Xelef di nameya xwe de gotiye 814 kaxizê (name) te li cem min hene. Ango Mele Xelef hema bibêje yek gotina seydayê xwe neavêtiye. Bêguman Mele Xelef karekî gelek pîroz kiriye. Weke ku Seyda Ebdilrêqîb Yûsif dibêje ev di navbera deh salan de kiriye. Lê wî camerî bi kîjan aboriyê ev kar kiriye? Bersiva ku min girtiye ev e: Mele Xelef, di diyanetê de melatiya resmî dikir, li Cizîra Botan disekinî û meaşê xwe jî bo wî karê berhevkarîyê xerç dikir. Wîlo xuya dike jî ber wê yekê gelekî derdê feqiriyê jî ditiye. Lê wî heta ku jê hatiye ev karê xwe berdewam kiriye.

Serpêhatiya berhemên mele Xelef jî weke serpêhatiya wî bi eş e. Ji ber ku di jiyana wî de civakê tu caran qedr û qîmeta wî nizanibûye. Weke ku Mele Ebdilrêqîb Yûsif dibêje, Wî çar hezar rûpel û 50 şerîten qeydê berhevkirine. Wî ev berhemên xwe jî seydayê Ebdilrêqîb Yûsif re şiyandiye. Heta niha berhemên Mele Xelef yê ez jê agahdar im, pirtûka bi navê Dîroka Kelepura Mîrnişîniya Botan e. Ev pirtûk sala 2004ê jî aliyê Dilawerê Zengî li Bêrûdê hatiya çapkirin. Ev pirtûk Ebdilrêqîb Yûsif jî Dilawerê Zengî re şiyandiye û wî jî ji tipên erebî veguestiye tipên latînî. Ebdilrêqîb Yûsif, pêşgotina wê berhême nivîsiye. Lê weke ku pirtûk berhema Dilawerê Zengî be ew wê diyarî Ebdilrêqîb Yûsif dike, ligel ku tenê tipguhêziyê dike. Dilawer Zengî kêmasiyeke mezintir dike. Ev camêr diçe li berhema Mele Xelef zêdayiyekê dike. Weke ew di pêşkeşkirina pirtûka, Dîroka Kelepura Mîrnişîniya Botan de dibêje. “...Lê ji bo tekûzkirina wî berhemî, min hin gotar û danhevên Mîr Celadet yên ku di kovara Hawarê de hatibûn belavkirin, li vir dane weşandin. Belgeyek dîrokî bi navê Şîna Mîr Sêvdîn û sitirana Bedîr-Xan Begê jî hêla E. Yûsif gihane min. Bedîr-Xan Beg jî pertûka (zargotina Kurdên Sûriyê), danheva Celîl Celîl hatiye wergirtin. Şerê Bestê Beleka û Şerê Kehniqîrê jî kovara Ronahî hatiye wergirtin. Ez Xelef im, min jî kasêta dengbêjekî wergirtiye” angî Dilawerê ZENGÎ bi devê xwe dibêje min tiştin bi ser berhema Mele Xelef ve kirine. Ev xeletiyêke mezin e. Berhemên berhavkarîyê ne hewceyî zêdekirinê ne. Divê ew pêşî safî werina çapkirin. Tu heqê kesî nîn e li gora dilê xwe dest biavêje berhemên Kelepura Kurdi.

Pirtûkeke Mele Xelef jî dîsa jî destê Ebdilrêqîb Yûsif, Sebrî Botanî re diçe Norwêçê. Ev berhem demeke dirêj windayî dimîne. Piştî mirina Sebrî BOTANÎ, kurê wî Beşîr Botanî wê berhême derdixê holê. Navê berhême “DEFTERA YEKEM” e. Lê ez jî çapkirina wê berhême ne haydar im. Stranek jî wê berhême di malpera ROJA NÛ de hatiye weşandin. Ev stran wiha ye:

Kanî Kilê

Wey lê Kanî Kilê wey la li te wêranê Kanî Şilê

De vê sibê heçî kesê hat û şor li milê

Wey lê ez dibêm Kanî Kilê xweşsozan e

Di ser re belekê berfê ne, di bin re delavê van miyan e

Xudê xirab bikê mala Mîrze Axakê di dêra çawa ji malbata mala babê min qelandin şeş hogic û dwazde beran e

Wella na yê, na yê, na yê, na yê, na yê, na yê

Ez çî bikim Mîksî xayîn e şaxa hekariya dûr e li hawar û himdada mala babê min rebera Xudê na yê

Wey lê Kanî Kilê li ber beleka, wey la li te wêranê li ber beleka

Di ser re belekê berfê ne, di bin re delavê pezkoka

De vê sibê çî qa li min xweş tê renga-renga van tîfinga

De bila Xudê xirab bikê mala Mîrze Axakê di dêra çawa ji malbata mala babê min qelandin dikê nav ordeka

Wella na yê, na yê, na yê, na yê, na yê, na yê

Ez çî bikim Mîksî xayîn e şaxa hekariya dûr e li hawar û himdada mala babê min rebera Xudê na yê

Wey lê Kanî Kilê wey la li te wêranê Kanî Zêrrê

Wey la li te ser Kanî Dizê ji xopana qûna şêrrê

Bila Xudê xirab bikê mala Mîrze Axakê di dêra çawa ji malbata mala babê min xirab kirin şêr û berşêr e

Wella na yê, na yê, na yê, na yê, na yê, na yê

Ez çî bikim Mîksî xayîn e şaxa hekariya dûr e li hawar û himdada mala babê min rebera Xudê na yê

Berhemên Mele Xelef hemû jî Kelepura kurdên Botanê hatina berhevkirin. Lê heta niha mixabin li Bakur ev berhem nehatine çapkirin. Mesela girîng jî, çar hezar rûpel berhemên Mele Xelef di destê Seyda Ebdilrêqîb Yûsif de ne. Ger Seydayê Ebdilrêqîb Yûsif niha sax be min dixwast jê bipirsim. Gelo em ê kengî wê xezîneya mezin bixwînin? Hêvîdar im ku ev berhemên xebatkarê kelepura kurdî Mele Xelefê Bafeyî dê werin çapkirin. Ev berhemên jî bo kelepura Botanê dê bibin çavkaniyeke bêhempa.

Têbînî:

1- Wêneyê Mele Xelefê BAFEYÎ ji malpera ROJA NÛ hatiye girtin (F.Û.)

2- Me dest neda çewtiyên nivîsandina stranê. Lewre orjîna wê li cem me tune bû. Lê xuya ye ku çewtiyên nivîsevan in, ne yên vegotinê ne. (Kovara W)

Şopa Bavê Min

Behlûl ZELAL

Wa ye dişa Xaltiya Xewle tê mala me. Gelo dişa çi agahî ji bavê min aniye? Ez qet naxwazim xaltiya Xewle bê mala me. Serê çend rojan carekê tê mala me. Çi cara ku hatiye, diya min jî pê re pê re dest bi girî kiriye. Pêşî min nizanibû çima diya min digiriya. Bi hatina Xaltiya Xewle re diya min dest bi girî dikir.

Heta çend rojan wisan digiriya. Çavê diya min her tim şil bûn. Dema kar dikir distrand. Li ber stranên xwe jî digiriya. Ew digiriya yan wê stran digotin; tencedigihîştin. Bi stranên xwe peyv diavêtine ser bavê min. Qala mirin û birindariyê, qala girtin û tenêtiyê dikir, di stranên xwe de. Diya min zû bi zû li cem min nedistrand. Ku ez bi xew ve biçûma dest bi girî û stranên xwe dikir. Lê pir caran min diya xwe dixapand. Jê we re ku ez raketî me. Min çavên xwe miç dikirin û bi carekê dest bi pixepixê dikir. Lewma ez bi her tiştê ku dixwest ji min bi dîzi bike dihesiyam. Diya min diwestiya ji girî. Dema diya min nedigiriya pir baş bû. Rûken, rûgeş bû. Bi min re diaxivî, bi min re dilîst, porê min, hinarikên min mist dida. Bi vî awayî, diya min hin bi hin girî ji bir dikir; lê pir tê de nediçû, Xaltiya Xewle dişa dihat. Bi hatina wê re, dişa diya min, bapîra min, meta min dest bi girî dikirin.

Ku dengê giriyê wan dihat guhê min, ez jî digiriyam. Berê, min nizanibû ji bo çi digiriyan; lê wisan bi xemgînî digiriyan, giriyê min jî dihat îcar. Ku min jî dest bi girî dikir, diya min, carina bapîra min dihatin, ez di dawa xwe de hembêz dikirim, porê min mist didan û li dora min digeriyan da ku min aş bikin.

Wa ye dişa hat xaltiya Xewle. Xwedê dizane bê dişa çi agahî aniye. Rojekê min ji diya xwe pirsî:

“Xaltiya Xewle çima tê mala me.”

Diya min got:

“Ew meriva me ye, diya min û ew ji heman malbatê ne. Lewma pir tê mala me.”

Ji dema ku tê bîra min ve, Xaltiya Xewle tê mala me. Ev hatina çendan bû? Vê carê çi agahî di paşla wê de hebû kes nizane. Kes nizane bê van agahiyan ji ku derê berhev dike.

Li gorî agahiyên Xaltiya Xewle ku ji gund anîbûn; ne carekê tenê, belkî sed carî bavê min hatibû kuştin. Carekê bavê min ketibû kemînê. Dema dikirin bêne gund, gundekî nêzikî gundê me, li pêşiya wî û hevalên wî kemîn hatibû danîn. Bi yek carê bavê min û pazdeh hevalên wî hatibûne kuştin. Lê li gorî agahiyên ku Xaltiya Xewla anîbûn cendekê wan di cî de hatibûne veşartin ku tu kesî nizanibû li ku derê hatine veşartin. Bapîra min digot:

“Hema min biskek ji wî porê wî yê zer bidîta, hema bi mirîtî jî bûya min hinarikên wî maç bikira, hema carekê tenê, berî ku ez bimirim, min çav li wî rûwê spehî bikira.”

Meta min jî di ber giriyê xwe de tiştin digotin, porê xwe dikişkişand. Diya min jî pir digiriya lê tiştê nedigot.

Carekê, gava bavê min, bi hevalên xwe re êrîşî cerdevanan kiribû hatibû kuştin. Wisa digot Xaltiya Xewle. Piştî êrîşê, ji bo ku hevalên wî bi silametî hilkişine cihê xwe yê çiyê, xwe dabû ber guleyan. Ew hatibû kuştin; lê hevalên wî rizgar bûbûn. Cendekê wî ji ber guleyan şewitibû. Rû, por pê ve nemabû. Lewma nehatibû naskirin. Xaltiya Xewla digot, li gund her kesî bi qur'anê sond xwariye ku ew bavê min bûye.

Carekê dişa bavê min û çend hevalên xwe, li malekê, li ser şivê hatine kuştin. Carekê dişa li malekê, di xew de hatine kuştin. Êdî ez nema dizanim bê çend caran, li ku derê û bi çi awayî bavê min û hevalên wî dihatine kuştin. Carna bavê min dibû fermanîdar, carna dibû leşkerekî ji rêzê. Carna pesnê jêhatî û egîditiya wî û carina jî agahiyên têkçûnên wî dihatine guhê me.

Di nav ew qas geremol de, helwesta bapîrê min pir bala min dikişand. Ku tofan jî bi ser mala me de bihata; min nedît ew carekê bi tenê jî giriya. Lê ku gotin dihat ser mesela bavê min, wî tavilê digot: “Were kurê min, were ba min.” Û ez hembêz dikirim, bi destên min digirt, porê min û riwê min mist dida. Pir tê de nediçû ez di hembêza bapîrê xwe de bi xew ve diçûm.

Rojekê min ji bapîrê xwe pirsî:

“Kalo bavê min yekî çawan e?”

Bi pîrsa min re bapîrê min tavilê rabû. Tu bersiv neda min. Min heman pîrs ji diya xwe kir. Diya min got:

“Lawo ma tu nabînî. Li her derên mala me, fotografekî bavê te heye. Ma tu nabînî? Qama wî dirêj, porê wî zer, çavên wî şîn in.”

Min got:

“Na dayê na, ez vana dizanim. Bavê min rûken e yan mehdîrîş e? Hez ji zarokan dike, hez ji listîka gogê dike? Yekî tirsonek e yan wêrek e? Bêhtir hez ji kîjan xwarinê, ji kîjan vexwarinê dike? Cixareyê dikişîne yan na? Weke bavê hevalê min Mîrze ku her roj li hevsera xwe dixê, bi te re pevdîçû, carna li te dixist yan na?”

Diya min kelegirî bû, melkesa di destê xwe de avêt û çû menzela razanê.

Min gelekî mitale dikir. Gelo ku bavê min jî nola bavê hevalên min li malê bûya dê yekî çawa bûya? Ku bavê min li malê bûya, gelo dê dişa weke niha pirteqal, sêv, goşt, şekir, ard zû ji malê kêmbûya?

Ez ê ne tenê bûma; dê xwişk û birayên min hebûna. Em ê di roşanan de biçûna gund. Min ê bavê xwe bibira listîka gogê, dê bidîta bê ez çiqasî xweş dileyizim. Belkî tirimbêla me jî hebûya...

Xaltiya Xewle, disa nola her carê, bi lez kete hundir. Weke her carê disa çarîka xwe ya spî, heta bi ser pozê xwe ve pêçabû. Razek li ser riwê wê yê qermîçî digeriya; ku jê bihata dê henasa xwe jî bi nepenî bida û bistenda. Min jî gelekî mitale dikir, agahiyên Xaltiya Xewle çi bûn gelo?

Kalê min jî dema Xaltiya Xewla dît peroşekê girt ser dilê wî; lê heta jê dihat ev peroşa xwe nedida der. Weke ku tiştêkî girîng nîn e, tevdişgeriya. Bapîra min li kêleka bapîrê min, li ser qenepeya li hember wê rûniştibûn. Diya min jî li ser piyan, ji vî aliyê odê diçû aliyê din. Bi alav û firaxên li odê re mijûl dibû; lê mêjiyê wê, dilê wê li hêviya axaftinê bû. Xaltiya Xewla çavên xwe bi lez li hundir, li firaxên hundir û ji van bêhtir û girîngtir li kesên li hundir gerandin. Nizanibû ji ku derê dest pê bike, heke jê bihata dixwest agahiyên xwe bi yek carê vala bikira:

“Temo, Temo, Temirxan...”

Peroş û lezgîniya liva Xaltiya Xewle, laşê me hemûyan tevizandibû. Xwîn di rehên me de qerisibû. Perdeyeke zer girtibû ser riwê herkesî. Germahiyekê jî serê mûyên serî heta bi serê neynûkên lingan ve bi carekê ve wergirtibû. Girêkek hatibû di gewriyan de rûniştibû; tîreke tûj di bin singên çepê de rakiribû. Bêhna wê çikiyabû, bi zorê axavtina xwe domand:

“Temo sax e, şikir ji Xwedê re, şikir...!”

Peyva “Temo sax e”, dilê her kesî jî rekehê xwe derxistibû. Me nizanibû em çi bikin, çi bibêjin û çawa tevbigerin. Bi salan e, agahiyên nebixêr, agahiyên dil û hêvî şikandinê hatibûn. Her agahiyek şîna di mala me de nû dikir; kul û keserên me jî nû ve dimeyandin. Carekê min ji diya xwe pirsibû. “Dayê, bavê min kengî çû?” Wê jî gotibû: “Roja ku bavê te berê xwe da rîya nepenî, rîya çûnûnehatinê, tu heşt mehî bûyî.” Îsal min pola heştan kuta kir. Temenê min kete pazdehan. Ev pazdeh sal in ku nûçeyê xêrê, nûçeyê dilxweşiyê gihabû mala me. Li ku derê bû, bi çi awayî bû, kê ev agahî dabû, rast bû, derew bû gelo? Kê, kengî û li ku derê ew ditibû? Ev pîrs dê pişt re bihatina, yek bi yek û hatin jî. Lê aniha her kes di nav ewrên şadiyê de difirî, di deryaya bêserûber de, di nav pêlên bextewariyê de diçûn û dihatin.

Min nizanibû ez çi bibêjim, çi bikim. Di kêliya pêşî de diya min, paşê jî bapîrê min ez hembêz kiribûm. Cara pêşî bû ku min didît bapîrê min digiriya. Diya min bi destekî xwe hêstirên xwe, bi destê din jî hêstirên min paqîj dikirin. Gelek peyv dihatine gotin; lê tenê hevoka “Şikir ji xwedê re, şikir şikir” dihatê têgihîştin. Wê rojê, heta êvarê li ser çûna ba bavê min û li ser wan pêdiviyên ku diviyabû bihatina cih, hate axaftin.

Diviya pasaportên me hebûna heta ku me bikaribûya biçûna cem bavê min. Ne pir dûr bû ji me; lê bi awayekî bêpasaport pir zehmet bû çûna me. Ji kesê ew ditibû re gotibû ku ew ji malbata me re nebêje ku min Temo dîtiye. Gotibû ku çûn û hatin gelekî zehmet e, dê û bavê min bibihîzin dê di cî de bînin, ez tîka dikim ku tu nebêji. Lê mala wî û mala Xaltiya Xewle hezar carî ava be, agahiya xweş, gihandibûn me.

Pêşî biryar hate dayin ku bapîrê min û dapîra min tenê dê biçin. Li ser vê ez gelekî giriyam. Min got:

“Ku hûn min nebin ez ê bi serê xwe biçim, min bihîstiye bê ka bêpasaport çawa diçin.”

Bapîrê min û bapîra min jî vê gotina min gelekî tirsîyan. Dawiyê biryar dan ku min jî bi xwe re bibin. Ez bi diya xwe re axivîm:

“Dayê çima tu jî bi me re nayê?” Wê got:

“Ji bo çûyîne pir dirav divên. Ku bapîrê te hinekî din diravan peyde bike dê min jî bibin. Hingê em ê her çar bi hev re biçin.”

Ez bi vê gotinê pir kêfxweş bûm. Êdî hedana min li tu cihî nedihat. Min dixwest kêliyê berî ya dîtir em bi rê bikevin. Gelo bavê min di çi rewşê de bû? Dema ku min bidita dê kêfa wî bihata? Li ku derê bû? Cihê ku lê bû, gund bû, bajar bû, çiya bû, deşt bû? Min ev û gelek tiştên din meraq dikirin. Dilê min di rekêhê xwe de hilnedihat. Ji bilî çûna me û dîtina bavê min tu raman li serê min bi cih nedibûn. Ji roja ku ez bîrewer bûbûm, min xeyalên bavê xwe dikirin, min pir caran bavê xwe di xewnê de didît. Êdî ne xeyal bû û ne jî xewn. Roja min, roja roşana dilê min hatibû, li ber derî bû, hindik, pir hindik mabû.

Bapîrê min dest bi karê derxistina pasaportên me kiribû. Digot: “Heta hefteyekê dê pasaportên me bidine me, li wê gorê xwe amade bikin. Berî ku hin Beko Awan fesadiyê bikin em bi rê bikevin. Û jî tu kesî re jî nebêjin em diçine filan derê. Li vegeerê kê jî we pirsî ku em çûbûne ku derê, hûn ê bibêjin em çûbûne Edenê ba keçika xwe. Bila gotina me hemûyan yek be.”

Em li ser şivê bûn. Min bala xwe da destê bapîrê xwe. Hingulîska wî ya ku jî dema tê bîra min ve di tiliya wî de bû, nexuyabû. Dema dît ku ez bi baldarî li destê wî dinihêrim, bi min hisiya û jî nişkê ve destê xwe kişand kêleka xwe. Di pey re şermiyekê girte ser rû û tevgera wî. Min jî berê xwe jê guhert û min li destên diya xwe nihêrî. Ez çî bibînim:

Cotê bazinan ku yadigariya bavê min bûn, ne di destê wê de bûn.

Rojekê ku ez di xewa derewîn de bûm; jî bûka cîranê me re gotibû ku ev bazin yadigariya bavê min in. Hin bi hin matmayî dibûm. Min dît diya min jî li ser sifrê zendika kirasê xwe yê ku heta duh jî bazin tê de bûn dikişîne jêrê. Min berê xwe jî destên diya xwe jî guhert. Bêhemdî xwe, çavên min li destên bapîra min ketin; hingulîska zîvî ku bapîra min digot “Ev pêncî û yek sal in di tiliya min de ye” nexuyabû. Dema jinan li mala me civat girêdîdan û qala hingulîsk, zîv û tiştên wisan dibû, bapîra min digot: “Hingulîska min zîv e, tu rûmeta zîvê wê nîn e, lê ev kevirê tê de

pirlanta ye. Lewma pir birûmet û biha ye, jî cîrana me ya ermen, jî min re yadigar e.” Kevirê di hingulîska bapîra min de spî nola spîka hêkê bû. Di tariya şevê de jî dibiriqî. Ez hinekî xemgîn bûbûm; lê min ê bavê xwe bidita çî dibû bila bibûya, xweşiya dilê min xera nedibû.

Weke ku bapîrê min gotibû, piştî heft rojan pasaportên me derketibûn. Bapîrê min şewqeke nû dabû serê xwe, qutikekî spî û nikûnû li xwe kiribû. Lê çakêt û şalê wî yên kevn bûn. Bapîra min jî kiras û xeftanekî wisan xweşik u lihevhatî ku min tu caran lê nedîtibû li xwe kiribû. Te digot qey em diçine xwezgîniyê. Diya min jî nola ku em diçine dîlanê û bûk jî ew e, xwe xemilandibû. Ji min re jî şalek, qutikek û pêlaveke nû kiribûn. Lê çiqasî lavelav jî min kirin û piştî lavelavan bi min hêrs bûn jî, ji bilî pêlava nû ya ku her car bapîrê min jî bo listika gogê jî min re dikirî, min ên nû li xwe nekirin.

Gava ez li otobêza ku dê me bibira cem bavê min siwar bûm, tenê xwestekeke dijwar di dil û mêjiyê min de peyda bû: Xwezî ajokarê vê otobêzê ez bûma û hew! Ez berî her kesî siwar bûbûm. Di kêliyê de otobêza me tijebû. Xewn û xeyalên min dibûne rastîn. Em di rê de bûn û otobêz dimeşiya. Dema otobêz di lampayên trafikê de rawestiya, zarokên ku temenê wan di navbera pênc û deh duwazdeh salî bi carekê re êrişî tirimbêlan kirin. Hin desmalên kaxezi difirotin, hin benîşt, hinan jê jî bi paçikan camên tirimbêlan paqij dikirin. Di pencereya otobêzê ya kêlekê de, min li bajêr nihêrt; sûrên ku nola marekî reş bajêr dorpêç dikirin, di valahiyên nav avahiyan de reş dikirin.

Otobêz bi bêhna fireh di rê de diçû. Her ku em diçûn, her ku em nêzikî bavê min dibûn, peroşa min zêde dibû, germahiya ku bi ser laşê min de girtibû bêhtir dest û rûyê min disincirandin. Carna ez ditengijim, min nedikarî bi hêsanî henasa xwe bida û bistenda. Me bajarê Mêrdînê jî li pey xwe hiştibû. Cara yekem bû ku ez jî malê, jî bajarê xwe derketibûm. Diya min û bapîra min di paldeyekê de li nik hev, ez û bapîrê xwe jî di paldeyê de li nik hev rûniştibûn. Diya min û bapîra min jî, yekem car ev cih didîtin. Lewma wan jî, bi baldarî li derûdorê dinihêrtin. Carinan min dipirsî û carinan jî bapîrê min berî ku ez bipirsim navê cihê ku em tê re derbas dibûn jî min re digot.

Deşta Nisêbinê deşteke rast û fireh bû. Sinorê dugela Surî nola şerîteke rast dirêj

dibû. Serê çend metroyan leşkerên nobedar hebûn. Kolikên hesinî ji erdê bilind çêkiribûn. Leşker di hundirê wan de bûn. Bapîrê min digot; “Bi şevê jî dikevine tabiyan” Tabî, mîna kozikên mirîşkan bûn, mîna kozikên ku cîranê me di hewşa xwe de çêkiribûn. Ser wan bi kevîran û bi axê girtî bû. Ji erdê ne bilind bûn, jixwe devê wan jî bi erdê ve bû. Pez û şivanên gundên Binxetê xweş xuya dikirin.

Pîştî Nisêbinê em di Cizîrê re derbas bûn. Çemê Dîcleyê di biniya bajêr re spîsor diherikî. Gava em di ser pira li ser Çemê Dîcleyê re derbas bûn, bapîrê min bi tiliya xwe ya şanîdanê avahiyek nîşanî min da û digot:

“Binihêre kurê min, ev Birca Belek e. Ev herêm bi temamî, demekê di bin rêvebirîya Mîrê Botan bi navê Bedîrxaniyan de bû.”

Diya min jî li min zivirî û got:

“Egît binihêre filima Mem û Zînê li vê derê kişandine.”

Pîşt re, bapîrê min, çiyayên Cudî û Gebar nîşanî min dan. Her du çiya nola du birayên cewî li hemberî hev bûn. Tazî, asê û bilind bûn. Bavê min, gelo bavê min, li cihekî wiha bû? Gelo çiya bavê min xistibûne çî rewşê? Cîwan kiribûn an kal? Gelo pazdeh salan tim û tim li çiyê jiyabû bavê min? Qet li gundan li bajaran nemabû? Kengî ez giham cem bavê xwe, yek bi yek ez ê van pîrsan û ji bilî vana gelek pîrsên din jî bavê xwe bipîrsim.

Ber êvarkî em gihîştine wî aliyê sînor. Yek bi yek li pasaportan dinihêrin. Li yên me jî niherîn. Leşkerekî tirk jî min re got:

“Ma tu diçî ku derê, çî karê te li Eraqê heye?”

Min tu bersiv nedayê. Ku em jî wî deriyê Tirkîyeyê xelas bûn, em ketin deriyekî din. Li vê derê kesên peywirdar qet nedipîrsîn ku em diçine ku derê û em jî bo çî hatine. Pêşî gotin, hûn bi xêr hatin. Pîşt re, em li cihekî dan rûniştandin heta ku karê me li wir qediya êdî me xwe berda nav bajêr.

Leşkerê tirk gotibû min, çî karê te li Eraqê heye, lê ev der ne Eraq bû. Min ala Eraqê nas dikir. Ala li ser avahiyan bilind dibû, ne ala Eraqê bû. Aleke kesk û sor û zer bû ku di her çalakîyên li taxa me û piranî jî di Roşana Newrozê de, me di destê xwe de digeland. Ev der qet nedîşibiya cem me. Leşker, ajoker, karmend her kes bi kurdî dipeyivî. Bapîra min digot:

“Li vê derê mirov dikare neçe dibistanê. Va ye leşker, karmend her kes bi kurdî diaxivin. Niha leşkeriya vê derê jî pir hêsan e.”

Bapîrê min got:

“Ma tu dizanî gelê vê derê, ji bo ku bikaribe bi kurdî biaxive, çend salan şer kiriye? Çend mirov hatine kuştin, çend mişextî bûne? Heta vê rojê dewleta Eraqê çî bobelat bi serê kurdên vê derê aniye, tu dizanî? Ma aniha em çima li vir in, çima ev pazdeh sal in kurê me jî me dîr e? Çima bi hezaran xort û xamayên me li serê çiyê ne, li bin erdê ne, yan jî di destê zaliman de, girtî ne? Çima jinên me bi û zarokên me sêwî ne? Înşelâh dê rojek bê...”

Peyva bapîrê min di devê wî de nîvco mabû. Leşkerekî cîwan di ber me re derbas dibû. Tavilê bapîrê min xwe gihandê:

“Xwarzê gelo tu dikarî cihê tîlefônê nîşanî min bidî.”

Leşker kete pêşiya bapîrê min û ew bire hundirê dikanekê. Em jî li wê derê man li hêviya wî. Min li diya xwe nihêrî, hundirê çavên wê dikenîyan. Pîştî pazdeh salan dê bavê min bidîta. Mêrê wê yê ku bi qasî du salan jin û mêritî jî hev re kiribûn. Bapîra min li cihê xwe ranediwestiya. Kî di ber me re derbas bûbûya, berê xwe dida wan û tiştêk jî wan dipîrsî. Kêfa wê ew qasî lê bû, ku hina lê xistana jî ne xema wê bû.

Bi dizîka, min devê xwe bire ber guhê diya xwe û min got:

“Dayê heke me bavê min dît, ez bi we re venagerim. Ez ê li cem bavê xwe bimînim.”

Diya min di cihê xwe de zîq rawestiya û wisan li min nihêrî. Te digot qey devê wê hatiye girtin. Qederekê wisan neliviya û ne jî devê wê vebû. Pîr tê de neçû, min dît wê jî hêdika devê xwe anî ber guhê min û got:

“Lawo heke me bavê te dît, ku qiyamet jî rabe, ez jî venagerim.”

Bapîra min tevgerên me dîtibûn, nola ku bela xwe li me bixe:

“Çî pistepista we ye? Xwedê hebîna wisan bi dizî hûn çî diaxivin?”

Di heman katê de, me her duyan bi devekî got: “Ne tiştêk e.”

Gelawêj 2006 / Amed

b.zelal@mynet.com

Pelê Dawîn

O HENRY


Li taxeke biçûk a rojavayê Washingtonê, kuçe bi gelek qozî û fetlonekan ji hev diqetin û kuçekorên tewromewro derdikevin ber mirov. Ew kuçekor carekê du caran li hev têne badan.

Rojekê hunermendek li taybetiya wan kuçeyan hay bû. Deyndarekî ku bixwaze deynê xwe yê kaxed û boyaxê berhev bike û çend caran li dora xwe bizivire û dîsa destevala derkeve heman ciyî, karê wî temam e.

Ji bo wê yekê, hunermendan qefle bi qefle berê xwe didan vî gundê entîke yê Greenwichê, çavên xwe li sibarneyên sedsala hijdehan û şibakeyên li bakurî û karîteyên li ser avahiyê yên holendî digerandin û her wiha çavên wan li xaniyên ku kirêya wan erzan bûn. Dû re çend surehiyên paxir û firaqek an jî du heb ji bo germkirinê ji Kolana Şeşemîn anîn û hatin li wir bi cî bûn.

Li qotê xaniyekî sê qat, studyoya Sueyê û Johnsyê hebû. Johnsy nasa Joanna bû. Yek ji Maineyê bû ya din jî ji Californiyayê. Wan li tabldota 'Delmonico' ya li Eight Streetê hev nas kiribûn. Wekî ku nêrîna wan a li ser hunerê, cilên ku zenda wan fireh ên mîna yên pîskoposan jî wekî hev bûn. Ji ber ku xuyên wan li hev dikirin bi hev re li studyoyekê dixebitîn.

Meha gulanê bû. Seqemeke meha Sermawezê ku tixtoran jê re digot Firik (zatûre), tiştêkî nedîtî, li serê taxê dibû bela û carê diçû virde wêde belaya xwe di hinekan de digerand. Ew mehlûqat li Eight Sideyê bi wêrekî tevdigeriya û cangoriyên



xwe ref bi ref dibir, gava diket nava kuçekorên teng û kevjînî zû bi zû pê li kevirê şil nedikir, hay ji xwe hebû.

Firik beg ne kesekî ku mirov bibêje yekî narîn û kubar bû. Ev ê bêhnfisek û lepgirdik dikaribû jinikeke pîr ku xwîna wê bi hewayê Californiyayê ya sakîn geş dibû ji bixista. Li Johnsyê jî wiha kir, kir ku Johnsyê encax bikaribe di şibakeya biçûk a holendî re li tuxleyên dîwarê hember temaşe bike.

Sibehekê tixtor bangî Sueyê kir û bi wan birûyên xwe yên boz bûbûn û her du digihîştin hev got;

"Rewş xeternak e. Encax yek ji... Belê ji dehan yek ihtîmal heye."

Termometreya di destê xwe de hejand, ji bo ku ciwayê daxîne û got; "û ew ihtîmal jî bi xwestek û vîna wê ya jiyanê ve girêdayî ye. Xwezaya mirovan gelekî xerib e. Hew te dît ku xwe gihandine kefenfiroş an jî gorçêkeran. Di wê rewşê de civaka tixtoran jî dikevin tev. Delala biçûk xistiye serê xwe ku ew ê baş nebe. Ma tiştêkî hişê wê tevlihev dike heye?"

Sueyê got; "Wê – wê dixwest rojekê wênayê Kendava Napoliyê saz bike."

"Wêne? Ehhe! Tiştê vikîvala. Tu tiştêkî din tune bû ku hiş û aqilê xwe pê re mijûl bikira. Wekî mînak, xortek?"

"Mêrek? Ma ji bo mêrekî hêja ye? Na, tixtor na, tiştêkî wiha tune ye."

Gava bersivandibû dengê wê mîna yê herpeke cihû dilerizî.

Tixtor got; “Wê gavê bedena wê qels e. Tiştê ku ilmê tixtoriyê daye min, ez ê hemûyan bi kar binim. Lê belê gava nexweşa min dest bi jimartina hejmara erbeyên ku wê beşdarî merasîma cenazeyê wê bibe kir, ez ê ji sedî pencî hêza dermanan dabixim jêr. Lêbelê heke we, pirseke der heqê zivistana îsal de, ku wê kîjan cure sakoyê bibe mode pê da pirsîn, ez ê di şûna ji dehan yekê ihtîmala başbûna wê bibêjim ji pênçan yek e.”

Piştî ku tixtor çû, Sue çû odeya xebatê û heta ku destmaleke japonî kir mîna hevîr giriya. Dû re bi texteyekî xebatê derbasî odeya Johnsyê bû û bi awayekî ku kêfa wê li cî ye bi fikandin çû wê odeyê.

Berê Johnsyê bi paceyê ve bû û di binê çarşevê de xwe tevnedida, dirêjkirî bû. Di cî de deng ji Sueyê biliya, got qey Johnsyê di xew de ye.

Texteyê xwe yê wêneyan bi cî kir, rahişt hubir û penûsa xwe, ji bo çîrokekê ku wê di kovarekê de bihata weşandin, dest bi xêzkirinê kir. Wênesazên ciwan ji bo ku şekalên xwe deynin cem yên hunermendên din, ji bo nivîsên nivîskarên ciwan ên ku dixwestin şekala xwe deynin nava yên pênûsa wan xurt e, neçar bûn ku wêneyan saz bikin.

Gava Sueyê ji lehengê xwe yê ku gavanekî Idohoyî bû re berçavkek û pantorekî binexş xêz dikir, dengê lawaz û çend caran li ser hev bihîst, rasterast ber bi cîyê nexweşê ve çû.

Çavên Johnsyê pahn bûbûn, li ser hev dilîstin. Di paceyê re li derve dinihêrî û li ser hev hejmar beropaşkî dijimart.

Johnsyê got: “Dozdeh” û dewam kir, “Yazdeh, deh,... neh” lê zêde kir. “Heşt...heft” wekî ku bi hev re bibêje.

Sueyê bi miraq li derve nihêrt got hela bê çî heye. Ji bilî hewşeke vikîvala û tarî û diwarekî şêst pêyî li pêş û kerpûçên dîwêr tu tişt nexuyabû. Û lavlavkek hişkbûyî ku heta



nîvê dîwêr rapelikibû û heta ku tu bibêjî qert bûbû hebû. Seqema payizê pelên wê weşandibû, çeçelîkên wê yên mîna îskeletan, hema mîna ku şût î tazî be li dîwêr mabû.

Sueyê pirsî; “Ew çî ye, delala min?”

Johnsyê wekî ku binewhirîne got; “Şeş.” Û berdewam kir, “Êdî zû diweşin. Beriya sê rojan jî bi sedan bûn. Gava min dijimart serê min gēj dibû. Êdî hêsan e. A ji te re, yeka din jî çû. Bi tenê pênç heb man.”

“Çi pênç heb? Ka ji Sueya xwe re bibêjî.”

“Pel. Pelên lavlavkê. Gava pelê dawîn jî biweşe ez ê bimirim. Ev sê roj in li min eyan e. Tixtor ji te re negot?”

Sueyê bi awayekî heta ku tu bibêjî tinazkar bû got; “Min qet titşên wiha jî nebihîstibûn lê. Çi tēkiliya pelên dêliyê bi başbûna te re heye? Û te ji vê dêliyê jî gelekî hez dikir. Çi bûye ji te? wekî qazan nekî lê. Hîna tixtor vê sibehê gotibû tu yê baş...”

bisekine... çi gotibû? Gotibû ku ihtîmala başbûna te ji yekê deh e. Ya te tu çi dibêji lê? Talûke ne ji ya gava ku em li New Yorkê li tramwayê siwar dibin an jî gava em di ber avahiyekê re derbas bibin û em pê re rû bi rû bimînin zêdetir e... Ka hinek şorbe vexwe û bisekine Suecana te hinekî bixebite, ji bo ku wêneyê çêkiribe bifiroşe û ji bo ku ji zaroka xwe re bikaribe şîrûbê bikire û ji xwe çavbirçiyê re jî çend parçe nermegoşt bistine.”

Johnsyê berê xwe ji paceyê neda alî û got: “Ne hewce ye ku tu şîrûbê bikirî. Yeka din jî çû. Şîrûbê jî venaxwim. Dilê min naçê. Man çar. Beriya ku tarî têkeve erdê, ez dixwazim weşîna ya dawîn jî bibînim, piştî wê ez ê jî herim.

Sue bi ser wê de daqûl bû, “Johnsya delal. Johnsya şêrîn, daxwazeke min ji te heye. Heta ku ez karê xwe biqedînim, tu yê sozê bidî min ku, tu yê çavên xwe bidî ser hev û qet di paceyê re li derve neniherî? Divê ez wêneyê xwe heta sibehê bigihînim ber destê wan. Divê perde bikêşe, lê belê pêdiviya min bi roniyê heye.

Johnsyê bi awayekî sar jê re got; “Ma tu li odeya din bixebitî nabe?” Sueyê got, “Ez xebata li cem te dibijêrim û naxwazim tu li wan pelên bêyom binihêrî.”

Johnsyê çavên xwe girt û rengê xwe yê spîçolkî ku mîna peykerekî ku hatibe xwarê nedilivîya, dirêjkirî got; “Te çawa qedand haya min pê bixî. Ez dixwazim weşîna pelê dawîn bibînim. Ez jî seknê aciz bûm, ji fikirîna bêzar bûm. Ez li her tiştî borîm. Ez dixwazim xwe mîna pelên hejar ên westiyayî serbest berdim. Dixwazim xwe lê berdim û berjêr bişûşikim.”

Sueyê got; “Hela tu hewl bide ku rakevî. Ji bo madenvanekî rebenokî bidim xêzkirin divê ez herim bangî Beherman bikim. Bila modeliyê bike. Ez ê niha vegerim. Nebe nebe ku tu xwe tevbidî!”

Behermanê kal, boyaxkarekî li qata binê wan dima. Temenê wî şest derbas kiribû. Yekî mîna Musayê Michel Angelo bû ku riha wî bi ser gewdeyê wî ye ku li ber serê wî qinîkek dima ve li ba diket. Beherman yekî ku di hunerê de biserneketî bû. Çil salan firçeya ku bi kar dianî qet nêzî pêşmala xwedawenda xwe ya hunerê jî nekir. Her

dem ji bo ku berhemeke bêhempa biafirîne dixebitî, lê heta niha tu tişt tune ye. Ji bilî çend wêneyên ji bo bazirganiyê û çend mînakên ji bo danasînan hîna tu tişt xweşikî çênêkiribû. Li taxê ji wênesazên cîran re modelî dikir û çend pere bi dêst dixist. Her dem cîn vedixwar û qala şahesera xwe ya ku wê çêbike dikir. Digel wê jî qet ji kubarî û narîniyê hez nedikir. Kalepîrekî bi eks bû û ji bo ku wênesazên qatê jora xwe biparêze xwe mîna cangoriyekî wan dihesiband. Sueyê, Beherman li şikefta wî ya qata jêrîn dît. Li quncikekî odeyê li ser maseyêke biçûk, tuwala wî ya spî ya şahesera wî ya ku ev bîst û pênc sal e li benda firçeya yekemîn bû disekinî. Sueyê ji wî re qala Johnsyê kir. Ku pelê keçîka ciwan bi vê cîhanê ve girê dida yê dawîn jî biçûya, got ku heger pelê dawîn jî here tîrsa wê ew e ku ruhê wê yê mîna wî pelî sivik û rindik jî wê bifire here. Behermanê kal bi çavên xwe yên sor ku dilop bi dilop hêsir jê dibariya, kir barebar û henekê xwe bi van xeyalan kir û bi devoka xwe got;

“Şi! Ji po ku teliyeke pêyom belên xu tiweşîne, pêaxilên ku xu si po mirinê amate tîkin hene qey? Min tiştê wiha şî nepihîstiyê! Na; ez ê wêneyekî çêpikim. Nikarim ji bo te modeliyê pikim. Di fê rewşa Yohnsyê de tu çi jahrê belav dikî û tu xwe pi van tiştan re mijûş tîkî” û qîrînî jê hat, “Yohnsya reben!”

Sueyê got; “Pir nexweş e û zeîf e, sincirandina bedena wê bandor li hiş û giyana wê kiriye û di nava ramanên tewşomewşo de ye. Ê baş e, Beherman beg, hey tu naxwazî ji min re modeliyê bikî, neke. Jixwe tu ji bilî kalepîrekî bizdihîn û xurifi ne tu tişt î.”

Beherman bi xeyd got, “Hah şî te re! Jin wiha ne ha! Kê kotiye ku ez ê şî te re moteliyê nekim. Here ez tîm. Ev nîv saet e ku qirik li min peritî, hingî ku ez dibêşim, ez amade me. Xwetêyo! Nabe ku em bihêlin keçîkeke mîna Johnsyê delal bi nexweşiyê here. Rojekê ez şaheserekî çê bixim û em hemû pê bividitin. Xwedêyo! Erê!”

Gava di pêlikan re hilkişîyan jor Johnsyê razayî bû. Sueyê perde kişand û îşaretî Beherman kir ku derbasî odeya din bibe. Ji wir bi tîrs li dêliya li derve nihêrîn û bédeng li hev nihêrtin. Şilopeyek bê rawestîn li derve dibariya, hewa sar sar bû. Beherman

bi îşlikê xwe yê kevn ê şîn li ser qûşxaneyê bernixûm rûnişt. Wê qûşxaneyê ya ku madenvanê terk î dinya li ser rûniştibû temsîl dikir.

Sueyê wê şevê encax bi qasî saetekê veketibû. Serê sibehê gava hişyar bû dît ku Johnsyê çavên xwe yên ku roniya wan çilmisî û pehnûyî li perdeya kesk a girtî dinihêre.

Bi dengekî nalînî got, “Veke! Ez dixwazim bibînim.”

Sueyê bi bêzarî daxwaza wê anî cî.

Wehhh!!! Digel barana bişid ku heta sibehê bariyayê û bayê dikir fîzînî jî pelê dawîn ku li ber dîwarê kerpîç bû, hîna jî li ciyê xwe bû. Pelê dawîn bû. Digel ku koka wî hîna jî hêşîn bû, serê pel êdî rengê ku ew ber bi rizînê ve dibir, êdî zer bûbû li çeqeliyê ku bîst mîtroyan li hewa bû, birik pê ve hilawestî dima.

Johnsyê got, “Ew pelê dawîn e. Min digot teqez ew ê bi şev biweşe. Fîzîna bayê dihate min. Ew ê îro biweşe û ez ê jî pê re bimirim.”

Sueyê serê xwe bi ser balîfê de xwar kir û bi bêzarî got, “Delal, delalê hiş be! Gunehê te bi te nayê bila bi min bê. Ez ê bêtî te çî bi halê xwe bikim”

Lêbelê Johnsyê nebersivand. Li dinyayê tiştekî mîna giyanekî jî bo wê rêwîtiya dûdirêj û efsûnî amadehiyê bike mirovrevok tune ye. Her ku tiştên ew bi vê jîyanê ve girê dida yek bi yek jî ber hev de diketin, bi pelê dawîn re jî fikra mirinê êdî di hişê wê de tam ciyê xwe girtibû.

Roj bi wî awayî boriya. Di qemika êvarê de jî pelê wê dêliyê wisa bi rik bi dîwêr ve zeliqandî dît. Gava bû êvar bayê kur dîsa kir fîzînî. Baranê li paceyê dixist û jî serbaneyên holendî dişirîkî erdê.

Bi berbanga sibehê re Johnsyê xwest ku perde jî ber paceyê bê alidan.

Ew pel hîna jî li ciyê xwe bû.

Johnsyê demeke dirêj ziq bû lê nihêrî. Dû re bangî Sueya ku li ser sobeya gazê şorbemirîşk li hev dixist kir.

“Suecanê, ez keçikeke gelekî xerab bûm. Hêzeke efsûnî, jî bo ku xerabiya min eşkere bike, ew pelê hanê li wir hişt. Mirinxwestin

gunehbarî ye, ka tu dikarî hinek şorbe û şîr ji min re bînî îcar, na bisekine, destpêkê neynikekê bînî. Dû re du balîfan bidî ber piştî min. Ez ê li te temaşe bikim gava tu amade biki.

Saetekê şûnde jî got;

“Suecanê, ez hêvî dikim ku rojekê ez ê wêneyê Kendava Napoliyê saz bikim.

Tixtor bi destê Sueyê yê tenik û diricîfî girt û got, “İhtimal nîvenîv e, heger tu baş lê binihêrî, tu lê miqate bî, tu yê bi ser bikevî. Niha divê ez herim ser nexweşekî xwe yê din, li qata jêrîn e. Navê wî Beherman e, ez bawer im wênesaz e. Bi firikê ketiye. Yekî kal e, rewşa wî gelekî nebaş e, nexweşiya wî dijwar e. Tu hêvî tune ye ji bo wî, lêbelê dîsa jî em bibin nexweşxaneyê wê ji bo rehetiya wî baş be.”

Roja din tixtor ji Sueyê re got, “Tu bi ser ketî, tu talûke nema. Êdî tenê xwarinê baş hîlbijêrî ji bo wê, ew qas e.”

Wê rojê piştî nîvroyê, Sueyê hat ber nivînên ku Johnsyê di nav de bû ku bi kêf milikekî şînik î rîs ku bêkêr bû çêdikir û di paş balîfka wê re milê xwe da ber piştê û got;

“Mişka min a spî, tişteki min î ku ez ji te re bibêjim heye; Beherman beg, li nexweşxaneyê bi firikê miriye. Ev du roj bûn ku nexweş bû. Roja pêşîn dergehvan ew li odey wî ya qatê jêrîn jî ber jana canê wî bêzar dîtibû. Solên wî, cilên wî şil bûne û mîna cemedê sar bûne. Di wê şeva tirsnaq de kesî fêr nekiriye ku çûye ku derê. Fanosek dîtine, gava fanos dîtine hîna jî veketî bûye, dîtine ku pêlik jî ciyê wê bi dût e, ji nava bexçe jî çend qirş û qal jî li nava hev ketine. Û paletêk jî dîtine, boyaxa kesk û zer li ser bûye. Di paceyê re binihêrî Johnsyê, tu pelê dawîn ê wê dêliyê dibînî şêrîna min. Tu qet nefikirî ku çima nalive gava ba tê. Ax, şêrîna min, ew şahesera Beherman e. Şeva ku pelê dawîn weşiyaye ew çêkiriye.

Ji îngilîzî werger: Sîdar JÎR

Xwîna Stranên Mihemed Arifê Nemir

Omer DILSOZ

Paşxana me ya zargotinî gelekî dewlemend e; gotin ew çend zindî ne, heke tu rabî serê dasiyekê, na na serê derziyekê bigihîniyê dê rûbarekî xwînê jê hilbavêje. Peyv li peyvê dirise, eynî wekî libên morikan ka çawa li ser benikekê lêk dirisin, hemû peyvên wan jî wisa li cihê xwe rêz dibin û yekser xwe digihînin kûrahiya dil û hişê mirovî.

Ez zanim, we hemûyan ev strana jêrê bi eşq û evîneke gelekî mezin guhdarî kiriye; hin caran ji dengê Şakiro, hin caran ji Mihemed Arifê Cizîrî, helbet her yekî bi şêwa û newayeke xweser gotiye, lê divê ez bibêjim ku bi ya dilê min çu kesê nikariye wekî Mihemed Arifê nemir vê stranê wisa bi eşq û sewdayeke kûr bibêje, nexêr, mimkûn nîn e, çimkî, bi rastî jî nemir Mihemed Arif ne tenê gotiye; bi ruh xistiye, gava tu serê striyekê jî bigihîniyê dê kulmeke xwînê jê hilpeşke...

Xwîna
stranên
Mihemed Arifê
nemir kengî dê
di reh û rîşên
me bipere?
Kengî em ê bi dil
û soza xwe li ser
sêla kurmanciyê
nanê hizr û
hestên xwe
bipêjin?

Di van malikên
jêr de ku Mihemed
Arifê nemir bi wî
dengê xwe yê zîz û
zelal, bi qîrîn û
nalîna xwe ve
distrê, gazin û
hewara dilekî
şikestî, girîn û
qîjîna jineke kurd
a ku xweşdiviyê
wê bêbextî lê
kiriye, bi hostatî û
şarezariyeke
bêhempa wekî
şerîda filmekî tîne
ber çavên me û me
bi wê trajediyê

dihesîne... Hem jî hemû kite û hûrgiliyên dramê, bi xwezî û hêviyên herî sade, di pêla evîneke har de me berze dike û bi wî dengê dawidî bi qîjîna evîndara Gidyano dihesîne... Dibêje, "*Gidyano, çendî digel min xirab î bila li te bîn*" bi nifirekê lome û gazinê ji bêbextî û durûtiyeke aşkera dike. Di vir de serdeavêtineke mezin bi zar devê evîndara Gidyano ku ji aliyê Gidyano ve hatiye kirin, tê deşîfrekirin û rasterast keçik dibêje, "Ez bi parsetî, birçîtî, bêmalî û her tiştî qayil im, tenê bila dilê te dil be û soza te soz be." Ev qewlekî gelekî jidil û masûm e, di vir de, mirov pê dihesê ku kurdan ji berê de ji derdê dili û bêsoziyê gelekî eş dîtine û lome û gazinên xwe bi durûtî û bêqewliya mirovên ku dilê wan ne dil e û soza wan ne soz e kirine.

Min navê gotina xwe dirêj bikim, wekî bîranînekê min xwest çarîkekê ji strana Nemirî ji bo we li vir binivîsim, di wê baweriyê de me ku hûn ê jî kelegerma xwîna demarên stranên Mihemed Arifê nemir, bilbilê Kurdistanê seh bikin; kerem kin, Xirabo!....

"Wele gidyano, çendî digel min xirab î bila li te bîn

*Bila tûrê parsê li milê min û te bî
Bes evînika min û te bi dilê xwe bî
Bila tûrê parsê li mil bî
Bila binê tûrê me qul bî
Xwarîna min û te jî timî tim garis bî
Doşeka me erd bî
Lihêfa me ezman bî
Balîfkê me kevîr bî*

Bes tazîka rehmeta Xwedê gidyano, li ser min û te timî tim hazir bî

Sozê te bi dilê xwe bî

Şev li min nebe ku terka te bî

Heta ziyareta ser serê min û te pêkve, bikeve ser cihê kêlê di kevîr e

Eman eman.... xirab î xirab î, çawa gidyano digel min xirab î"

Xwîna stranên Mihemed Arifê nemir kengî dê di reh û rîşên me bipere? Kengî em ê bi dil û soza xwe li ser sêla kurmanciyê nanê hizr û hestên xwe bipêjin? Kengî em ê ji dûvika xelkê verisin û bibin serhevsarê qewm û bîr û baweriyên xwe yên resen? Kengî em ê li xwe vegerin da ku bikaribin li meydana şaristaniyê bi mîletên dîtir re hevriki û berberiya pêşketin û zanyariyê bikin?!

o_dilsoz@hotmail.com

Hêviya Li Dû Mirinê Mayî

Dilawer ZERAQ

Li gorî dane û zanîna ku wêje dide me û em ji çîrokên Kurdî û ji yên cihanê fêm dikin; Çîrok nermtirîn cureya wêjeyê ye.

Ji ber vê yekê, gava min di ronîdariya vê zanîn û baweriya xwe de pirtûka Evdile Koçer da destê xwe û navê wê xwend, tavilê pirsekê li deriyê mêjiyê min xist: gelo sedem çi bû (an jî çi bûn) ku navekî ev qas hişk û kevirîn li pirtûkeke çîrokan hatibû kirin?

Dû re, ez fikirim ku dê rasttir be mirov çîroka vî navî û vê pirtûkê di nav çîroka Kurdan û di nav çîroka nivîskariya nivîskêr de bigere; û belkî çêtir be ji bo têgihîştina ji demajoya çîroka Kurdî ya ku li bakurê welêt tê nivîsandin.

Evdile Koçer pêşî di kovara Pelinê de, wek kesekî heneknivîs derket pêşiya me. Nivîskêr, bi zimanê xwe yî ironîk û gundiyanê(!), tevî ku carinan em ji kenan zikopiştî dikirin jî, wisan di bin re rexne li kirin û pratîkên jiyana Kurdan dianî. Me jê fêm fikir, me dizanî ku dixwaze ji me re tiştan bibêje, dixwaze bala me bibe ser tiştên dîtir û belkî jî girîngtir. Lê me jê re jî dengê xwe dernedixist...

Wî dixwest ku em pê biqîrin, em pê biqehirin; belê, ev dê bibûya nîşaneyê cihgirtina rexneyên wî. Belê, me jê re jî dengê xwe dernedixist...

Her wekî ku em bi giştî tinin serê hev, em pê nediqehirîn, em pê nediqîriyan; em pê dikeniyên; mîna ku dinê gundê me be...

Û çîroka me -ku ez wisan pê dihisim ku dê tu car dawî lê neyê-, di cihekî de ji hev veçiriya.

Her wiha, sedema lêkirina navê pirtûkê bi carekê re xwe da der.

Evdile Koçer, kesekî ji vî axê, ji vî gelî bû. Bivê neyê dê ew êş û kula ku bi awayekî ji awayan li me bûye mîvana qetnebixêrî, ketiye dil û hundirê me; mîna bûqalemûnê li gorî şert û mercên ku bêhemdî me li me û li jiyana me tê ferzkirin, reng li xwe diguherîne; belê, heman êşê her roj li deriyê nivîskêr jî dixist.

Her wiha, wek gotina ku di nav me Kurdan de heye, şîn û şahî di hiş û mêjî û jiyana wî de jî tevî hev dibû û Evdile Koçer, piştî pirtûka xwe ya **Govendistan** (*govend: sedema (dil)şahiyê*), îcar bi pirtûka xwe ya çîrokan Mirin (mirin: sedema şînê), li deriyê me xist.

Di pirtûkê de deh çîrokan cih dane xwe; -tevî çend kêmasiyên tashîhî û vegotinî- bi zimanekî sade, fesîh û rewan hatine nivîsandin. Ji aliyê teknîka nivîsandinê û tevnsaziyê ve her çîrok jî ya din serbixwe ye, lê hemû jî li ser temaya êş û mirinê hatine nivîsandin.

Di pirtûkê de çîroka ku ji yên din zêdetir balê dibe ser xwe -û bi ya min serketîtir çîrok e- çîroka bi navê Berfîn e. Çîrok bi teknîka nameyê hatiye nivîsandin. Vebêjerê çîrokê bi nivîsandina nameyê ya ji delala xwe re, -ku mîna ku bêje dîwaro ji te re dibêjim bûkê tu fêm bike-, bi delala xwe re sohbetê dike û çîroka jineke ku ji aliyê mîr û lêzimên xwe ve hatiye kuştin vedibêje û mîna ku lihevvegerînên paradoksî ya elementên naletî, yên ku êdî di jiyana kurdan de kerme girtine, car din bi me bide hisandin, bi vî hevokê dest pê dike: “Delala’m! Jiyana me wisa ye. Li derekê jîn û jiyân, li dera din jî kuştin û mirin!” (rûp:63)

Pê re jî vebêjer, vegotinê dispêre lehenga sereke; û serê pêşîn wekî sedema mirinê, ev hevok xwe dide der: “Sedema ku zaroka me çênedibû, gelekî li zora wî diçû; herhal xelkê li derve dida rûyê wî. (rûp:65)” Pê re jî nivîskar bi zîrekî bala me dibe serê û em sedema esasî ya mirina jinikê -a rastî kuştina jinikê- hîn dibin... “Min çend car jê re got, **em biçin doktor**, lê her dem ji min re digot, **keçê qey tu heyra kuştina xwe yî! Û bi kopalê (gopal) xwe yî stûr** ve diketa ser min, heta ku hiş ji min biçûya...” (rûp:65)⁽¹⁾

Belê em ji vê vegotina jinikê fêrî dikin ku Berfîn, lehenga çîrokê, bêdilê xwe bi yekî kal re hatiye zewicandin û sedema çênebûna zarokên wan kalbûna zilêm e. Lê belê, her çiqas li vir peyva gopal bala me dibe ser kalbûna zilêm jî, ji aliyekî din ve jî sembola wê îqtîdara ku –ji dem û serdema amazonan bi vir de ye- bi sedan, hezaran sal in tu tişt ji stûriya wê kêrî nebûye, her li ser jinan desthilat e. Û **gopal**; di heman demê de dibe sembola du tiştan: kalbûna zilêm (belkî jî genîbûna mêraniya adetî) û navgîna çewisandin û îqtîdarê.

Bi domana vegotina çîroka xwe re, leheng wiha dibêje: *“Piştî ku min girîngiya xwendinê fêrî kir, hema çî bidîta min ê bixwenda. Min hingê ji xwe re digot, yêrî xwende hemû pêxember bûn...”* (rûp:65)⁽²⁾ Nivîskar bi dangotina vê gotinê dixwaze bala me bibe ser girîngiya xwendin, zanîn û hişmendiyê; lê mixabin bi berdewama hevokê re, bi gotina zîlamê jinikê – *“Qey tu yê bi vê xwendinê bibî orispî keçê!”* (rûp:66)⁽³⁾– car din êş û kula mirinê tîne bîra me, kizîna ji hundirê me diçe û careke din ji em hay jê dibin ku em kurd, em hê jî hîn nebûne ka em ê nirx û qîmetê bidin çi?

Piştî vê, nivîskar piçekî din jî girêka çîrokê hişkîr dike, sedema kuştin(mirin)a jinikê (leheng) xurtîr dike û doktorek tê gund (li jorê jinikê ji mêrê xwe re digot ‘em herin doktor’, lê a niha doktor tê ber piyên wan, lê ne bi heman sedemê). Birîn û kulên jinikê yêrî ji ber lêdana zîlamê wê, dibin sedem ku ew ji hemdê xwe zêdetir here ba doktor û wisan bêhemdî wan, xwîna wan li hev germ bibe. Û hema ji nişka ve jinik bi doktor re direve. (li vir tiştêk wek gospe û

arizayeke tevî û vegotinê xuya dike: gelo di roja îroyîn de, çî qas mimkun û pêkan e ku doktorek –her çiqas xweşik û dilkêş be jî- jîneke gundî birevîne?)

Ji ber ku peya û zîlamên gund û zîlamê jinikê dane dû wan, ew bajar bi bajar digerin û ji wan direvin. Lê, îqtîdara mêrane ya feodal wekî hûtekî ye; ne bi xwarinê, lê bi vereşînê dilê xwe rihet dike... û ew li bajarekî tîrî zêftîrîn û tîrî kuştin.

Em dibêjin qey çîrokê de li vir bi trajediyekê biqede; lê na!

Her çî qas nivîskêr navê pirtûkê danîbe Mirin jî, dev ji jiyane bernade.

Wexta jinikê tîrî kuştinê şêş mehî bihalekî ye, pitika wê ji mirinê xelas dibe û navê wê lê dikin: Berjîn.

Em ji aliyê peyvsaziyê ve lê binêrin: **“Berjîn: ber+jîn.”** Yanê ber û fêkiya jiyane.

Wekî ku em pê dizanin, kulîlka berfîn berxwedêrtir û serhildêrtir kulîlk e, di dem û kîşwerekê de ku jê pê ve tu kulîlk şîr nayên serî li berfê hildide, berî ku bihar (sembola vejînê)

li mirovan geş bibe, bi temenekî kurt bala me dibe ser jiyane; hêviyê...

Îcar, navê Berjîn ku di dawîya çîrokê de li pitika jinikê tîrî kirin jî, hêviya nivîskêr a ji bo jiyane, piştî mirinê car din û ji nû ve wekî fêkiyekê vedije.

Û Evdile Koçer, bi vê hêviyê beşdarî karwanê çîroknûsên li bakur dibe û hewl dide ku hêviya ku li dû mirinê dimîne bi me bide nîşan.

dzeraq@hotmail.com

Têbînî:

(1,2,3) **Mirin (Çîrok):** Evdile Koçer, Weşanên Aram 2006, Stenbol

Di Helbesta Cegerxwîn de Şêweyek: Helbestname

Arjen ARÎ

*Ma bi zehr î şekerî dost bixwînit carekî
Erzûhala ku nivîsî me bi xwîna cegerê!⁽¹⁾*

Nazim Hikmet ji ber bîr û baweriyên xwe -ya rast ji ber koministî û helbestkariya layangir -salên dûdirêj buhart li vê hepsê li wê hepsê. Heta ku reviya Sovyetê jî heps qada wî ya helbestnûsiyê bû. Wî her nivîsî. Di şevên bê heyv û stêr de, di rojên bê roj û ronî de, her kêlî her saet bi helbestê re radibû, bi helbestê re radîza.

Ji kaxizan carina rê û rêwanî nedima di berikan de. Bi taybet berîka çakêt ya çepê. Hepsiyên dema ku libên tizbiyên xwe yeko yeko bi ser hev de berdidan, wî, qelemzirîç ji destê xwe nedixist; geh dixist pişt guhê xwe, geh di nava tiliyên xwe yî misasî de dibir û dianî; li hundir li der, di dema 'voltayê' de geh radiwest û dinivîsî, geh dimeşîya û dinivîsî. Yê ku nizanibûya Nazim e, dê bigota 'dînek e; dînekî beredayî! Carinan bi ristekê re mîna ku bi pêlikekê ve hilkişe lingê xwe hildida, pê re destê xwe yî bi qelem mîna kelemekî rade çavên hinekan wisa bi hêrs, wisa bi kerb ji jor de dadixist ser kaxizê spî...

Nazim di xewnên şevan de helbest dinivîsî.

Di nava çar hîmên stûr î ker de kêliyên wî yên herî aram bûn dema ku ji Pîreyaya xwe re helbest dikir name: Di kêliyên wisa de mîna ku Pîrayeya wî li pêşberî wî rûniştî be, geh bi sihûd û diranan dibişirî; geh lêva jêr dimijî û gez dikir... Xwe bi xwe dipeyivî Nazim. Carinan dengê wî diçû qerdiyanên hepsê. Peyva herî zêde bi kar dianî, Pîraye bû, Pî-ra-ye-ya min!

Deriyên hesinî yên heft xilq, dîwarên ji hêwiye gurî gurî, hepsiyên nûhatî û yên

şenqxwarî dizanibûn ku navê jina Nazim Pîraye ye.

Jixwe her bi vê ristê dest bi helbestê dikir: Jina min, cana min...

Di destpêka salên 80'yî de di helbesta Nazim de li helbestnameyan rast hatim:

Nameyên ji Girtîgeha Çanqiriyê û Hepsa Bursayê.

Nazim di demên mahkumiyetê de tevî keştiya bi navê Erkin li gelek hepsên din; Enqera, Stenbol, Çanqirî.. geriyabû; herî pirr, dema herî dirêj li Hepsa Bursayê razabû. Wê demê ji vê hepsê wî jî mîna Seydayê min Cegerxwîn bi ristên helbestê li gel helbestên şîret û pendî, helbestname lêkirin:

Ji Jina Min Re Name

33-11-11

Bursa/Hepsişxane

Kulîlka min!

Di nameya dawîn de:

'Serê min diêşe

dilê min dixume'

tu dibêjî.

'Te bişeniqînî,

te winda bikim,'

tu dibêjî,

'nikarim bijîm!'

Tu yê bijî jina min, tu yê bijî

dê bela bibe mîna dûxaneke reş î li ber bê,
her bîranîn;

tu yê bijî, xwişka porsora dilê min,

herî pirr salekê didome

di qirnê bîstan de

êşa mirinê!⁽²⁾

Nazim di dema xwe ya mahkumiyeta bi salan ji heps û girtîgehan name û helbestname ji Pîrayeya xwe re dinivîse û dişîne. Lê Seydayê min Cegerxwîn...

Weke keleporekê di Şî'ra Dîwanê de çendî pesin-name, şîn-name... hebin û gelek helbestkarên Osmanî û Erebb û Faris li dû xwe berhemên di tama nameyê de hiştibin; ku em dîwanên li ber dest ên Seyda bigirin ber çav; em ê bibînin ku wî ji gelek mirovan re: ji Ehmed Namî re, ji Osman Sebrî re, Ji Qedrî Can û Mîr Bedir-Xan re... helbestname nivîsîne û şandine. Di vê navê de her çend weke vê şêwazê helbestên ku xîtabî dildara xwe Xeyda kirine, di dîwana

‘Agir û Pirûsk’ beşa ‘name û reşbelekan’ de cih negirtibin jî, di hemû dîwanên mayî de - Zend Avista, Salar û Mîdya, Şerefnameya Menzûm ne tê de -helbesten qest- Keyda cihekî girîn digirin. Dîsa jî, ji ber ku li ser van helbestnameyan dîrok û cih nîn e, li gorî bawerîya min helbestnameya ewil a Seyda, a ku ji kurê xwe Keyo re nivîsiye:

*Li dinyayê temaşe ke kurê min
Tu dê paşê binasî xweş bibênî
Li jorê kumbedê gerdûn e Seyda
Li jêrê xwe hemî tiştî dibênî*

.....

*Gelek jar û perîşan û belengaz
Heta dimrî tenê navek dimînî
Cegerxwîn destê rastî girt û kêşa
Dixwazî ko ji pişt perdê derênî⁽³⁾*

Seydayê ku bi rêya vê helbestnameyê dixwaze xwe ‘ragihîne’ kurê xwe Keyo û weke bavekî bikaribe ‘şairtiya’ xwe jê re vebêje, bi vê malika li jêr ya jî helbestnameyê dixwaze wî bi dewlemendiya ku jê re hiştiye, bihesîne:

*Hemî kes dilbijokê kerş û toz e
Nikarê gewherê paqij derênî⁽⁴⁾*

Her bav; şa’ir be, hemalê Deriyê Mêrdînê be, li hemberî zarokên xwe naxwaze fedîkar bîji. Fedîkariya bav -bi taybetî ya şa’irekî/e kurd- a li pêşberî zêrç û zarokan kambaxiya herî mezin e. Rûxîna ruh e, hilweşîna ‘qesra’ nivîsê ye.

Seydayê evînê, ji pêdiviyêke ‘rewşî’ an ‘derûnî’, wisa dixuyê ku xwestiye bi rêya helbestê ‘pirekê’ damezirîne di navbera xwe û Keyo de.

Keyo, mîna her kurî û nevî û neviçîcirkî payedar e bi kuritiya Cegerxwîn. Lê di dema ku mal li Qamişlokê bû û wî li Şamê kar dikir?..

Bersiva pîrsa jor em nikaribin bidin jî, Seyda bersiva Ehmed Namî bi rêya helbestnameyekê dide:

Ji Ehmed Namî Re

*Namî, me ji nameya te zanî
Seyda yî ji bo melayê Xanî
Serbestir î ez Feqîhê Teyran
Sed rengê Herîrî bo te heyran*

.....


*Mehbûb tu yî der sera Medîne
Mem çû bi xelet seraya Zîne*

*Ger çendî niha li Til-şêrê
Yûsif tu yî min tu xistî bîrê!
Lakîn tu di misrê dil de şah î
Sahib elem î, xudan kulah î*

.....
.....⁽⁵⁾

Mela Ehmed Namî ji derdora Nisêbînê ji gundê Erbetê ye, hemdemê Seydayê Cegerxwîn e. Ew jî weke Seyda hêj zarok, bê dê û bav dimîne, bi alîkarî û piştgiriya meta xwe diçe medreseyê.⁽⁶⁾ Di dema xwe de, weke ku Seyda jî pesnê wî dide, di ristê de jîr û şareza ye, lê mîna gelek navdarên wê demê şî’ira vî zatî jî di bin siya helbesta Cegerxwîn de di ‘xumamê’ de dimîne.

Ne Seydayê Namî bi tenê; ji hozanên ‘Nîfşê Hawarê’ yên ku ji bin siya sîwana Şî’ira Cegerxwîn nefilitîn yek Osman Sebrî ye, yê din Qedrî Can e. Îro ev her du zat çendî ji hêla nivîskar û xwendevanên wêjeya Kurdî ve bêtin nasîn jî, di dema xwe de di nava gel û entelijansiya wê demê de ne namdar in bi qasî Cegerxwîn. Çendî mijara nivîske din be jî dixwazim bibêjim Seyda Homeros-Evdalê serdema xwe ye. Ji vê



pevgirêdanê; ku çend gotin pêdivî bin: Çi li medreseyê li der û dora feqî û derwêşan, çi di nav xelkê nexwende de Seyda bi rista xwe 'denbêjê' zar û azara serdema xwe ye.

Piştî vê tesbîtê ku em dagerin ser mijara xwe; Seyda di destpeka weşana Hawarê de, sê helbestnameyan; yekê 'Ji Hawarê re', yekê 'Ji Xwediyê Hawarê re', ya din Ji Kiryarên Hawarê re rê dike:

Ji Hawarê Re

*Hezar carî pîroz bikin ev hawar
Gelek xob û rind e wekî gulîzar
Gulistana zarê me ye pîr ciwan
Pesên dide ko min berê wê dixwar*

.....

*Serefrâz û comerd e ew bexçevan
Didî her kesî wî berê abîdar
Qelen kêr e û erzane pîşes qirûş
.....⁽⁶⁾*

Ji Xwediyê Hawarê Re:

*Di kurdan de me dî yek Mîr û hakim
Ji ber eqlê wî girtin ayina Cem
.....
Bi mîranî şehînşah û serefrâz
Bi mîranî ji wî mexlûb e Ristem
.....
Celadet beg bi nav e, min şahî
Qebûl kerdem, Cegerxwîn bûye an dem!⁽⁷⁾*

Ji Kiryarên Hawarê Re

*Hawar û hey hawar e çiman wisa dinalî
Sed heyf û sed mixabin bê zîv û zêr û mal î
.....
Hawar ti wî di kurdan de di her mekan û erdan
'Ehyeytê fikre qewmîn edha mînel xeyalî'
.....
Çi hewce ye ko bêjim, çetir ji min dizanîn
Hawar çiqas delal e, naket li me delalî*

*Welahî bûm Cegerxwîn ji derdê kurdê nezan
Herçî dibêji kurd im, guh bidne ber meqalî!⁽⁸⁾*

Di nava van 21 helbestnameyan de du kit bi zarê sorî, yek jê pêncik e ku îtxafî Celadet beg kiriye, sê heb bersiv in; Bersiva Ebdil-Xaliq Esîrî, Bersiva Şêxekî, Besiva Osman Sebrî ye, ku ji van bersivan, hew a bi sernavê 'Bersiva Osman Sebrî' bersiva Osman Sebrî ye, du heb bo Qedrî can in, yek Bo Hevalekî, yek Ji Hisênê Emîn Re, Ji Şewket Zilfî Beg Re, Ji Mezinên Kurdan Re,

Ji Hişyar re, Ji Wanî Re, Ji Elî Ewnî Re û yek ji şîn-name ye:

Şîna Şêx Kemal

*Der deron im, ah û hesret, nalenal û hezn û şîn
Sal û mah im, roj û gav im, rengê dogeh xemcivîn
Mest û sergardan û jar im men ji dil ah û enîn
Wey Cegerxwîn hê ji nû ve axivîne sed birîn
Çûye rehmet, pîrê pîran şêx Kemalê qutbê dîn
.....
.....⁽⁹⁾*

Ji van 21 helbestnameyên 2 kit jê bi zarê sorî, yek bo xanimeke sorî ya nav nediya e:

Xanimekî Ciwan

*Ey xanimem fermû were hucrê mutala
Da şerhî bikim bo te evan fikr û xiyala
.....
Ger ser xwe nejin xanimem pûç e xeyalem
Bê ceng û edeb marûzekem hiç û betala
.....
Ger şuhretê dawê ke Cegerxwîn û ciwan im
Bûm serwerê kala, bi xwe dilgirtiyê nala!⁽¹⁰⁾*

Cegerxwîn hêza hozanvaniya xwe ji du qulzemên evînê; evîna welat û evîna takekesî werdigire. Seyda di destpêka rêya hozanvaniya xwe ya dîdirêj de heta 'qonaxekê' evîna welat û ya muşexes (welatê ku yar e, yara ku welat e) di nava hev de /têkel/ bi hev ve bestî bike spehîti û stûna helbesta xwe jî, roj têt xwe û helbestê ji bin vê bandor û karteka helbesta 'tasawîfî' derdixe; yarê weke yarê, welat weke welat bi cih û bi nav dike.

Her helbestkar dildarê welatê xwe ye.

Her helbestkar bi welatê xwe û helbesta xwe heye!

Cegerxwînê dildarê Kurdistan, dilê xwe bike du felqe jî, tîfilekî jê bide şox û şenga xwe 'Xeyda' jî...ew; Cegerxwînê di dilê kurd û Kurdistanê de ye...

Min beytûşe jê re negotiye' Seydayê Evîn û Birînê!

24/07/2007/Amed

Têbînî:

- ⁽¹⁾ Diwan, Melayê Cizîrî
⁽²⁾ Nazim û Piraye, N.Hikmet, Wş. Adam, A. Arî
⁽³⁾, ⁽⁴⁾, ⁽⁵⁾ Agir û Pirîsk, Cegerxwîn, Wş. Avesta
⁽⁶⁾ Şai'irên Kurdan
⁽⁷⁾, ⁽⁸⁾, ⁽⁹⁾, ⁽¹⁰⁾ Agir û Pirîsk, Cegerxwîn, Wş. Avesta.

SEYDAYÊ TÎRÊJ

Amadekar:

Enîse ŞÎRÎN - Azad ZAL

Seydayê Tîrêj û Dîwana Yekem XELAT

Zinar SORAN

Pêşgotina Dîwana Yekem Xelatê

Zinar SORAN

Du Hevpeyvîn Bi Seydayê Tîrêj Re

&

Helbestvanekî Ji Nîfşê Kevn Bi Nîfşê Nû Re

Dipeyive (Hevpeyvîn)

Konê REŞ

Em Hemû Berpirsiyarê Êşa Vî Geli Ne (Hevpeyvîn)

Dildarê MÎDÎ

Xewna Min û Bersiva Cegerxwîn

Seydayê Tîrêj

Bersiva Nayifê Heso

CEGERXWÎN

Seydayê Tîrêj Di Çend Rûpelan De

Ciwanê ABDAL

Şîna Seydayê Tîrêj

Ciwanê ABDAL

Xwendinek Li Dîwana Xelat a Seydayê Tîrêj

Îbrahîm EBDÎ

Bilbilê Dilşadî

Seydayê TÎRÊJ

Tîrêjê Bilbilê Dilşad

Mizgîn AYDIN

Jin Di Helbestên Tîrêj De

Mahmûd BADILÎ

Ey Welat

Seydayê TÎRÊJ

Pê Xweş im

Seydayê TÎRÊJ

Dosye:
Seydayê Tîrêj û Helbesta Wî

Amadekar:
Enîse Şîrîn & Azad ZAL

**“Ez li helbestê bi nezim,
awaz, qafiye (serwe)
û naveroka wê dinêrim.
Ev her çar şert wê
(helbestê) dîkin helbest”.**
Seydayê TÎRÊJ

Ji bo vê hejmara Kovara Wyê me berê xwe da helbesta klasîk a kurdî. Me yek ji nûnerê helbesta klasîk a kurdî Seydayê Tîrêj hilgirte dest.
Seydayê Tîrêj ji aliyê wêjeya klasîk ve mirov dikare bibêje ku ew nûnerê nişfa dawîn e. Her çi qas di bin siya Cegerxwîn de mabe jî gelek helbest û qesîdeyên wî di nava gel de dijîn û tene gotin.
Di amadekirina dosyeyê, bîdestxistina wêne û belgeyan de alîkariya Cemal Tîrêj gelek çêbû. Em spasdarê wî ne.

Seydayê Tîrêj

Seydayê Tîrêj di sala 1923'yan de li bajarê Heseke li gundê Nicîmê hatiye dinyayê. Navê wî yê rastîn Nayîf e. Ew kurê Heso ye. Wekî Nayîfê Heso tê nasîn. Di biçûkatiya xwe de bi malbatî koç dîkin gundê Sêmitîkê û li wê bi cî dibin. Perwerdehiya xwe ya pêşîn li ber Brahimê Golî li gundê Sêmitîkê dike. Di sala 1937'an de li Amûdê dest bi xwendina dibistanê dike. Ji ber mercên hejariyê piştî pênc salan nikare xwendina xwe dewam bike.
Seydayê Tîrêj bi nasandina Cegerxwîn, Qedrî Can, Hesen Hîşyar, Nûredîn Zaza û yên wekî wan re gav diavêje nava qada wêjeyan û helbestvaniya kurdî.
Di vî demê de Seydayê Tîrêj bi Koma Xoybûnê re dixebite û xebatên siyasî dimeşîne. Demekê jî ew û Cegerxwîn bi Partiya Komunist a Suriyeyê re dixebitin. (1948-1952) Di sala 1952'yan de tê girtin. Piştî ku ji zindanê tê berdan heta 1973'yan di nava ereban de wekî sirgun diji. Piştî wê sale vedigere Heseke û heta dawîya temenê xwe li wê derê dimîne.

Berhemên Seydayê Tîrêj:

1-Diwana Xelat, Libnan- Bêrûd -1985. Ev diwan di sala 1990'î de li Swêdê jî hatiye çapkirin.

2-Diwana Zozan, Libnan- Bêrûd -1990.

3-Diwana Cûdî, Libnan- Bêrûd -1998.

4-Serpêhatiyên Kurdan.

Ev kurteçîrok ji aliyê Şêx Tewfîqê Huseynî ve hatine wergerandin ji bo zimanê erebî.

4- Mewlûda Kurdmancî.

5- Diwanek ji helbestan. Ev çend helbestên destnivîskî ne.

5- Serpêhatiyên Kurdan.

Xelatên Ku Ji Bo Seydayê Tîrêj Hatine Dayîn:

-Xelata Roja Helbesta Kurdî li Sûriyê 1995.

-Xelata Sedsaliya Rojnamevaniya Kurdî, 1998 / Hewlêr.

-Xelata Koma Helebçe ya Folklorê Kurdî li Cizîrê / Heseke 2001.

Seydayê Tîrêj û Dîwana Yekem XELAT

Zinar SORAN



Cara pêşîn navê Seydayê Tîrêj min bi helbesta wî ya “Ey Bilbilê Dilşadi” bihîstibû. Ev helbest ji aliyê hinek hozan û dengbêjan ve weke stran dihate gotin. Tesîreke baş li ser min hiştibû. Min helbestên wî yên din jî meraq dikir, lê mixabin tu dîwanên wî li ber destan tune bûn.

Piştî ba û bahoza xezeba 12'ê îlonê, weke gelek welatparêz û şoreşgerên kurd ez jî derbasî Biniya Xetê bûm.

Zinar Şîro jî daketibû Biniya Xetê. Zinar Şîro bi xwe helbest dinivîsand û meraqek wî ya taybetî li hemberî helbesta kurdî hebû.

Em di wê demê de, li cem malên kurdên welatparêz diman. Qedir û qîmetekê taybetî didan me. Mazûbanî û mêvanperweriyeke wiha nîşan didan ku her gav cihê pesn û serbilindiyê ye.

Seydayê Tîrêj li Heseke dima. Li ser daxwaza Zinar Şîro em çûn serlêdana Seydayê Tîrêj. Wê gavê Seyda mirovekî navsere bû, lê weke xortekî ciwan tevdigeriya. Bi destê xwe îkram ji me re dikir. Mirov ji ber nefsbîçûkiya wî, xizmet û mêvanperweriya wî şermezar dima.

Seydayê Tîrêj
li Heseke dima, li ser
daxwaza Zinar Şîro em
çûn serlêdana wî...
Wê gavê Seyda mirovekî
navsere bû, lê weke
xortekî ciwan
tevdigeriya; bi destê xwe
îkram ji me re dikir...
Mirov ji ber nefsbîçûkiya
wî, xizmet û
mêvanperweriya wî
şermezar dima

Seyda ji me re çend helbestên xwe xwend û destnivîsên dîwan, kurteçîrok û helbestên xwe nîşanî me da. Seyda bi tîpên erebî dinivîsand. Me bi hevdu re biryar da ku em dîwana wî ya pêşîn ya bi navê “Xelat” wergerînin tîpên latînî û çap bikin. Ji bo vê yekê, Zinar Şîro demeke dirêj li cem Seyda ma û wan bi hev re dîwana “Xelat”ê wergerandin tîpên latînî.

Piştî du sê salan ez hatim Swêdê. Me destnivîsa dîwana “Xelat”ê jî bi xwe re anî Swêdê. Min ew destnivîs da birêz Reşo Zilan ku ew di warê rastnivîsê de kontrol bike. Ez û kek Reşo bi hûrgilî li ser redektekirina dîwana “Xelat”ê rawestiyân. Ji ber ku Seydayê Tîrêj helbestên xwe bi wezn û kafiye nivîsandibû, latîniya wê jî diviyabû li gor wê bihata wergerandin.

Gava dîwana “Xelat”ê ji bo çapê amade bû, ji bo demeke dirêj di ser de derbas bûbû, me xwest ku em dîsa destûra Seydayê Tîrêj bistinin. Di wê demê

de Mihemed Altan ji Swêdê çû Sûriyeyê. Wî Seydayê Tîrêj ziyaret kir û bû mêvanê wî. Seyda bi awayekî nivîskî destûr da ku em dîwana “Xelat”ê çap bikin. Piştî vegera

Mihemed Altan, diwana “Xelat”ê ji aliyê Weşanên Niştîman ve li Stockholmê, di sala 1991’an de hate çapkirin. Weşanên Niştîman bi navê “Daxuyaniya Weşanxaneyê” daxuyaniyek kurt û min ji pêşgotina vê diwanê amade kir.

Loma jî, ez dixwazim di serî de spasiyên xwe pêşkêşî gorbihuşî Seydayê Tîrêj bikim ku destûr û payema weşandina berhemeke wiha birûmet da me. Her wiha divê ez spasî Zinar Şîro, zimannasê kurd Reşo Zilan û rehmetiyê Mihemed Altan bikim ku ked û wexta xwe dan û ev berhema birûmet gihîşt ber destê xwendevanên kurd.

Xelat diwana yekem a Seydayê Tîrêj e. Diwan ji pênc beşan pêk hatiye. Di “Beşa Serpêhatiya Evînê” de du helbest, di “Beşa

Marş û Ristan” de bîst û yek helbest, di “Beşa Gazin û Şînan” de deh helbest, di “Beşa Evînî” de sî û şeş helbest û di “Beşa Çend Ristên Çandî û Çirokî” de neh helbest hatine nivîsandin.

Di pêşgotina “Xelat”ê de bi kurtayî min behsa jiyana Seydayê Tîrêj ji kiriye. Bê guman gava min ew pêşgotin amade kiribû, Seyda hê li jiyana bû. Heta wê demê Seydayê Tîrêj du diwan “Xelat” û “Zozan” û hinek serpêhatî û kurteçîrokên kurdî amade kiribûn. Lê weke tê zanîn, ji derveyî diwana yekem Xelatê, du diwanên din yên Seydayê Tîrêj bi navê “Zozan” û “Cûdî” û her wiha pirtûkek wî ya ji kurteçîrokan pêk tê bi navê “Serpêhatiyên Kurdan” hatine weşandin.

Zinar Soran
Stockholm, 2007.07.15

Pêşgotina Diwana Yekem “XELAT”ê

Gelê kurd bi gelek awayî di bin nîrê zilm û zordariyê de dijî. Dijminên nijadperest û xwînrej bi diwarî û bi hovîtiyeke mezin dixwazin neteweya kurd, ziman, edebiyat û zargotina wî ji holê rakin. Ew, bi wê xewn û xeyala ku neteweya kurd û navê Kurdistanê ji ser rûkarê erdê rake û ji rûpelên diroka dinyayê derxîne dijîn.

Edebiyat û çanda kurdî ya bi devkî xwedî dirokek

gelek kevn û dewlemendiyeke pir mezin e. Bi hezeran stran, helbest, çîrok û serpêhatiyên kevn, heta îro bi awayekî devkî di nava gelê me de jiyane û gihîştine qirnê me. Lê, bêguman ji wê xezîneya dewlemend bê hejmar berhemên heja ji, hatine wendakirin. Pêwîst e, ku em wan perçeyên ji wê xezîneyê û defineya di nava gel de maye, bi awayekî xezînegarî berhev bikin û wan ji windabûnê xelas bikin. Ev kar û xebat wê gelek quncikên dirok, edebiyat û çanda kurdî ronî bike û wê ziman û edebiyata kurdî bi nivîskî ji dewlemendtir bike. Lê, eger em di vî warî de dereng bimînin û di dema wê de vatiniyên xwe bi cih neynin, em dê

ji gelek tiştên wê dewlemendiya heja û giranbiha bê par bimînin.

Kolonyalistên hov û şovenîst digel talankirina dewlemendiya ser erd û bin erda welatê me, bi diwarîyeke mezin êrişî ser ziman, edebiyat û çanda kurdî dikin. Ew baş dizanin, ku neteweyeke bê ziman û edebiyat wek mirovekî ker û lal be û gelekî hêsanîr e, ku wî bi vî awayî di bin nîrê kolonyalistiyê de bihêlin. ji

ber wê jî, bi vî diwarîyê êrişî ser ziman, edebiyat û kultura gelê me dikin.

Lê, her wekî xuya ye, ev armanc û daxwaza wan heta niha neçûye serî û di dilê wan de bûye kuleke mezin. Neteweya kurd serî ji wan re netewandiye û natewîne. Gelê kurd, ji bo ku ji bin nîrê bindestiyê derkeve û wek her neteweya serbixwe li ser axa welatê xwe wek mirovan biji, bi sedan serhildan û berxwedanên bi rûmet daye. Bê hejmar law û keçên xwe di vî riyê de gorî kiriye.

Ev şer, di warê parastina ziman, edebiyat û zargotina kurdî de jî, bi diwarî dom dike û roj bi roj gurtir û moderntir dibe. Ronakbîr, nivîskar, helbestvan û hozanên kurd ên bi rûmet di nava vî şerê bi şeref de cihekî taybet digirin. Xebat û têkoşîneke giranbiha didin. Tevî ku zilm û

TÎRÊJ

XELAT

Diwana Yekem



Seydayê Tîrêj û Şivan Perwer

zordariya dijmin û bêmkaniyê jî, wan mêrxasan li ser ziman, edebiyat û çanda kurdi berhemên hêja afirandine û diafirinin. Di warê nivisandinê de jî, ziman û edebiyata kurdi roj bi roj bêtir pêş de dibin û dewlemendtir dikin. Pêwîst e, ku em vê xebat û têkoşîna hêja û giranbiha kêmanebînin û wan tenê nehêlin. Yek ji wan helbestvanên bi nav û deng jî, Seydayê Tîrêj e. Lê, pir heyf û mixabin, ku heta niha diwanên wî nehatibûn weşandin û di nava gel de nehatibûn belavkirin. Eger, em çend helbestên wî yên ku dengbêjan kirine stran bidin aliyekî, wê gavê mirov dikare bi hêsanî bibêje, ku gelê me jî tam û lezeta wan helbestên xweş, şêrîn û hêja bê par maye. Seydayê Tîrêj, di helbestên xwe de, zîlm û sitemkariya li ser neteweyê kurd, hoy û sedemên bindestiya gel û ji bo rizgariyê pêwîstiya têkoşîneke bi tifaq û canbêzariyeke bê sînor bi hunermendiyeke mezin û bi zîmanekî şêrîn û zelal anîye ziman. Mamoste Tîrêj, li ser riya helbestvanên berê yên klasîk dimeşe û helbestên xwe di vê şopê de dinivîsîne. Di vî warî de, ew wiha dibêje: "Ez li helbestê bi nezim, awaz, kafiye û naveroka wê dinêrim. Ev her çar tişt wê dikin helbest." Seyda, rûmet, ronahî û cewherê helbestê jî wiha tîne ziman: "... Ma rûmeta şîrê çî ye, ned' xizmeta millet de bi Ronahiya şîrê çî ye, pesnê welat ku tê'd nebî Çibkim ji wê şî'ra rijî, danigire sewda û mejî Derdê dil û can nakuji, çaxê ku cewher tê'd nebî..." Mamoste Tîrêj di sala 1923'yan de li qezaya Qamişlo, li gundê Nicimê hatiye dinyayê. Navê wî yê rastî Naif e. Ew kurê Heso ye û ji malbateke hejar e. Gava ew dibe şeş salî, bavê wî mala xwe koç dike û li gundê Sêmitikê bi

cîwar dibin. Tîrêj li wê derê û li cem Mele Bîrahîmê Golî, Qur'anê û çend kitêbên olî dixwîne. Wek gelek helbestvanên kurdan, ew jî di medreseya olî de dest bi xwendin û nivisandinê dike.

Ew, di sala 1937'an de hatiye bajarê Amûdê û li wê derê dest bi dibistanê kiriye. Pênc salan li wê dibistanê xwendîye. Lê, ji ber mercên aborî xwendina xwe nedomandiye. Li wê derê, têkiliyên wî bi helbestvanê mezin Cegerxwîn, helbestvanên hêja û ronakbîrên bi rûmet Qedri Can û Nuredîn Zaza re xurt bûye. Bi tesîra wan jî, evîna helbestnivisandinê di dilê wî de şax daye.

Bi wan re xebata niştimanperweriyê kiriye û wek gelek welatperwer û ronakbîrên kurdan, Seydayê Tîrêj jî, di nava rêxistina "Xoybun"ê de cihê xwe girtiye. Ligel nivisandina helbest û çirokan, têkoşîneke siyasî û bi rêxistinî jî meşandiye.

Mamosteyê mezin û bi nav û deng Cegerxwîn di diwana xwe ya "Ki Me Ez" de, li ser Seydayê Tîrêj, bi navê wî yê rastî (Naifê Heso) helbestek nivisandiye û hêviyên hêja ji wî kiriye. Seydayê Cegerxwîn di wê helbesta xwe de wiha dibêje:

"...Ev xwendin û zanebûn
Nêzik dikin serxwebûn
Xortên wek te pir zana
Gerek bêjin; nezana
Bira destên hev bigrin
Di vê rê de em bimrin..."

Mamoste Tîrêj, ligel hinek kurteçirokan du diwan nivisandiye. Navê wan "Xelat" û "Zozan" in. Seyda, niha li Başûrê Rojava diji û helbestên hêja dinivîsîne. Em hêvîdar in ku jiyana wî dirêj be û berhemên hêja ji bo gelê me biafirîne.

Zinar Soran / Çiriya paşîn, 1990

Du Hevpeyvîn

Bi Seydayê Tîrêj Re

Wek ku tê zanîn, di dawiya salên 1970'yî de û destpêka salên 1980'yî de, piştî ku kurdên me ji bakur û başûr sirgûn û mişextî Binxetê bûn, hingê geşbûnek rewşenbîrî û şiyarbûnek zimanhezî, xurtir ji berê, di nav me kurdên Binxetê de peyda bû û serê xwe bi bilindî rakir. Ta wan salan kêma kesan ji me, navê Seydayê Tîrêj seh kiribû, tevî ku seydayê Tîrêj nivîskarek ji nivîskarên kovara Roja Nû bû, ew a ku li Beyrûtê, ji rex Dr. Kamîran Alî Bedirxan ve dihat weşandin. Hingê piraniya me, me navê Cegerxwîn, Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî û Feqiyê Teyran bihîstibû û nas kiribû. Lê vê paşiyê, bi rêka dengê bihuştî Mihemed Şêxo û stranên wî yên ji gotinên seydayê Tîrêj wek:

Fîryad û sed ax û eman

Ez ketim ber êş û bela...

An:

Erê şûxê erê canê

Tu wer da'm biçne seyranê...

Em serwextî navê Seydayê Tîrêj û helbestên wî bûn. Û wiha ta ku dîwana wî (Xelat) di sala 1984'an de çap û belav bû û di pey re Zozan û Cûdî. Hem jî em bi dengê Saîd Gabarî û vê helbesta seydayê Tîrêj, eva ku cihê xwe di dilê guhdaran de bi xurtî hiştiye û bandora wê di civata kurdî de heye:

Ey bilbilê dîlşadî wer bes bike fixan

Derdê me giran e bira, birîna me kur e.

Wiha piştî ku helbestên Seydayê Tîrêj bi dengê Mihemed Şêxo, Saîd Gabarî û gelek dengbêjên kurdan ên din hatin gotin, ew kesên kurd ên ku evîndarên peyva kurdî ya resen bûn, dane ser şopa Seydayê Tîrêj û xwestin ku ew jî mîna wî û seydayê Cegerxwîn, Yûsif Berazî, Umerê Lalê bibin helbestvan. Û wiha di vê navê de bandora helbestên Tîrêj berz û eşkere bû.

Di berzbûna navê Seydayê Tîrêj de û navên mîna wî yên li jor me gotin û bi çapkirina dîwanên wan re, evîndarên zimanê kurdî û hezkerên hûnandina peyva kurdî peyda bûn û bi belavbûna zimanê kurdî û toreyê re gelekane dane ser şopa Seydayê Tîrêj û Cegerxwîn. Ta ku vê paşiyê, nîfşekî nû bi rengê nûjen berhemên xwe yên helbestî hûnandin..

Bi hatina vî nîfşê nû re, nexasim ew ên ku serwextî wêje û çanda gelên cîran bûn û bi zimanên wan cîranan tûrikê xwe ji rewşenbîriyê dagirtibûn, wan jî bi rengê nûjen helbestên xwe danîn û yên wek Tîrêj, Cegerxwîn, Yûsif Berazî, Omerê Lalê û Ehmedê Şêx Salih man ji kilasîkên kurdan. Tevî ku hêjî gelek ji xortên me, bi rengê kilasîk di bin bandora Cegerxwîn û Tîrêj û yên mayîn de helbestên xwe dihûnin. Hem jî wek ku diyar e her û her wê cudahî di navbera kilasîk û nûjen de hebe.

Di dema ku Seydayê Tîrêj dijiya de Konê Reş û Dildarê Mîdî pê re cuda cuda hevpeyvîn kirine. Em jî van her du hevpeyvînan pêşkêşî xwendevanên Kovara Wyê dikin.

Helbestvanekî Ji Nifşê Kevn Bi Nifşê Nû Re Dipeyive

Hevpeyvîn: Konê RES

Seydayê Tîrêj helbestvanekî kurd e ji nifşê kevn, ew nifşê ku ji destpêkê de pêşî bi nivîsandina kurdî latînî kiriye. Roja îro piraniya wî nifşî koç kirine wek: Mîr Celadet Bedirxan, Dr Kamîran Bedirxan, Qedrî Can, Reşîdê Kurd, Osman Sebrî, Cegerxwîn, M. Ehmed Botî, Mele Ebdulhadî, Mele Ehmedê Namî...

Seydayê Tîrêj jî, heval û hogirê van kesan bû û bi wan re ketiye kar û barê xebat û berxwedanê, di meydana ziman, tore û rewşenbîriya kurdî de xebitiye; bi taybetî nivîsandina bi zimanê kurdî û ji wî heyamê dûr ve berhemên xwe di kovarên Bedirxaniyan de belav kirine, ew kovar û rojnameyên ku di navbera salên 1932 û 1946'an de li Şamê û Bêrûtê çap û belav dibûn, wek Hawar û Ronahî li Şamê, di bin berpirsyariya Mîr Celadet Bedirxan de, Roja Nû û Stêr li Bêrûtê di bin pirsyariya Dr. Kamîran Bedirxan de.

Ango: Ji wê hingê de dan û stendin û təkiliyên Seydayê Tîrêj bi rewşenbîr, welatparêz û kultura gelê kurd ve heye û di nav refên rewşenbîrên Kurdan de xebat û bizav kiriye. Hêjayî gotinê ye ku Seydayê Tîrêj di sala 1942'yan de endamek bû ji endamên partiya Xoybûnê li bajarê Amûdê.

Wiha ji hingê de ta roja îro pênuşa Tîrêj ranewestiyaye û her û her wê pênuşê, kul, xem û janên gelê kurd bi dewêta reş û şîn nivîsandiye.

Hem jî pesnê gelê Kurd, Newroz û sersala kurdan, çiya û newalên kurdistanê daye.

Ji roja ku seydayê Tîrêj, bîrewer bûye, di rewşa gelê xwe de ponijiye û xemên gelê Kurd xwarine.

Konê Reş: Seydayê Tîrêj, ji kerema xwe re tu dikarî xwe ji xwendevanên kovara Nûdemê re bidî naskirin?

Tîrêj: Nave min Nayifê kurê Heso ye, ez bi nave Tîrêj di nav kurdan de hatim naskirin, di sala 1923'yan de, li gundê Nicîm ji herêma Qamişlo, li rojavayê Kurdistanê hatime vê dinyaya bi êş û jan, kêf û şahî. Niha ez li bajarê Heseke rûniştîme. Ez bavê çar xortan û pênc keçan im.

Di warekî din de, ez di sala 1937'an de yek ji endamên partiya Xoybûnê bûm û di wê hingê de Cegerxwîn jî weke min tê de endam bû, Qedrî Can mamostayê me her duwan bû û ji wê hingê de ta roja îro, min dest bi hûnandina helbestên kurdî kiriye, di destpêkê de alîkariya Cegerxwîn bi min re hebû, ji ber ku em her du mela bûn.

Konê Reş: Seydayê Tîrêj, helbestên te, an berhemên te yên pêşîn di kîjan kovar û rojnameyên kurdî de belav bûne û kîjan salê?

Tîrêj: Sê çar helbestên min di kovara Roja Nû de sala 1944'an de li Bêrûtê belav bûne, hingê ew cara pêşîn bû û ji wê hingê de bi berdewamî helbestên min di kovar û rojnameyên Kurdistanê de belav dibin, hem jî, hinek bûne stran, Mihemed Şêxo pênc helbestên min bi stranî gotine yek jê ev e:

Ey bilbilê dilşadî hela wer bike fixan.

Konê Reş: Gelo berhemên te di roja îro de, di kîjan kovar û rojnameyên kurdan de belav dibin û çi pirtûkên te hene?



“Di warê helbestan de, em bêtir bi pêş de çûne û sedemên pašketina me di warên edebî yên mayî de, belû ye ji ber perçekirina welatê me ye û qedexekirina zimanê me ye, ji wilo pêve ez tiştêkî din nabêjim!”



Tîrêj: Berhemên min çi ji helbestan be, di piraniya kovar û rojnameyên Kurdistanê de belav dibin û bi taybetî yên Kurdistanê Federe wek: Xebat, Metîn û yên Sûriyeyê, wek: Stêr, Gulistan, Roj, Gurzek Gul, Zanîn, Gelawêj û hwd.

Du diwanên min çap û belav bûne, yek jê bi nave Xelat di sala 1984'an de û ya din bi nave Zozan di sala 1992'yan de. Di roja îro de diwaneke min amade ye ji çapê re hem jî pirtûkek zargotinî.

Konê Reş: Rewşa weşanên kurdî li Sûriyeyê çawan e û li gor dîtinên te kurd di kîjan warê edebî de pêş de ne û di kîjanî de jî paş de mane?

Tîrêj: Derketina weşanên kurdî li Sûriyeyê bi berdewamî ye, bi xêra xortên nûhatî weke te û xeyrî te, em gelekî spasiya wan dikin û pêşketinê ji wan re dixwazin.

Gotineke Mîr Celadet Bedirxan hebû her dem digot: “Kurd dibêjin sal bi sal xwezî bi par.” Lê di bawerîya min de, îro ne wek heyama Mîr Celadet Bedirxan e, ez bawer im ku sala bê wê jî îsal xweştir û geştir be.

Ez ne bawer im ku em bi paş de ne û zimanê min nagere ku ez wilo bibêjim...

Di warê helbestan de, em bêtir bi pêş de çûne û sedemên pašketina me di warên edebî yên mayî de, belû ye ji ber perçekirina welatê me ye û qedexekirina

zimanê me ye, ji wilo pêve ez tiştêkî din nabêjim!

Kone Reş: Seydayê Tîrêj, aloziyên ku tu di zimanê kurdî de dibînî, çi ne?

Tîrêj: Di bawerîya min de, alfabêya me ya bingehîn ya ku Mîr Celadet Bedirxan daniye, em pê serbilind in û xebata xwe pê dikin bê ku em aloziyan bibînin.

Li Kurdistanê Federe bi tîpên erebî dinivîsîn. Tevî ku ez mela me jî, lê ez bê dil nivîsandinên wan dixwînim, em bi hêvî ne ku ew jî bi tîpên Latînî binivîsin.

Şeweyên ku di nav koç û hozên kurdan de hene, di pêşerojan de wê ew şewe bibin yek, kengî ku Kurdistan azad bibe û Radyo, TV û dibistanên me kurdan çêbibin, ango aloziyên ziman ên ku di nav me de hene, girêdayî serxwebûn û azadiya Kurdistanê ne.

Konê Reş: Gotin û daxwazên te ji xwendevanên Nûdemê re?

Tîrêj: Ez gelekî spasiya xwediya kovara Nûdemê dikim ku bi vê xebata çak radibe, di ber zimanê xwe de û ez bi hêvî me ku berdewam be li ser vî kar û barî û ji xwendevanên kurd bi hêvî me ku li zimanê xwe guhdar bin, zarok û cîranên xwe fêrî xwendin û nivîsandina kurdî bikin. Pêşî û paşî gotina min ji we re li zimanê xwe miqate bin.

koneresh@hotmail.com

“Em Hemû Berpirsiyarê Êşa Vî Gelî Ne”



**Daxwaza
min ev e;
bila her
kes rola
xwe bilîze
û
wezîfeya
xwe bi cih
bîne**

Hevpeyvîn: Dildarê Mîdî

*** Tu dikarî xwe bi xwendevanên me
bidî nasandin?**

Seydayê Tîrêj: Navê min î rastîn Nayif e. Lê belê ez di nava xelkê de bi navê Seydayê Tîrêj tême naskirin.

Ez di sala 1923'yan de li gundê Nicîmê ku girêdayî Qamişloyê ye hatime dinyayê.

Di 7 saliya min de, malbata me koçî gundê Sêmitikê kir. Li wê derê ez li ber destê Mele Îbrahîmê Golî fêrî Qur'ana Kerîm bûm. Di sala 1938'an de ez li Amûdê çûme medreseyê. Li wê derê ez diçûm komeleya Xoybûnê ku xortên kurd ava kiribûn. Min li wir Cegerxwîn, Hesên Hîşyar, Qedrî Can û yên din nas kirin. Pişt re ez li cem Nûredîn Zaza û Hesên Hîşyar fêrî xwendin û nivîsandina kurdî bûm.

*** Te kengî dest bi nivîsandina
helbesta kurdî kir?**

Seydayê Tîrêj: Wê demê 4 kovar bi zimanê kurdî derdiketin: Hawar, Ronahî, Stêr û Roja Nû. Me bi kêfxweşî ew kovar dixwendin, me ji nêzik ve helbest û nivîsên ku di wan kovaran de derdiketin dişopandin. Min bi xwendina wan kovaran re dest bi helbestan kir.

*** Heya niha çend pirtûkên te hatine
weşandin?**

Seydayê Tîrêj: Heya niha du diwanên min “Xelat” û “Zozan” derketine. Her wiha pirtûka min ya du cild ji “Serpêhatiyên Kurdan” hatiye weşandin. Cilda yekê bi navê “Tera-if Kurdî ye” bi erebî derketiye. Her wiha di gelek kovar û rojnameyên kurdî de gelek helbestên min hatine weşandin.


*** Tu helbesta modern çawa
dinirxîni?**

Seydayê Tîrêj: Ez helbesta modern bi xweşî dixwînim. Pêwîstiya gelê kurd bi vî awayê helbestê ji heye. Lê belê ez ne hostayê vî şeweyî me.

*** Tu dixwazî tişteki ji nivîskar û
helbestvanên Kurd re bibêjî?**

Seydayê Tîrêj: Daxwaza min ji wan ev e; bila her kes rola xwe bilîze û wezîfeya xwe bi cih bîne, em hemû berpirsiyarên rihetkirina êşa vî gelî ne.

(Têbînî: Ji malpera AVESTA hatiye girtin)



XEWNA MIN Û BERSIVA CEGERXWÎN

*Rojek ji yê buharê
Bîst û yekê adarê*

*Ez ji kara westiyabûm
Ji rojava razabûm*

*Xewnek kûr û xulobat
Bî ser çavê min de hat*

*Di xewê de min dibû
Dinya yek ser tarî bû*

*Gumîn ji tav û ewran
Dihat bi ser Kurdistan*

*Bi birûsk û ar û pêt
Dê dergûşa xwe davêt*

*Min dî xortekî bedew
Bi dest û pê û qelew*

*Şipya li ser textebend
Li me gotarek dixwend*

*Bakî gûr hat wî bayî
Ewr firikand bû sayî*

(.....)

*Ey seydayê CEGERXWÎN
Me'na xewna min bişîn*

*Çav li rê me dem û gav
Ji TÎRÊJ li te silav*

SEYDAYÊ TÎRÊJ

BERSIVA NAYIFÊ HESO

*Ey hevalê min î rind
Çi li bajêr, çi li gund*

*Bo milet û bo welat
Divê bikin em xebat*

*Gerek em ranewestîn
Ma ev ji kê tê xwestîn*

*Xewna te ya pir giran
Ji bo laşê te derman*

*Çi xewneke rast û xewş
Dilê te pê maye geş*

*Hewrê reş û pir tarî
Sitemkarî, xwînxwarî*

*Ew tîrêjên kesk û sor
Ala me ye çûye jor*

*Ar û pêtên ko me dî
Ma kê li me bû xwedî*

*Bayê me yê xurt û gur
Ji Mehabad dest pê kir*

*Va xuya ye wî bayî
Asman ji me kir sayî*

(.....)

*Ew xwendin û zanebûn
Nîzik dikin serxwebûn*

*Xortên wek te pir zana
Gerek bêjin nezana*

*Bere destên hev bigrin
Di vê rêkê de bimrin*

CEGERXWÎN

Seydayê Tîrêj

Di Çend Rûpelan De

Ciwanê ABDAL

"Ey hevalê min î rind

Çi li bajêr, çi li gund

(.....)

Gerek em ranewestin

Ma ev ji kê tê xwestin?

Xewna te ya pir giran

Ji bo laşê te derman

Çi xewneke rast û xweş

Dilê te pê maye geş

(.....)

Xortên wek te pir zana

Gerek bêjin nezana

Bere destên hev bigrin

Di vê rêkê de bimrin

(.....)"

Belê! Helbestvanê gewre Cegerxwîn bi van gotinên nazik bersiva Nayifê Heso dide. Nayifê Heso ew kes e ku di rêya helbest û torevaniya kurdî de gava çeleng avêtiye û di nava gelê kurd de wekî Seydayê TÎRÊJ tê nasîn.

Di raboriya nêzik de pêngava pêşketinê ya helbesta kurdî ya zaravayê kurmançî bi du navdarên gewre dest pê kir; yek jê Seydayê Cegerxwîn bû û yê din jî Seydayê Tîrêj.

Helbestvanê kurdî yê gewre Seydayê Tîrêj di sala 1923'yan de, li gundê Nicimê nêzîkî bajarê Qamişloka Rengîn, ango li ser rîya navbera Qamişlo û Amûdê kilometroya 10'an ku li rojavayî Qamişloke ye, li ber sinorê Sûriye û Tirkîyeyê ji dayik bûye. Navê wî yê zikmakî Nayifê Heso ye. Kurê Biroyê ji êla Bobilana

ye. Di nava gel de jê re Mamosta Tîrêj an Seydayê Tîrêj tê gotin.

Seydayê Tîrêj ji malbateke cotkar, ji maleke gundî û hejar; ango bê erd û emlak tê. Ew bi xwe jî biçûkê birayên xwe bû. Her wiha ew 6 salî ye wekî malbat ji gundê Nicimê koç dike û diçin gundê Sêmitika. Gava ku li wir bi cih û war dibin -wek heyamê berê- li ber destê Melayê gund Mele Îbrahîmê Golî dixwîne. Heyanî sala 1937'ê xwendina olî û Qur'anê û çend pirtûkên olî û tiştin din dixwîne. Piştî Mele hin şanê zîrekî tê de dibîne û bi temîna Mele diçe bajarê Amûdê û xwendina dibistanê ya fermî dixwîne. 5 salan ango heta 1943'yan dixwîne. Wê demê li ber destê mamosteyên gewre yên wê demê, wek: Qedrî Can, Hemze Begê Miksî jî dixwîne. Di wê demê de li welatê Sûriyeyê ku di bin dagirkeriya Fransayê de bû, berpirsyarê Mearif (Goçela perwerdekirinê) Miksî bû. Miksî di sala 1925'an de li derdora bajarê Amedê di şoreşa Şêx Seidê Piranî de yekî girîng bû.

Seydayê Tîrêj di wê demê de pir tişt nas kir, pir navdarên mîletê kurd nas kirin. Yên mîna Cegerxwîn, Osman Sebrî, Nûredîn Zaza, Qedrî Can û Melayên kurd û pir rindî... Bi rastî li wir, ruh û hestê

welatparêziyê li cem bi xurtî afirî û çêbû. Seyda di bin akama wan

navdaran de evîna helbest û nivîsê girt û li nik wî şax

veda. Lê di helbestên

Seydayê Tîrêj de xuya ye ku

bi şeweyê Cegerxwîn ve

hatiye girêdan. Ji lewre

piraniya dema xwe pê re

dibihurand. Heta ku tevî

Koma Ciwanên Kurd bûye

bi Cegerxwîn re bûye.

Di çaryeka sedsala

20'emîn de şerê navbera

împeratoriyan dest pê dike û

bi dawî dibe. Nexasim ev şerê

cihanê yê pêşîn di nava dewletên

dagirker de bû. Piştî serketina

hinan û daketina hinan, pir tiştên nû li

dar ketin. Yek jê hin dewlet çêbûn ku berî

hingê ne li ser nexşeya cihanê bûn û hin ji

gelan yên wekî kurdan bindest man. Lê

mixabin çerxa felekê xirab geriya û mîletê

kurd xwe dît ku li nav çar mîlet û nijadan

parkirî ye û bûye çar perçe.

Di raboriya
nêzik de
pêngava pêşketinê
ya helbesta kurdî ya
zaravayê kurmançî bi
du navdarên gewre
dest pê kir; yek jê
Seydayê Cegerxwîn
bû û yê din jî
Seydayê Tîrêj



Seydayê Tîrêj
di navbera
salên 1941 û
1943'yan de
karê bi dizî yê
komeleyê kir,
belavok li gelê
herêma
Kurdistanê
belav dikir ta
digihand qeza
Mêrdînê û
deşt û çiyayê
wê

Bi pêkhatina Şoreşa Oktoberê (1917) ya sosyalist re fikir û ramanên nû daketin nav miletan bi rengê serxwebûn û xoybûnê. Ji ber vê pêşketinê û wekheviyê; ji aliyekî ve pir dixsî ketibû navbera beg û axa û yên bi wan re mîna şêx û melayan; ji aliyê din ve hejar û belengazan mîna, cotakar û karkiran di nava şahiyê de bûn. Lewre gelê kurd ji ber xwe ve dest bi xebat û tevgera xwe kir.

Di bin akama van raman û bûyeran de Seydayê Tîrêj bêçar ma karê bi dizî bike û di sala 1938'an de tevli tevgera rêxistina Komeleya Xoybûnê dibe û dest bi kar û xebatê dike. Di navbera salên 1941 û 1943'yan de karê bi dizî yê komeleyê kir. Belavok li gelê herêma Kurdistanê belav dikir ta digihand qeza Mêrdînê û deşt û çiyayê wê. Bi van belavokan gel hişyar dikirin. Heta ku çelxa Tirkî bi van tevgeran hesiya û aciz bû. Ji ber vê demekê Seyda dikeve tengezariyê. Li bajarê Mêrdînê ji bo ku ji aliyê cendirmeyan ve neyê girtin cilên jinan li xwe dike da ku ji destê wan rizgar bibe. Heta dawiya rawestina Komeleya Xoybûnê vî karê xwe didomîne. Piştî vekişîna Fransayê ji Sûriyeyê Seyda hate girtin û Xoybûn hate qedexekirin.

Ji bo Seydayê Tîrêj salên ji 1937'an ta 1946 an, bi tevayî dema xwenaskirin û girtina riya pêşeroja xwe bû. Ji aliyê raman û hestan ve; ji aliyê çandî û civakî û konevanî ve; ji aliyê têkoşîna siyasî û kar û xebata gel û welat hate girêdan heta dawiya

jiyana xwe. Wî ji kar û xebata xwe tev gelê xwe, bo welatê bindest û çar perçeyên welat dimeşand. Bi xwe wan raman û him ji wan bûyer û tevgeran, giyanê welatparêziyê û him ji miletperweriyê bi xurtî li cem Seydayê Tîrêj çêkir. Gava tevli xebata Komeleya Xoybûnê bûbû, bi dilekî soz û germ, ji wê çaxê de Seydayê Tîrêj temenê xwe tev de, xist xizmeta gelê xweyî bindest.

Lê îca tevî xam û pênûsa xwe û rist û helbestên xwe bi hest û ramanan pêça û xwe avêt nav gel. Çi bi şeweyê helbestê ve, çi bi hêla çîrok û folklorê ve, ew daxwaz û doza yekîtî û berxwedanê her tim dikir. Çi bi evîni û çi welatî bûna, bi hesteke naz û durist dihûnand ewan hestên xwe.

Bi vî awayî Seydayê Tîrêj li Sûriyeyê bû yek ji hozan û gewreyên toreyaya Kurdî. Li dû Seydayê Cegerxwîn Seydayê Tîrêj dihat.

Bi wî şeweyê nû li dar ket, çi çandî, çi civakî, çi netewî. Belê bêtir ku bête jibîrkirin cora evîni jî, çimkî helbestên kurdî bê stranî nabe –belê mebesta min ne ku stran bi xwe –lê awaz û rim tede heye bê guman ji ber naverok, bi movik û rêz û bende, pir bi vî rengî li gasînê dibû, ji ramanên azadiyê û serxwebûnê, daxwazkirê yekîtiya gel û hevîgirtin û xebata wî bû, bi rastî tevî ruhê helbest û toreyaya kurdî bû, di jiyanê wî de, ku bi bir û baweriya karê rola konevanî dikir tevî xam û pênûsa çak bi tore û ristê ve.

Seydayê Tîrêj yekem helbesta xwe di sala 1943'yan de rist û nivîsî û hate weşandin. Navê helbesta wî ya yekemîn "Kerwanê Dewletan" bû. Di wê demê de xwest here Bêrûtê cem Mîr Kamîran Bedrxanê ku berpirsyarê Kovara Ronahî, Stêr û Roja Nû bû. Bi hevalê xwe Osê Hersan re ew helbesta yekem nivîsibû. Ji wê çaxê jî, têkilî di navbera wan de çêbû. Ji wê demê şûn de di wan kovaran de dinivîsî û belav dikir. Her û her bêhtir bi ziman û çanda kurdî ve hate girêdan.

Piştî herifandina Komeleya Xoybûnê Seydayê Tîrêj bê tevger neditebitî. Ji lewre tevli Partiya Komunîst bû. Wê demê ew û tevahiya hevalên xwe û serekê tevan Cegerxwîn bi hev re xebitîn. Di sala 1952'yan de di çaxa serokê Sûriyeyê Edîb Şîşekli de, tê girtin. Bi girtina wî re hin berhemên wî û pirtûkeke wî hatin talankirin. Piştî Seyda ji zindanê derdikeve, dide pey berhemên xwe, ku karibe vegerîne, li vir û li wir, bi pirs û daxwaz û alikariya viya û wiya, ta carekê bi temînî çû cem berpirsyarê emniyetê. Tiştên ku li ser wî bûn hatin girtin û talankirin û çawa soz dayê ku jê re vegerîne, lê mixabin ew soz neçû serî. Ji lewre ew kes mir û ew ta qetiya û pê re berhemê pirtûkekê ta bi ebed winda bû.

Lê ev ne tenê mebesta wî bû, ku dema Partiya kurda damezrandin, di sala 1957'an de, têkilî pê re bi xurtî danî, lê ne bi endamî, belê wek hevbendekî dilsoz.

Ji ber mercên aborî xwendina xwe kuta nake û vedigere, piştî kutabûna nivxwendinê, li Amûdê sala 1943'yan hate gundê Girkeftar û li wê bû Mela. Çend salan ew û hin ji malbata wî di sala 1957'an de ji wir jî bar kirin û çûn bi jêre ve li gundê ereban Sekfanê bi cih bûn. Li wir bû nivîskar û Melayê gund. Berpirsyarê wî gundi serekê Eşîra Cibûriyan Ebdilezîz El-Muslit bû.

Seyda li wî gundî û li herêma Hesekê bi temamî, nêzikî bîst û pênc salan didomîne. Dawiyê ji wir jî bi malbatî bar dike diçe bajarê Hesekê. Ew di sala 1971'an de li Taxa Ezîziyê, beşa Salihiyê li gundê Miftî bi cih û war dibe. Li wir bi coşeke mezin helbesta kilasîk ji dil û can dişopîne.

Ji ber ku Seyda pir gavin çak di tor û wêjeya Kurdî de avêtiye ne li Sûriyeyê bi tenê, bi baweriya min li tevaya Kurdistanê bûbû dengêkî pêwîst di reseniya helbesta kurdî de. Piştî belavbûna helbestên wî bi stran û awaz ketin ser zimanan. Wekî helbasta **'Ey Bilbilê Dîlşadî'**

*Ey bilbilê dîl şadî hela were bike fixan
Derdê me pir e ey lo bira birîna me kûr e.*

Seyda di 1971'an de, tevli rêza Partiya Demokrat a Kurdistanê dibe. Li wir ji nû ve pir pê xweş tê ku mîletê kurd rabû berxwedanê û pir kêfa xwe anî bi Barzanî ku şoreşa Başûrê Kurdistanê li dar xist. Bi rist û sirûdan pesnê şoreşê dida, tevli şîn û şadiyên welatê xwe, çi cejnên Newroz û avdarê bûna, çi navdar û pêşmerge û şehîd

Destê Seydayê Tîrêj
spî bû di alîkariya
xortên nû hatî de, ku
pir caran xweşgotin
dida wan, bi hêvî bû ku
wê şûna wî vala nemîne
û her wê riya helbest û
tore û çanda kurdî
bigihînin asteke
berfirehtir; her dem di
civînên xwe de digot:
"Bixwînin û binivîsin, çi
nûjen û çi serbest be..."



bûna û çî keç û jinên kurd bûna, tevayê azadî û serxwebûn û wekhevî bûna bi rist û helbestên xwe li ser digot. Bi xwe Seydayê Tîrêj dilsozekî pak bû, bo doz û daxwaza gel û welat, ji ber tevî xama xwe di riya wê de bû. Wî bi xwe dida xuyakirinê da ku 'helbest û helbestvan divê çî cejn û kêfên gel, serketin û serpêhatiyên gel hebin xuya bike, ji ber vê rola xwe rewşenbîr û nivîskar dikarin bibin serkêşê civaka xwe û êş û azerên gel bi ziman bikin û bidin xuyakirin.

Bi rastiya Xwedê, Seydayê Tîrêj, destê wî spî bû di alîkariya xortên nû hatî de, ku pir caran xweşgotin dida wan, bi hêvî bû ku wê şûna wî vala nemîne û her wê riya helbest û tore û çanda kurdî bigihînin asteke berfirehtir û her dem di civînên xwe de digot: "Bixwîn in û binivîsîn, çî nûjen û çî serbest be, yan kilasîk û rêzbend be, çî bi zimanê kurdî be, yan bi zimanê biyanî be. Ji ber ku Seydayê Tîrêj bawermend bû digot ku xortên ku bi vî karê şaristanî radibin kurd in, wê bi xwe berhemên wan jî bi kurdî xwe diyar bikin û wê têkevin xizmeta tore û çanda kurdî. Seydayê Tîrêj, dest li pişt nûhatîyan dixist û pir caran pêşgotin ji berhem û pirtûkên wan re dinivîsand. Wî xwe li ser kesekî mezin nedikir, xwe jî kesî/ê mezintir nedidit.

Berhemên Seydayê Tîrêj

Berhemên Seydayê Tîrêj jî bi xwe, piraniya wan helbest in. Heyanî niha 4 pirtûk dehênaye û çapkeriyê ew jî evin:

1. Xelat (Helbest): Bi alîkariya dost û hevalan, bi hejmareke kêr, li Şamê di sala 1985'an de, bi pêşgotina D. Zengî hatiye çapkirin. Her wiha di 1990'î de li Swêdê hatiye çapkirin.

2. Zozan (Helbest): Di 1990'î de bi pêşgotina D. Zengî li Şamê hatiye çapkirin.

3. Cûdî (Helbest): Di 1998'an de bi pêşgotina D. Zengî li Bêrûdê hatiye çapkirin.

4. Serpêhatiyên Kurdan: Di sala 1992'yan de li Şamê hatiye çapkirin. Ev pirtûk jî destan û kurteçîrokên folklorê kurdî ne. Ji weşanên Kovara Zanîne û bi alîkariya berpirsiyarê wê Ebdulbaqî Huseynî derketiye. Ev pirtûk di sala 1996'an de jî bo

zimanê erebî jî aliyê Tewfîqê Huseynî ve hatiye wergerandin.

Seyda di dawîya temenê xwe de pir bi qedr û hawa bû. Seydayê Tîrêj, sê caran hatiye xelatkirin :

1- Xelata Mihricana Helbesta Kurdî li Sûriyeyê, 1995.

2- Xelata Sedsaliya Rojnamegeriya Kurdî 1998.

3- Xelata Koma Helebçe ya Folklorê Kurdî li Cizîra Sûriyeyê 2001.

(*) Cegerxwîn, dîwana Kî Me Ez? Ji helbesta 'Bersiva Nayîfê Hesoyê')

ŞÎNA SEYDAYÊ TÎRÊJ

Ciwanê ABDAL

Ez ê çawa li xwe dînim îro
Bêjim Seyda wî ji nav me bar kir
Rast e bûyer: yasa xurist ber b'ro
Bes dabêjim Seydayê'm xwe par kir
Ne min kin dirêj
Seydayê'm TÎRÊJ
Seyda Tîrêj tu car namre li dila
Dema tarî rawest Tîrêj hila
B' tîpe-gotnî naz û pakî kurdî

Navdarê hest û helbest got bila
Ziman wê çî beje Seydayê'm TÎRÊJ
Du bûyer in jîn û mirin d'bûrin
Bi hev re ne cewî nav wan pir in
Çawa dijîn dibîne tîn û derin
Yam b'dilê wî ku li dila namrin
ez nakim dirêj Seydayê'm TÎRÊJ
L'jînê em dibin ermancên tîra
Bi navê Yazdan yek dike nîra
Tenê mehder eşq bo welat û gel
Dide mertal ber dil naçe j'bîra
Ci - Abdal dibêj Seydayê'm TÎRÊJ !
Rist xêz dimîn bi te sax dem çendî
Bi pirtûkên: Xelat Zozan û Cûdî
Ta ket rêza Cegerxwîn û Xanî
Her dimîn gotinên çak b'xwedî .
Hindek in ev rêz Seydayê'm pakrêz.

23-3-2002

Xwendinek Li Dîwana XELAT a Seydayê Tîrêj

Îbrahîm EBDÎ

Nasnameya miletan tore û wêjeya wan e. Hemû miletên cîhanê bi torevan û wêjevanên xwe tene naskirin. Wekî Shakespeareê îngilîzî, Danteyê îtalî, Voltaireyê frensî û Cervantesê spanî û hwd. Nasnameya miletê kurd jî bê guman Melayê Cizîrî û Seydayê Xanî û hwd. in. Ji ber ku berhemên wan di asta berhemên nivîskarên cîhanî yên bi nav û deng de ne û bandora wan a xurt li torevanên miletê kurd heta niha kiriye wiha tene zanîn. Seydayê Tîrêj jî di nav miletê kurd de yek ji helbestvanên bi nav û deng e. Ew yek ji wan helbestvanan e ku ketiye bin bandora Melayê Cizîrî û Seydayê Xanî. Lê bandora herî mezin a ku li Seydayê Tîrêj bûbû bandora Seydayê Cegerxwîn bû. Her

wiha Seydayê Cegerxwîn jî bêguman şagirtê Xanî û Cizîrî ye.

Seydayê Tîrêj jî kaniyên wan vexwar û li ser şopa wan meşiya. Tevî ku Seyda ne pir xwenda bû jî di warê helbestê de pispor û şehreza bû. Ji ber ku behredariyek xurt li nik wî peyda dibû. Ji ber vî hawî afirandina wî bedew û tekûz dihat.

Helbestên Seyda corecor bûn. Wek "weletperwerî, evînî, mirovanî, şîn û reşbelek, helbestên zarokan û çîrokên helbestî" bûn.

Berhemên seydayê Tîrêj evîn:

- *Xelat (Helbest) 1991 Swêd*
- *Zozan (Helbest) 1990 Şam*
- *Cûdî (Helbest) 1998 Şam*
- *Serpêhatiyên Kurdan 1 (Çîrokên filklorî) 1992*
- *Mewlida Pêxember (Bi kurmancî) 2006*
- *Serpêhatiyên Kurdan 2 (Neçapkirî ye)*
- *Hindek Helbestên Neçapkirî*

Dîwana Xelat


Seyda gelek caran digot: "Dîwaneke min a din hebû berî dîwana Xelatê." Lê seyda tevî dîwana xwe jî hêla rejîma Sûriyeyê ve hate girtin û dîwana wî li ba asayîşa Sûriyeyê ma û ji bilî çend helbestan helbestên wê dîwanê



Seydayê Tîrêj
yek ji wan
helbestvanan e
ku ketiye bin
bandora Melayê
Cizîrî û Seydayê
Xanî; lê bandora
herî mezin a ku li
Seydayê Tîrêj
bûbû bandora
Seydayê
Cegerxwîn bû

ne dihatin bîra Seyda. Wek helbesta ku Seyda diyarî Mîr Kamîran Bedirxan kiriye ya ku di dîwana Zozan de hatiye çapkirin û helbesta Xewna Min û Bersiva Cegerxwîn ya ku di dîwana Cûdî de hatiye çap kirin...

Dîwana Xelat di sala 1991'an de ji hêla Çapxaneya Niştîman ve li Swêdê hat çapkirin Mamoste Zinar Soran pêşgotina wê nivîsiye. Lê berî vê çapê, li Rojava di sala 1985'an de hijmareke hindik hatibû çapkirin.



Dîwana Xelat di sala 1991'an de ji hêla **Çapxaneya Niştîman** ve li **Swêdê** hat çapkirin, **Zinar Soran** pêşgotina wê nivîsiye. Lê berî vê çapê, li Rojava di sala 1985'an de hijmareke hindik hatibû çapkirin.

Naveroka Dîwanê

Dîwan ji 5 beşan tê hev.

Beşa yekem:

- Serpêhatiya Ciwan û Kejê ye. Ev serpêhatî ji 864 malikan hatiye ristin.

- Helbesta Gerek li Kurdistanê. Ev ji 340 malikan hatiye ristin.

Di van her du helbestan de nefesa Seyda ya dirêj tê xuyakirin. Her wiha bi van helbestan karîna wî di salixdanê de û wêneyên helbestî yên bedew ku dîmenên welêt tîne ber çavên mirov derdixe holê.

*Binefş û qewan û rehana du pel
Qedîf û simen, berbiroj û nefel
Êvarê li banê dibit ewreav
Li rû gulgiya jê dibare xunav
Tîrêjên di rojê xwe davêjne ser
Kulîlk û giya tev diçirsin li ber
Çivîk û quling, bilbil û endelîb
Digel hev dinalin bi dengêd xerîb
Şelûr û kevok, tîtî û bazbelek
Dikin geşt û seyran bi perwaz û lek
Ji sib ta bi êvar, ji şeb ta seher
Di nav gulgiyan ew dikin ceng û şer
Heyamê me bûrî li çol û çîyan
Li nêçîra wehş û teba koviyan*

Beşa duwem:

Ev beş beşa marş û ristan e

Di vê beşê de 21 helbestên li ser welatparêziyê hene. Di van helbestan de welatparêziya Seyda xuya dibe. Her wiha hezkirina wî ya li ser millet û welat û canfidabûna wî ji bo doza wî dide der.

*Ey welat ez canfidayê deşt û zozanê te me
Canfidayê av û dehl û bax û bîstanê te me*

Dişa Seyda dide xuyakirin ku mirovê bê welat be, ne hêja ye çi tiştî. Ji ber vê hêja ye ku mirov xwe bi qurbana welatê xwe bike.

*Ger tu nebî ma em çi ne
Canîm bi qurbanî welat
Bawer bike d'rêça te de
Xwîna me erzanî welat*

Seyda tim bawer bû ku wê doza wî bi ser bikeve. Ew jî wiha dibêje:



*Em hemî pêşmerge ne
Em li xwe pir ewle ne
Serfiraziyê dixwazin
Em ne bend û kole ne*

*Roj hilat, va çûye şev
Gel hemî, dest daye hev
Ew dikin kar û xebatê
Tev li pê doza xwe ne.*

Beşa sêyem:

Ev beş beşa gazine û şînan e.

Di vê beşê de 10 helbest hene. Ev xweştirîn helbestên Seydayê Tîrêj in. Wek helbesta "Bilbilê dilşadî" û helbesta "Qulingo". Di van her du helbestan de behredarî û afrandina Seyda diyar dibe û karîna wî di xurtbûna hûnandina helbestê de dertê holê. Bi bilbil re diaxive û wiha jê re dibêje:

*Ey bilbilê dilşadî hela wer bike fixan
Derdê me girane ey bira birîna me kûr e*

*Gorî te bitin cerg û dil û mêlag û hem can
Dengê te ye xweştir ji ney û nay û bilûre*

Û ji quling re wiha dibêje :

*Qulingê min çima îro
Bî qîrên tê ji germyana
Bî çeng û bask û perwazan
Berê te wa li zozana*

*Gelo ma qey tu dilya ye
Ji germa Kerbela jaro
Divê cê bav û bapîran*

Welatê berf û barana

Beşa çarem:

Ev beş beşa evînî ye

Di vê beşê de 36 helbest hene. Di van helbestan de hestê Seyda yên tenik û nazik xuya dibin. Lê evîna seyda ya ji yarê re ne cuda ye ji hezkirina welat. Welat û yar li ba Seyda yek in. Hezkirina yarê ji hezkirina welat e. Yê ku ji welatê xwe hez neke bi rastî nikare hezkirineke dî bike. Seyda wiha dibêje:

*Ji nêva ebrûyên cana dibînim
Welatê Serhed û Zozanê banî*

*Kilîşê kohê Sîpan û Ararat
Hivistîne li kofya kesrewanî*

*Enî gewher kitêba Zend Awesta
Zeradeştê mezin ew name danî*

Beşa pêncem:

Ev ji çend ristên çandî û çîrokî tê der.

Di vê beşê de 9 helbest hene. Hindek ji wan ji bo zarokan hatine çêkirin. Tev de pend û şîret in. Nexasim helbesta ji kurê xwe Dara re hûnaye. Di wê helbestê de Seyda ji kurê xwe Dara dixwaze ku rastgo be, dîlpak û dilovan be, jîr û zana be, xebatkar be bo welat wek bavê xwe Tîrêj:

*Ji yêd nezan tu dûr be kambax û malwêran in
Bî zana re mijûl be, ji wan pir bik tu yara*

*Dilxweşke yê dil bi xem, dilê kesî mehêlê
Dilovan be tu her dem, digel xizan û jara*

*Bike xebat bo welat, wekî bavê xwe Tîrêj
Bike çîqa ji te hat, nemîn ji pişk û para.*

Di vê gera hindik de li nav helbestên diwawana Xelat behredariya seyda diyar dibe. Bê guman ji hêla kêşê û terazûya helbestê ve kêmasî peyda dibin. Lê pir hindik in û diwan bi vê naverok û rîstandina hostayî cihekî bilind di pirtûkxaneyê kurdî de girtiye.

BILBILÊ DILŞADÎ

Ey bilbilê dilşadî hela wer bike fixan
Derdê me giran e ey bira birîna me kûr e

Gorî te bitin cerg û dil û mêlak û hem can
Dengê te ye xweştir, ji ney û nay û bilûrê

Sê hawê tê deng, yek ji sira bayê siba ye
Hawê dî ji dengê xuşîna dehl û reza ye

Hawa sisiya ji bêhna şemamok û gula ye
Lewra ku li dinyê tu bi nav û tu meşûr e

Karwanê me va bi rê ketî, lê şevreş û tarî
Serma ye terez kulyên, di berfê her dibarî

Bahoz e çelapek têne me, ji her çar kenarî
Warê me welat e ey heval, rêça me dûr e

Çar hawir me diz û keleş in, têk dane dijmin
Me ji hev radiqetînin bir bi bir, heyf û mixabin

Qet çare'w umîda me nema ye bilbilê min
Meydan e ji bo hirç û çeql, gur zûrezûr e

Meydan e ji bo hirç û çeql, rovî û keftar
Gorî te bim bilbil, ji serê darê tu wer xwar

Da pêk ve mijûl bin, bi xwe çend rojên di dijwar
Îro li me ferman e, li ser gerdenê şûr e

Destê tewqeyê îro ku em her du bidin hev
Çend sal û zemanên di xerab jîn em digel hev

Dinya bi xwe dewran e, bizan geh roj e geh şev
Geh tarî û dûman e û geh rewşen û nûr e

Dîna xwe bide nik bayê barîn ey birader
Stêra sibê îro ji şerqê li me da der

Rewşen kirî Kurdistan, bi carek wê seranser
Nîşana sibê ye fereca xêrê ne dûr e

Piştî wê stêrê bi xwe berbanga sibê ye
Wê roj hilê rohnî têkeve şûna şevê ye

Karwanê me wê bighêje war û meqsedê ye
Çerxa felekê her dem bi fetl û ger û dewr e

Çerxa felekê her dem bi fetl û ger û dewran
Hêvî û hewara me di Yezdanê dilovan

Umîda me her dem bi xwe serdarê li Berzan
Wek TÎRÊJ dibêje, jîn divê kotek û zor e.

Seydayê Tîrêj

(sal: 1975)

Tîrêjê

Bilbilê Dilşad

Mizgîn AYDIN

Gava ku ez aşiq û meşûqê, evîndar û dinê wê stranê bûm, zarok bûm. Min nizanibû ku wê ew stran evîna min a ewil be. Ango min nedizanî ku stranên em cara ewil ji wan hez dikin, evînen me yên ewil in. Lê her li guhê min ma newaya wê stranê û gotinên wê jî li dilê min. Her wiha piştî demekê têgihîştîm ku wan gotinên stranê yên xweş û têrwate yên Seydayê Tîrêj in. Û aqilê min ê zarok Seydayê Tîrêj wek tîrêjen rojê fêr kir û wisa lê geriya. Li ew hebûnên revok û azad. Li ew newayên reqsok û delaliyên wêjeyî.

Ew helbesta Seydayê Tîrêj ku bûbû stran û eşqa min a ewil wiha bû:

*Ey bilbilê dilşadî hela wer bike fixan
Derdê me giran e ey bira birîna me kûr e
.....
Karwanê me va bi rê ketî lê şev reş û tarî
Serma ye terez kulyên di berfê her dibarî
.....⁽¹⁾*

Tê dîtî ku ev helbesta Seyda ban bilbil dike, hawar, gazî û fixana wî ji bo bilbil e. Em dizanin ku bilbil (û gul jî) bi taybetî di wêjeya diwanê de gelek bûye îmge û besta yekem ji bo hozanan. Ev yek gelek asayî ye jî. Lewre dema ku peyva “bilbil” derbas dibe, mirov li ku dibe bila bibe, dilê mirov bi eşqa gulê û xemgînî dilerize. Her wiha gelek helbest û stranên me hene wek:

*Bilbil li ser şaxê çi xweş dixwîne
Rist û helbesta li ser diweşîne
Dilê bilbil bi kul û birîn e
Wek min hêjar e kezeb bi xwîn e
Bilbilo lo xeribo bilbilo
Dilbilo lo mehkûmo bilbilo
Dilbilo lo koçero bilbilo⁽²⁾*



Dixwazim bala we bikişînim ku di vir de hawar û fixan ji bo “koçertî, xeribî û mehkûmiya” bilbil e. Û mînakan didomînim:

*Ey bilbilo malikwêrano
Çendî tu dînî
Li çiyayê Kurdistanê
Li ser şehîda tim û tim dixwînî
Hey lo lo bilbilo malikwêrano...
Ji êvar de tu dinalî...”*

*Mînakek din: (silav li Aramê Tigran)
Hey lê lê wayê gidî bilbilo
Bayê lêxist hêlîn tev xera kiro
Perîşano sêwiyo mihaciro
Tu bi hesreta hêlîna keviro
Hey lê lê wayê gidî bilbilo ax û ax*

*Tu çima mayî wisa bê dar û şax
Tu reben î gune yî tu sêwî yî
Stara te tune tu bê cî yî (...)⁽³⁾*

Piştî van her sê mînakên helbestên li ser bilbil, dîsa dixwazim bilbilê Seydayê Tîrêj bînim bîra we, da ku em cihêrengiya bilbilê wî baş bibînin.

*Ey bilbilê dilşadî hela wer bike fixan
Derdê me giran e ey bira birîna me kûr e*

Çendî ku di helbestan de hozan ji bo rebentiya bilbil ban kiribe û li ser birîndariya wî naliyabe jî, Seydayê Tîrêj: bi ser birîn û neçariya xwe de dinale û dinale û hawar û fixana xwe digihîjîne bilbil, ji bo ku were ji bo rewşa kurdan a dogehî fixan bike... Nêzikatiya li îmgeyê ango li bilbil ya bi vî awayî balkêş hat ji min re. Lew bi vê

cihêrengiya Seyda em fam dikin ku “pêwendiya” di navbera Seyda û bilbilê (nizanim çima, timî wek ku bilbil tenê nêr be, qertafa nêrîtiyê hatiye bikaranîn) wî de li war û giyanek cuda de pêk hatiye. Lewre Seyda çîroka bilbilên rojhelat, ku tev ax û keser e (mînak: bilbil timî li ser gulê digirî, evîndarê wê ye, dixwaze ku vebûna wê bibîne, lê tam di dema vebûna wê de bilbil dikeve xewê (ev çîrok ji bo Teyrê Îsheq jî tê gotin) û gava şiyar dibe, dibîne ku gul vebûye û şefeq jî çûye. Loma ji timî digirî li ser vê bêmîradî û birînê û hwd. dide aliyekî, sêhra wê betal dike û çîrok û helbestek din diafirîne jê re. Vê carê bilbil, ne reben e, ne mehkûm û koçer e. Bilbil hêzdar e ku Seyda qêrîn û hawara me kurdan digihîjîne wî bêhna humancenterîzmê (nêzikatiya ku mirov dike bingeş û navenda hemû tiştî) jî betal dike û ahenga di navbera mirov û bilbil, kurd û bilbil, hozan û bilbil, helbest û bilbil de ji sererast dike, ji dubarehiyan rizgar dike.

Ev pêwendiya wiha helbestî û bilbilî, tîne ber çavên mirov ku wa ye Seydayê Tîrêj di nav bilbilan de maye. Çawa ku Teyran Feqiyê me yê xoşewîst tenê nehiştin û tenê nahêlin, bilbil ji Seyda Tîrêj tenê nahêlin, her li balê ne. Kî dikare bizanibe ka Seyda û bilbilan çî gotin di guhên hev de. Belkî bilbilan dilê Seyda yê bilbilî dît û dilê wî yê hozanî şanî wî dan. Û bi wî awayî Seyda dît ku bilbil û gul ne bêbest in ji hev re. Lê yek û bextewar in, gulhinar in timî. Belkî Seyda dît ku yên ku qet nagihîjin vebûna gula xwe û şefeqa wê tenê em in, lê ji bo ku vê rastiye nebinin, rebentî û sûcdariya xwe dikin stûyê bilbil. Ma kî dizane ku Seyda û bilbilan, Tîrêjen wî û gulên bilbilan çî gotin ji hev re xwe li kîjan warê berbangî gihandin hev û wiha bûn helbest ji me re.

Li aliyê din ev helbesta lehengbilbil, felsefe û boçûnek din jî, hevaltî û gaziyeke din jî pêşkêşî me dike wek ku lîra Apolon qefaltibe û lêxistibe; behsa şefeqên bilbilhez (Ku hez nekira hawar nedibirê) û bilbilên tofanderbas û dike alîkar ji me re. Kî ji me dikare bibêje ku “Na, bilbil nehatine hawara Seyda û ew ji bagerên berfê û zûrîna guran rizgar nekirine. Belkî Seyda û bilbil bi hev re gihîştibin şefeqa gula bilbil a bextewar û belkî yê ku niha bi bilbilan re dixwîne Seyda ye. Lewre her hozanek weka welatekî ye û bi

her risteya xwe jî welatan diafirîne. Welatên tenê û ji tenêtiyê, welatê ji bilbil û gulê. Li ser vê bingeşê em dikarin bibêjin ku Seydayê Tîrêj welatekî nû afirandiye ji me re; welatekî bilbilîn û gulîn, welatê ku gul û bilbilên wî azad û bextewar in. Ma ku bilbilên welatê mirov ne azad û bextewar bin, mirov dikare behsa azadî û bextewariya periya helbestê bike?

Em dikarin bibêjin ku di warê helbestê de yekem car (bi qasî ku ez dizanim) Seydayê Tîrêj bilbil ji “qefesa zêrîn” û bêwariyê rizgar kiriye û axîn û keserên wî bi dawî kiriye. Ma ji bilî hozan kî dikare vê yekê pêk bîne; deriyên qefesên zêrîn veke bi helbesta xwe ya bilbilîn û di deriyê risteyan ên ronahî de bilbilên şad û azad bigihîjîne hawara me.

Niha bi qasî bilbilan sivik, firoke, delal û nazdar e helbest û bilbil, bi qasî helbestên Tîrêjî birîndar û berxwedat e. Û Seydayê me jî bi gul, bilbil û helbestê evîndar e li rojhelata bêevîn. Lewre, bilbilê dilşa, Tîrêjê dilşa ye.

Bila ew ligel bilbilan bilbil ligel wî bin û mirin encax vebûna gulê be ligel wî bila bilbilê dilşa be her tişt Tîrêj be

Belê, hozan bi vê helbesta xwe gihîşt bilbilên dilşa û ew anîn hawara me. Ka li derdorên xwe binihêrin, belkî niha li dora serê we û li ber dilê we jî ew bilbilên dilşa û alîkar hebin û bi dilşahiya xwe ya li dijî bêbestî, belengazî û neçariya jiyanê; ji we re helbestên Tîrêjî bixwînin. Lewre dilşahiya wan ya helbestê û xemgîniya me ji rondikên wan in. Ma dewlet û hemû serdestî, tu car dikarin bi qasî bilbilan azad bifirin û kul û keser dikarin wek bilbil bi bask bin? Dibêjim qey baskberdana bilbilan a herî dilşa li dilê hozanê me pêkhatiye. Lewre belkî Seyda gul jî dilşahî jî ji bo bilbilan diziye.

Ka guhê xwe vekin, we bihîst. Seyda dîsa bi bilbilan re dixwîne û bilbil bi dizî dibêjin:

*Em belengaz bûn
wî em dilşa kirin
em bêwar bûn wî em biwar kirin*

Lewre warê herî rast û xweş, dilê hozan e û Tîrêjê bilbilîn, helbestên firoke dide me timî da ku em karibin bifirin bi helbestê re...

Jin Di Helbestên Tîrêj De

Daner: Mehmed BADILÎ

Jin bûnewereke çalak û jîndar e, bi hest û rewîşt û siruştîya xwe, pir tenik û naz û pak e, di avakirina desteya komelayetî de endameke bingehîn e û di derbarê rêxistin û karûbar û danûstandinên hundirê vê desteyê de bi kar û pêzan û jîr û beliban e. Îca wek ku mêr di desteya komelayetiyê de endamekî çalak e, jin ji wiha ye, bêtirî wilo jî, em dikarin bibêjin: Jin bingeha jîyanê ye, bingeha hebûnê ye, ew jina ku her du tuxm "Nêr û Mê" tev ji wê çêdibin û barê xwedîkirin û perwerdekirina zarokan hildigire û bi dîlpakî, rûxweşî û sîngek fireh karûbarê malê sererast dike, êdî ne gelek e ku em jê re bibêjin bingeha jîyan û hebûnê ye.

Lê pîrsa girîng li vir, gelo bê mêr karîna zawzeyî li cem jinê peyda dibe?

Bê guman ev karîna peyda nabe, îca em dikarin bibêjin, ne jin û ne mêr dikarin bêtirî hevdu bijîn, belê ber bi berdewambûn û pêşveçûnê ve hevdu sergîhayî dikin, bi hev re jîyanê xweş dikin, bi hev re hebûna xwe çeleng û geş dikin.

Lê çima jina kurd di civakê de bindest maye û çima rola wê bi anîna zarok û xwedîkirin û karûbarên malê tenê ve hatiye sînorkirin?

Bê guman bersiva vê yekê bi dîrokek dûr û dirêj ji kelekebûnên komelayetî, siyasî, derûnî û aborî ve girêdayî ye. Ev kêşeyên ha şirovekirineke pir dirêj ji wan re divê; bi kurtî, em ê vê pîrsê di du xalan de bicivînin:

1- Dagîrkirina welat û zor û sitemkariya ku li mîletê Kurd dibe ji hêla dewletên desthilatdar ve.

2 - Rewşa civaka kurdî, ku ew ji wek hemû civakên rojhilatê di bin desthilata beg, axa, paşa, êl û olê de dijiya.

Ev her du xalên ku me berçavkirin, bandoreke pir kirêt û ne li rê li civaka kurdî kirin, hiştin ku tevgera mîletê kurd ji hemû aliyan ve li paş bikeve ta radêya pûçbûnê û jina kurd beşek ji vê civakê ye, îcar çi zor û sîtema ku li civakê dibû ku ta niha jî dibe, bi ser wê jî de dibariya û hîna jî dibare.

Lê zor û sîtema ku li jina kurd dibe, bi rastî pir aloz û dijwar e, em dikarin bibêjin, zordestî ji du aliyan ve lê dibe: Yekem zordestiya siyasî – netewî ya ji hêla dewletên desthilatdar ve ya dîtir zordestiya komelayetî – qatî, ev celebê ha ji zordestiyê, bi desthilatdariya mêr û tîkiliyên civakî yên êl û olperestî ve girêdayî ye.

Ev her du şeweyên zordestiyê, hişt ku jina kurd jar û dil û perişan di navbera hebûn û nebûnê de, bê xwendin, bê rol, bê karê derve, bê xebat û bê nerîn û hwd. bimîne.

Lê piştî ku, ew guhertin û hişyariya ku li cîhanê (Ewropa û Sovyet) di derbarê kêşeya jinê û serbestiya wê de bi pêk hatibû, bayê ew ê hişyariyê derbasî rojhilatê jî bû û eva ha bandora xwe li civaka kurdî jî kir, nemaze piştî salên pênciyî yên ji sedsala bîstan (Nimûne rojavayê Kurdistanê), îca dibin bandora wan guhertin û pêşveçûnên ku di tevgera jinên cîhanê de çêbûbûn, hin pênuşên kurdî jî serî hildan û doza şiyarî û serbestiya jinê kirin, yek ji van pênuşên girîng, pênuşa helbestvanê me yê hêja Seydayê Tîrêj bû. Ku ji dil û can doza serbestî û hişyariya jina kurd dikir, îcar de ka em helbestên Tîrêj bişopînin bê çawa û bi çi rengî xwe nêzikî babeta jinê kiriye?

Seydayê Tîrêj di helbesta "Ey Keça Kurd" de, deng dide keça kurd ku ji xewa giran şiyar bibe û çavê xwe li cîhanê veke bê çawa hawîr wê keç û jin tev şiyar bûne û roj bi roj bi pêş ve diçin, tenê keça kurd hîna di xew de maye û dijmîn bi serbestî di nav bax û bîstanê welatê wê de dilîzin. Seyda dibêje:

Ey keça kurd rabe ser xwe

Tu çima bê rûmet î

Tu li dinyayê binêre

Kes nemaye raketî

Deşt û zozanê me pêk ve

Baxê û bîstanê me tev

Va ye dijmîn tê dilîzin

Jê tu maye derketî.⁽¹⁾

Di der barê xebata jinê de, Tîrêj ji keça kurd dixwaze ku milê xwe bide milê xortan û wek xwişk û bira bi hev re kar û xebatê bo rizgariya millet bikin. Li vir nêrîna Tîrêj hevbeş e bi nêrîna Seydayê Cegerxwîn re. Wî jî digot: “Şêr Şêr e çi jin e çi mêr e”. Ango jin bi tiştêkî xwe ne kêmkî mêr e; ew jî dikare here cengê û şerê dijmin bike, dibêje:

*Milê xwe bid milê xortan
Her wekî xwişk û bira
Tev bikin kar û xebatê
Hûn ji bo wî milletî
Şêr bi xwe şêr e keça kurd
Ger çi jin ger çi mêr⁽²⁾*

Seydayê Tîrêj keça kurd radajot ku xwe ji qeyd û zincîrên dîliyê rizgar bike, ta ku serbest û serfiraz bibe. Her didît ku kesên xwedî maf dê rojekê serbest bibin û yên zordest û şerxwaz dê bikevin. Lê serfirazî bê kar û xebat nayê. Îcar ji keça kurd dixwaze ku ew jî li kêleka xort şerê dijmin bike, dibêje:

*Bişkîn va qeyd û zincîra
Bib hevalek serketî
Wa li Îran û Îraqê
Ceng û halan û şer e
Xwîn dirêje wa ji canê
Xortên kurd yên bi hevketî
Her wekî Tîrêj dibêje
Serfirazî ya me ye*

Seydayê Tîrêj
keça kurd haydar
dike ku civak
bêyî wê pêş ve
naçe, ji wê
dixwaze ku xwe
berde nav civakê
û bi jîrî û
jêhatîbûniyê
têkeve rêxistin û
komeleyan;
wek hemû keçên
cîhanê bi barê
xwe rabe...

*Em xwedî maf in bizanin
Tê ku ayil tim ketî.⁽³⁾*

Bê guman jin nîviyê civatê ye û heta bêtirî nîvî ye jî. Ji ber ku îro roj ew jina xwendevan û xwedî kar û xebat bêtirî mêr dixebite û ji bo xuyakirina vê nerînê. Wekî mînak: Karê jinê yê ji derveyî malê, karûbarê hindir, xwedîkirina zarokan... Gelo mêr jî bi van karan radibe? Gelo ev karê ha ji kargêrkirina kompaniyekê yan fabrikeyekê ne girantir û diwartir e? Lê mixabin rêjeyeke pir mezin ji keç û jinên kurd nexwende ne û mirovên nexwende, nezan û paşketî dimînin. Îcar Seydayê Tîrêj keça kurd haydar dike ku civak bêyî wê pêş ve naçe. Ji wê dixwaze ku xwe berde nav civakê û bi jîrî û jêhatîbûniyê têkeve rêxistin û komeleyan wek hemû keçên cîhanê bi barê xwe rabe, dibêje:

*Destê xwe b'destê min de, bi tevayî wekhevî
Millet bi pêş ve naçî, bê komel û bê civat*

*Temaşekî tu îro, li cîhanê keça kurd
Tê bibîne gelek keç, tev zîrek û ebûqat⁽⁴⁾*

(.....)

*Keç û jinên cîhanê tev ketne berleman
Pêş ketin ew li her der bûn wezîr û payedar*



*Margirêt û Endêra bûn serekêd wezîra
Elîzabêt li London bû paşa û xwendekar⁽⁵⁾*

Ji ber ku keça kurd nexwende ye, bê nerîn jî ma ye, îcar di warê şûkirin û birrîna qelen de, Seydayê Tîrêj pirseke pir girîng destnîşan dike ku keça kurd mîna pez tê kirîn û firotin. Ta radeyekê ku di xwazgîniyan de keç tê bazar kirin. dibêje:

*Lê tu tenê keça kurd, di bezma keçfiroşan
Îro têtê firotin, wek dewara ber mezat⁽⁶⁾*

Dîsa di warê şûkirinê de, di rêya helbesteke çîrokî re, rewşa bûk û zavayê nuh berçav dike, bê çawa yê zava ji ber wî qelenê pir ketiye bin barê deynan, ta radeyekê mal û pez û xaniyê xwe li ser kir. Pişt re xaniyekî kirê dike. Ew xaniyê kirê jî xwestekên rûniştinê tê de peyda nabe. Hema baran çilo li derve dibare wilo jî tê hundir. Tev pûk û berf û serma zivistanê û rewşa aborî ya kirêt ku tê de derbas dibe, bêkarî, hejarî û perîşanî û hwd.

Seydayê Tîrêj vê rewşê bi nezanî û kêmhîşîya mîlet ve girê dide. Ku hîna xwe bi wan rêz û rêwazên kevn yên ku dem di ser wan re bihurîne, xwe pê girtine. dibêje:

*Ku mamoste lê nepirs qelen sed û çel hezar
Bi sê çekê bûkanî bi xelat û ber derî
Bi ber bisk û gerdenî bazin û cotek guhar
Hesabê mal û sûkê li hev derneket ez benî
Bi çil hezar wereqe paşê ez mame deyndar
Xwedîyê deyna her se'et yek dihat û yek diçû
Bi erzanî min firot xanî û pez û dewar*

*Xelk gihîştin ezmana bes em tenê man li xwar
Ji vî hişê me yî pûç tev kawik û nezan in
Gavek me pêş ve navêt bi deh gava man ji par
Bi quretiyê civata em xwe zana dibînin.⁽⁷⁾*

Seydayê Tîrêj pîrsa serperîştîya mêr jî berçav kiriye. Gava rewşa Keça Kurd di hundirê malê de dide xuyakirin, bê çawa xwe di cihê tarî de vedişêre û di bindestê bav û bira de jar û dîl û dîlşikestî diji, dibêje:

*Di quncên reş rûdinê bi jarî dîl şikestî
Dema ku tê ber derî dibên bavê te va hat*

*Bi lîrê û dîl bi tîrsê ew vedgerî cihê xwe
Tu dibê şermeke giran تنها bi ser wê de hat⁽⁸⁾*



Gora seydayê tîrêj

EY WELAT

Ey welat ez canfidayê deşt û zozanê te me
Canfidayê av û dehl û bax û bîstanê te me

Sûnd û peyman bî li ser min dê te parêz kim welat
Xwîna narîncî birêjim merdê pêwanê te me

Dest li ser darê tîfing im çog ji erdê nabirim
Pasîpan û leşkerê armanç û nîşanê te me

Can bisojim, dê bi pêt û agirê cenga welat
Agirê zerdeşte bî ez bi xwe perwanê te me

Bostekê ez ji te nadim bi welatê Hind û Çîn
Tu bihiştî mîlet e ez sûr û gerdanî te me

Dê bibirim ez bi sûr û xenceran, destê çepel
Hîmê bîntar û esasê bîrc û eywanê te me

(.....)

SEYDAYÊ TÎRÊJ

PÊ XWEŞ IM EZ

Cana ji evîna te, bi êş û nexweş im ez
Ger ku te nebînim timî bê fikr û hiş im ez
Wê pencerê carek veke reş perdê hilîne
Dil girtiyê dêmên dû gulî çavê reş im ez

Îro di evîna te da ola xwe me berda
Mizgeft û Kinişt pêk ve ji bo te min bi ser da
Va xirqe û bendik min li gerdan xwe vebestin
Wek sofîyê Zerdeşt ku li dergê Laleş im ez

Sawêr û kilîşên te li ber çavê'm şev û roj
Nêzîka te bihîşt e û dûra te bi min doj
Umîda min tu yî îro li dinyayê perîzad
Wek perwane herdem ku li dor mûma geş im ez

Ferhadê evîndar im belê bo min tu Şêrîn
Rengê Memê diljar im bi xwe îro tu wek Zîn
Maqnedê Xecê ye tu li Sîpanê Xelatê
Lê rengê Siyamend di şevên reş keleş im ez

Derwêş im li dinyê digirim wek har û dînan
Dermanekî peyda kim ji bo derd û birînan
Pêncî salen ji emrê me hemî beyhûde bûrin
Bûm kalê zemana wa bi gopal dimeşim ez

Sûndê dixwim ez dîsa bi wê soz û qerarê
Heta neweşin pelê min rê dûrî ji darê
Qet nabime bê hêvî ji wê geşta te cana
Xeşma te seza ye pa çiqasî pê xweş im ez

Ma soz be li min terka te ez nakim tu carî
Heya ku min bavêjine tirba reş û tarî
Ax û kedera TÎRÊJ ne bes tu li darê dinya
Heta mirinê dê xem û derdan bikêşim ez.

SEYDAYÊ TÎRÊJ
(*Dûwana XELAT*)

Bê guman civaka ku nîviyê wê pûç û paşketî be, neşet ku nîviyê din jî, tu gava ber bi pêşketinê ve bavêje, nemaze rewşa civaka kurd ku di bin darê zor û zordestiyê de dijî, Tîrêj ev rewş destnîşan kiriye û rizgariya welêt bi xebat û serbestiya jinê ve girêdaye, dibêje:

*Bes e rabe keça kurd bişkin tu qeyd û benda
Wekî Tîrêj dibêje dem û dewra te va hat⁽⁹⁾*

Seydayê Tîrêj ji dil û can, bîr û baweriya xwe bi pêwîstiya pakrewaniyê tanî, can û mal tev de ji bo rizgariya welêt erzan didît, keçên kurd diarihand ku wek Leyla û Besê canê xwe bikin gorî bo welat. Leylaya Pakrewan fikir nimûne, cihê serbilindî û şanaziyê ji bo mîletê kurd didît, dibêje:

*Tu xweş fexr e ji kurda re
Bi karwanê şehîda re
Dilê min tim bi hewar e
Ji rengê bilbila Leyla⁽¹⁰⁾*

Di der barê cihê dayikê de, gelek nivîser û helbestvanan bi hest û helwestên xwe nîrxê dayikê bi rengekî pir bilind û bedew wek ku li bejn û bala wê têt dane xuyakirin û gava em bîrên kûrahiya derûna jinê vekolin her em ê bipelînin ku arezûyeke bi hêz ber bi dayikayetiye ve li cem peyda dibe. Îca xerîza dayikayetiye li cem jinê her tişt e.

Seydayê Tîrêj di helbesta “Dayê” de pesnê dayikê dide; qencî, pakî, dîlovanî, nazî, zîzî, sozî, dilêşî, evînperwerî, barê perwerdeyî, guhdan û mîqatebûna wê berçav dike. Wê di malê de wek dibistana mezin dibîne, dibêje:

*Di nêv cerg û dil û can de te parastim erê dayê
Di pey neh meh û neh rojan te ez anîme dunyayê*

*Dema ku bûme şeş salî erê dayê dîlovanê
Bi xam û defter û çente te ez şandim dibistanê*

*Dem û dewra tu pê rabû ji bîr nakim meh û sala
Divê herkes bizanin ku dibistana mezin mala⁽¹¹⁾*

Dîsa, di rêya hevpeyvîneke helbestî navbera ciwanekî kor û dêya wî de, pesnê dîlovaniya dayikê û evînperweriya wê dide, ku çawa dayik bi hezkirina xwe ya berfireh hêviyê di dilê kurê xwe de diçîne ta ku bixwîne. Ji ber ku xwendin ronahî bi xwe ye, rast e kurê wê bê çav e, lê dil û can û hişê wî ne kor e, gelek mirovên kor; nivîser,

helbestvan, hunermend û mûzîksaz bi xwendin û viyan û wîsteke xurt xwe di warê karê xwe de li pêş xistin û gihîştin pisporî û bedewkariyê, dibêje:

Kor:

*Evî tiştê ku ti d'bejî bi min wek xewn û nîgaş e
Gelo rast e bibim carek yekî zana ji Kurda ra*

Dayê:

*Bixwîne tê wekî Taha bibî pispor û hozanek
Ji mîlet re bîderxînî dehê pertûk û dîwana*

Kor:

*Bi destê min bigir dayê berê min bid dibistanê
Bixwînim da nemînim ez hevalê pis û békara*

Dayê:

*Spas û aferim Cengo bi zana re bid û bistîn
Tu dê bighêje armancê tu namînî li şûnwarê⁽¹²⁾*

Seydayê Tîrêj keç û xortên kurd hay dike ku guh bidin zimanê dayikê û li folklor û toreya xwe bi xwedî derkevin, hebûna mîlet bi ziman ve girêdide, çinku ziman wînda bibe dê mîlet jî pê re wînda bibe. Her dibîne ku hemû mîletên cihanê bi çand û ziman û wêjeya xwe gihîştin rav û rêzaniyê û hebûna xwe parastine. Îca guhdan bi ziman tenê ne bes e, belê divê xwendin û zanebûn jî peyda bibe, ta ku bibin xwedî tac û darê serbestiyê bixin destên xwe, dibêje:

*Gelî kurdên bîrewer keç û xortên xwendewar
Ev zimanê mey şêrîn xuya ye tê ber bi xwar*

*Gelek şerm û fehêt e zimanê bav û kala
Em îro va dibînin ji hev dibî tar û mar*

*Mane û hebûna me zar û zimanê me ye
Ku ew herin namînin ji mer tu kok û bintar*

*Mîlet bi zimanê xwe pêktîni hebûna xwe
Di nav gelê cihanê navê wî têtê hejmar*

*Lê digel ziman divê xwendin û hem zanebûn
Bi kawikî nezanî nabe xwedî tac û dar⁽¹³⁾*

Seydayê Tîrêj, barê mafên jin û keçên kurd davêje ser mîlet û jê dixwaze ku bibe alîkar bo serbestî û pêşketina wan. Seyda bi bîrewerî nêzîkî vê babetê bûye, ku kêşeya mafê jinê bi zanîn û pêşketina civakê ve girê daye, dibêje:

*Gelî kurdên bîrewer mafên keç û jinên me
Tev ji me têtê xwestin ku em bibin alîkar*

*Ku destûrê bidin wan bi zanîn û pêşketin
Di rûpelê tarîxê da em nebin gunehbar⁽¹⁴⁾*

Dawî:

Di dema niha de, gava em lê dinihêrin û helwestên helbestvanê hêja Seydayê Tîrêj di derbarê babeta jinê de dişopînin, ew dem û çaxa ku Seyda bi xwe tê de dijiya û rewşa civakî ya ku jina kurd tê de jiyan dikir, hîna jî rûdêm û nîşaneyên wê di gelek movikên jiyanê de ta roja îroj diyar in. Digel ku di wê demê de nezanî û paşketin bi rengekî berfireh di civaka kurdî de belavbûyî bû lê tevgera siyasî ya kurdî li Sûriyeyê piştî salên 50'yî ji sedsala 20'an, dest bi karê rêxistinî kiribû û di salên 60'î de şoreş li başûrê Kurdistanê vêketibû û di destpêka salên 80'yî de têkoşîna çekdarî li bakurê Kurdistanê dest pê kiribû. Li kêleka tevgera siyasî tevgera wêjeyî jî xebata xwe gur kiribû. Hema Seydayê Cegerxwîn roleke pir mezin û çalak û bedew -ku nayê pesindan- di der barê hişyariya millet de list û bandora nêrîn û helwestên Cegerxwîn ên helbestiyane ne tenê li Tîrêj bûbû. Li hemû helbestvanên hemdema wî û yên di pey re bûbû. Wek Bêbihar û Keleş û hwd. Di

çarçoveya vê bandorê de Seydayê Tîrêj di helbesteke xwe de tîne ziman û vê dibêje:

*Em jî bi serfirazî bijîn di vê cihanê
Ji welatê me pê ve jî mer nîn e deverê*

*Tîrêj çi qûte qûte barê millet giran e
Haş xwek tu d'bin venebî dîno bela xwe jê
vek*

*Ka seydayê Cegerxwîn xwedyê dahola mezin
Gerden li wî ziwa bû feqîro yê te dirbek⁽¹⁵⁾*

Îcar ev rewşa ha bi tevayî çavê milletê kurd li ser gelek tiştan vekir û hişyariya netewî bi berfirehî belav bû. Yek ji wan tiştan, hişyarî bi pêdiviya xwendinê û derbasbûna keçên kurd di nav rêxistinên siyasî de bû. Hema bi dehan keçên xebatkar berê xwe dan çiyayê Kurdistanê ta ku li kêleka mêr têkoşinê bidin û bixebitin. Îro roj bi sedan keç û jinên kurd xwendevan in û weke mêr diçin karê derveyî malê jî dikin.

mbadili3@hotmail.com

Jêderên lêkolînê:

- 1- Xelat, diwana yekem, ji malpera www.tirêj.info
- 2- Zozan, diwana duyem, ji malpera www.tirêj.info
- 3- Cûdî, diwana sêyem, ji malpera www.tirêj.info

Têbînî:

- ⁽¹⁾ Helbesta "Ey Keça Kurd", diwana Xelat, ji Malpera Tîrêj.info
- ⁽²⁾ Helbesta "Ey Keça Kurd", diwana Xelat, ji Malpera Tîrêj.info
- ⁽³⁾ Helbesta "Ey Keça Kurd", diwana Xelat, ji Malpera Tîrêj.info
- ⁽⁴⁾ Helbesta: Kurdistan, diwana Xelat, ji Malpera Tîrêj.info
- ⁽⁵⁾ Helbesta "Derdê Siyamed", diwana Zozan, ji Malpera Tîrêj.info
- ⁽⁶⁾ Helbesta "Kurdistan", diwana Xelat, ji Malpera Tîrêj.info
- ⁽⁷⁾ Helbesta "Derdê Siyamed", diwana Zozan, ji Malpera Tîrêj.info
- ⁽⁸⁾ Helbesta "Kurdistan", diwana Xelat, ji Malpera Tîrêj.info
- ⁽⁹⁾ Helbesta "Kurdistan", diwana Xelat, ji Malpera Tîrêj.info
- ⁽¹⁰⁾ Helbesta "Şîna Leyla Qasim", diwana Xelat, ji Malpera Tîrêj.info
- ⁽¹¹⁾ Helbesta "Dayê", diwana Zozan, ji Malpera Tîrêj.info
- ⁽¹²⁾ Helbesta "Kor û Diya Xwe", diwana Cûdî, ji Tîrêj.info
- ⁽¹³⁾ Helbesta "Ziman", diwana Zozan, Tîrêj.info
- ⁽¹⁴⁾ Helbesta "Derdê Siyamed, diwana Zozan, Tîrêj.info
- ⁽¹⁵⁾ Helbesta "Bibin Yek, diwana Cûdî, tirêj.info

Çîroka Tava Xewnşikestiyân

Ey siwarê peyvê
Min bide ber tava gotinên xwe
Da ku bayê girînas ên gulşevên min wekî xewnên gulberojkên
dîlşahîk bikaribe li ber siya lehengên bênav çîroka
xewnşikestiyân bihûne.
Da ku payîzokên şevqên min mîna wan dilperitiyên bêçare li ber
dîwana xemrevînan çok vedin.

Ey dildarê baranê
Min bide ber tava hezkirina xwe
Da ku maçên dilnas ên hezkiriyên min wekî wan murîdên
jixweveçûyî bidin pey şopa hev û xwe di nav konê evîna hev de
herdem av bidin.
Da ku awirên gulçemoka dilbihar bêriya behra hezkirinê bike.

Ey çemê xweşmêran
Min bide ber tava xuşexuşa xwe
Da ku sîsaliya min di bîra xwezîsaliyan de neçe çem û çem.
Da ku kewara vî hişî li beyarên korezanan nebe lem û lem

Ey stêrkên xuricî
Min bide ber tava gundên şewitî
Da ku bejna rihê min wekî stûxwariya kopalekî fêrî avjeniya kul
û kederê bibe.
Da ku bajarê tenetîya min nola bêhnfirahiya Newala Qesaban
fêrî destana serbilindiyê bibe.

Ey girîna bêmiraz
Min bide ber tava jarejara xwe
Da ku kena min ya virnî li ber sebra lorîna te bimeye.
Da ku tîqetîqa zarokatiya min dîsa serê xwe hilde.

Ey yara dilbijok
Min bide ber tava tililiyên xwe
Da ku pirpiroka dilê min wekî wan dengbêjen dîlşêrînok fêrî
meşa xwenasiyê bibe.
Da ku çiyayê ciwantiya min xwe ji nû ve şîn bike.

C(j)ana Min

Min awirên xwe di çavên te de ji bîr kir
Ramûsanek ji li ser lêvên te...

Tê kengî were?
Şevên tirsonek ji nav porê evîndaran derxe
Porê xwe yê xelek li ser sînga min raxe
Ji awirên xwe yên fediyok re
Di çavên min de hêlînekê çêke
Û
Di şevên li bendemayînê de
Bibe kirasê bûkaniya xewnên min
Bibe ekla helbestan
Di nav xwêdana pênuşa min,
Bibe bişirînek wek pinpinîkekê
Li nav bihara emrê min,
Bibe stranek
Û
Her tim biwelide li ser zimanê min,
Bihuştî min!
Ma tê kengî were?
Bê pirs û bê tirs
Diqetin têlên ûda min
Diçire çermê defa min
Dengê bêdengiyê min kerr dike
Bêdengiyê ku
Çavan stewr
Brînan der
Bîranînan merr dike
Û wek kundekî dixwîne li ser min
Ma tê kengî were?
Di ber sekeratê de ne çavên min
Ji hesreta kêliyeke bi dîtina çavên te,
Bûm seydvane stêrkan
Bi her du çavên rijiyayî
Ji bo xemla porê te
Ma tê kengî were Cana min
Bo ku nebî Jana min.
Ma tê kengî were?
Ma tê kengî...
Ma tê...
Ma...

Şêrko

Şevrûyam

Ez bûm şevnişin ji ber leyl û neharbûna rûyê te..
li ber xeyala rûyê te... ma meyfiroşîya te wisa bû..
Li ber çavêt min hezaran şekl û rengên rûyê te... bi şiklek nepenî li şeklê rûyê
te yê li ser dilê min..
Cana, îşq û muhabeta te çend sivik e ku bi yek dîtîne dil têr diket.. bi yek
qetre û dilop dil tîjî diket û di dil de îşq difûre û dibe lêser û lehî.. mewc û pêl
radibin.. ez li ber xeyala rûyê te yê wek seneman... rûyê te yê wek senem û
yasemenan..
Ax cana, ax dila... ax heyîva şeva... heyîna şeva...

Her kesê carek diye ew zinde ma heta ebed
Wê nedîtî ew perîr û zindegî lê bit heram

Herkes bi yek deryayê dibe melevan lê ez bi yek dilopa evîna te bûm medxoş û
meyxoş û serxoş..
Tu maneya jiyana min bûyî û rûyê te yê leyl û nehar şerha jîyanê bû. Şerha
jiyana min. şerha birîna min û bi şerha şerha..
Ronahiya rojê û tariya şevê bû rûyê te.. rûyê te yê kurdewar û reş-esmer, ebrû
û çavên te yên reş-belek... serê zulfa te ya kemenda dilê giriftar..
Danişin û şevnişina min ya bêyî to û li gel rûyê to... firmêzkekanim hêdî hêdî ji
çavekanim dirêjinewe û tîkel şerab û meya min dibinewe...

Leyletu l-qedr û berat in zulf û cebhet şubhê 'îd
Dêm weko fesla biharê lê qiyamet qed û qam

Rûyê te wek seneman..
Rûyê te wek şevneman..
navbera her du çêşmên te mîhraba dil..
Mîhraba ku dil xirab kirî... îşqxane û putxane li min wêran bûn. Ji dil herikî
xwîn û mey... yarem ber xet û xaleş her dem abid û nişin bûm ax demsal û
fesla îmanê çiqas kêr bû... êrîşa çavên te yên kafir çî dijwar û dilsoj bû ku dil
bû şehîdê kербelâyî...

Zulfên te lam bi lam li ser rûyê te yê gulgun..
Ma tu ne zalim î ez bûme bende û abid li ber husna te..
Ji gulşena te ji gulîstana te gulek bes e bo min..
Heta kengî wek bilbil bikim nalîn û fixan..
Heta kengî wek goyîne bikalim..
Ka ez çî kes im
Çî dibêjim..?

Ev çî sergerdanî ye
Ev çî sergirêdanî ye.
Sermestî û mestî ye..

Perde dirandin min..
Ez çî me cama ji dest te dinoşim bi hinoş
Ji hicra te dil bûye pêt û agir..

Ez kî me cama ji dest te dinoşim binoşî?
Her kesê camê ji destê wê binoşit noşî bit
Ê ji wî destî nenoşî zehrî bit lê ew medam
Cana! Cama ji dest te dinoşim bêhoşî...

Pûşper/Wan

Ayhan GEVERÎ

Sîpan XIZAN

Koda Darîn

Şivanê pezan bilûrvanî tu
Dema lêdixî ewê bilûrê
Dora te dicvin ewan pezên te
Yek ji wan pezan xwezî bibam ez
 Şivanê hêja xwedan bilûrî
 Pez dibe ser xwey dengê bilûrê
 Bi ax û zar e ji bo wan dangan
 Yek ji wan pezan xwezî bibam ez
Dema pezên xwe dibin delavê
Dengê bilûrê vedixwe avê
Wan didî mexel ber çûna tavê
Yek ji wan pezan xwezî bibam ez
 Dema pezên xwe dibî şevînê
 Ber tava hîvê dengê bilûrê
 Rengê dermanên li ser birînê
 Li ber wî dengî birîndar bam ez
Li ber wan pezan bilûrvanî tu
Li dengê bilûr guhdar e her ew
Dûr û nêz be jî her evîndar e
Xwezî digel wan evîndar bam ez
 Heval şivano emirdirêj bî
 Şivaniya xwe bi bilûrvanî
 Kulaf û heban û koda darîn
 Xwezî vexwara şîr li wê kodê
Xweş şivanî tu bilûrvanî tû
Bêrivanî hatin bo bêriya xwe
Xemdarya bilûr şîr dotin erdê
Girt bam serên pez bo bêrivanan
 Hevalê şivan pez bir şevînê
 Xwe daye hestê digel pezên xwe
 Her li seherê bilûr dinale
 Xwezî razama ber nalinê ez
Bilûra şivan ji darên şimşîr
Herî dinale li ber delavan
Pez guhdarên wî gav û seravan
Yek ji wan pezan xwezî bibam ez
 Heval şivano xweş bilûrvano
 Pezên xwe çêrand li payîzxêrê
 Te pez hewandî li bin konên reş
 Li bin wê konê nobedar bam ez
Ax lo şivano te dil helandî
Bi dengên bilûr xeman revandî
Xemrevîn î tu bo bêrivanan
Dirba bêriyê rêheval bam ez
 Bo bêrivanan zehmetkêş bam ez
 Pez bida bîrî ber dengên bilûr
 Vexwara min şîr bi koda darîn
 Bibam paş-şivan li şevînê ez
Bi şev û rojan bibam rêheval
Bo dengên bilûr bibam suxe ez
Bo wê hebanê bibam zebal ez
Xwezî paş-şivan bibana Sîpan.

10 Adar 2005

Zagona Zikmakî

Şengul OĞUR

Belav ke, libên tizbiyên ku
tîm li te bûn bela
ji sed û yek bavê tirsê bêminet be
veke, devê birînên xwe yên bi dirî
bi derba tîfinga kurmancî
berde, tîpên berî yek bi yek
ji lûleya dirêj: biranînên zingarî, bêtirs
bizingîne zinaran bi zimanê zemanê zexm
bi zagona zikmakî

Du Peşk

Dilxwaz HERDEM

*

Li pey te
berfeke pir spî barî
Paşê jî sê tişt ketin li ser berfê
Gulek,
xencerek
û dilopek xwîn.

**

Evînen koçber
konên xwe vedidin
li ber peravên dilê min
Dem, sibeh e,
Pêl, giran in
Û ba winda.

Xangul OZBEY

Bi Xatirê Te

Çûm,
Min ev bajarê qirase
Bi tevî şevên bê sihûd
û rojên dilşadî
Bi tevahî hişt ji te re

Di çavên te de wenda bûn
Awirên min ên ku tê de
Axîniyên bişirînî hebûn
û mabûn bê wate.

Aniha, di dilê te de vedişêrim,
yên ku li vir in
û yên ku wê herin

Di derketina rojê de
Ez ê li şefeqa bajarekî din bim
Vê sibê di şibakeya xwe de binhêr
Tu yê bibînî min.

Tu yê bibînî,
Li nav kulîlkên ku
Li ser pêpelûkên
ber deriyê dilê te
Sêwî mane li dû bişirîna
li ser lêvên me

Min bi hêstirên çavên xwe şûşt
Kolanên wî bajarê kambax
Ku nehişt em bikenin
Têra dilê xwe

Ji sibeha bajarekî din
Bi zimanê dayikê
Û bi rûkeniya xemgîn
A zarokên welatê xwe
Ji niha de bêjim,
bi xatirê te...

19:15 / 01.08.2007

Azad RONAKBAR

Em Biçirisin Hevalno!

Ji Orhan Dogan re

Çirayeke me ya din ji kêr bû
Em biçirisin hevalno

Ronahiya te her hebe Orhan Dogan
Soza me ji te re wê ronahiya te her hebe

Çirayeke me ya din ji kêr bû
Em biçirisin hevalno

Ronahiya te ma bi me re
Çirûskên çavên te yên ku şewqa ronahiya dil û hişê te didan der
Man ji me re

Çirayeke me ya din ji kêr bû
Em biçirisin hevalno

Em çiqas biçirisin têrî nake

EM

BI-

ŞE-

WI-

TIN

HEVALNOO!

29 Hezîran 2007

Şano (Teatro)

— *Ayhan MERETOWAR* —

RAVEYA ŞANOYÊ

Ji berhema ser dikê, ji hunera listina berhemên ser dikê, ji çiyê listina berhemên ser dikê û ji çêşnên edebî yên mîna dram, komedî û trajediyê ku bi mebesta listina ser dikê hatine/têne nivîsandin re tiyatroyê gotin.

ŞANO Û JIYAN

Taybetiyeke xweser a vî şaxê edebî heye. Di nav çêşnên edebî de şaxê herî zêde nêzî jiyane şano ye.

ŞANO Û ÇÊŞNÊN DIN ÊN EDEBÎ

Şano, ji cureyên din ên edebî cihêtir e. Gelek cureyên hunerî tîn cem hev û çêşnê şanoyê pê çê dibe. Wêne, muzik, govend (dans), aktorî û ronî..

Taybetmendiyêke balkêş a şanoyê jî ew e ku hemû çêşnên edebî, jî bo xwendin an jî guhdarîkirinê tîn nivîsandin; lê belê tenê çêşnê şanoyê, jî bo temaşekirinê ye.

Bela ku şano li ser du hêmanên bingeîn, hêmana “dîtîne” û hêmana “bihîstîne” hatiye damezîrandin, bûye xwedî girîngiyeke zaf mezin. Digel vî awayî “peyv” û “helwest/tevger” hev û din temam dikin.

TÊKILIYA ŞANOYÊ BI EDEBIYATÊ RE

Aliyê “mijar” a şanoyê, bi edebiyatê re eleqedar e. Ev mijar jî, li ser bingeha bûyer an jî rêzêbûyeran tê ser dikê.

Bûyerên şanoyê, dibe ku jî berê ve nivîsandî bin û dibe ku hema li ser dikê, wextê listîne, hema li gor dilê listîkvanan, ne nivîskî; lê belê “devkî” be jî. Ji vî navê şanoyê re, di serdema osmaniyan de, “Tulûat” jî hatiye gotin.

HÊMANÊN ŞANOYÊ

Mîna hemû çêşnên edebî, şano jî, li ser “bûyer”ê ava bûye. Di bûyera şanoyê de jî,



hêmanên mîna mijar, kes (leheng), derdor, dem, şewaz û armanc hene.

ARMANCA ŞANOYÊ

Şano, dikare bûyer, dekor û kesan, mîna jiyana rastîn li ber çavê me raxe. Ew mesele ye tê gotin ku ev çêşnê ha, dikare jî hemû cureyên hunera bedew sûdeyê werbigire. Bi xêra vî awayî jî di nav civakê de “yekîtiya giyanî” dikare pêk bîne.

Gava şano berê xwe dide rastiyên civakî, jî xwe re armanceke sereke diyar dike. Xwedî li nîrx û hêjahiyên civakî derdikeve, berevaniya wan dike. Digel vî yekê, tevî şadkirina temaşevanên xwe, ew wan fêrî hin rastiyan jî dike. Ji ber vî aliyê şanoyê, wisa bi hêsayî berhemên şanoyê nikarin bêne hilberîn, heke bêne hilberîn jî, wisa bi rihetî çiyê xwe di nav berhemên mezin ên cihanê de nikarin bigirin.

D Î R O K A / M Ê J Ū Y A Ş A N O Y Ê

Çêşnê şanoyê, jî çêşnên din ên edebî yên mîna roman û hikayeyê, kevintir e. Heta di pirtûkên dersên edebiyatê de tê nivîsandin ku eve serê du hezar salan e ku Şanoya Rojava heye.

Şano, bi hebûna mirovan re derketiye holê. Li gor baweriya roja me, terîma “tiyatroyê”, jî peyvika yunanî ya “theatron”ê derketiye. Destpêka tiyatroyê, jî Yunana Entîke (Kevn) ve ye. Wê hingê hin ayinên olî li ser xwedawendê bi navê Dionysos (Diyanizos) hatine kirin. Ev tore bi derbasbûna demê re ketiye delavê “kostuman”, koro, helbest û dansan. Pey re jî diyalog ketine van ayinan. Pê re jî listîkavanan rol girtiye.

Digel van baweriyên dibe ku li herêma Mezopotmayayê jî bingeha şanoyê hatibe danîn. Wek pîrozkirina sersalê û hin listîkên ku di dawetan de, di nav van gelên vî derê de tîne listin.

ŞANO Û BIZAVÊN EDEBÎ

Serdema Navîn, li Ewropayê, pêkutiya Dêrê, kir ku gel, heta çendakî dirêj, ji zanîn û zanistiyê mehrûm bimînin. Mirovên vê serdemê ku ji ber zordestiya Dêran nikaribûn bifikiriyana û rexne bikirina, ji aliyê “raman”ê ve, şemiribûn. Heta ku nêzî sedsala 15’an, li Îtalyayê, hin rewşenbîr, hunermend û zanayan, dest pê kirin, berhemên felsefe û edebiyata latînî xwendin. Bi vî awayî ew, li ser mijar, kes, bûyer û civakê, bi awayekî azad fikirin. Çanda rexnekirinê derket holê. Bere bere asoya wan a ramanî fireh bû. Keşif û îcad çêbûn. Rêyên nû yên bazirganiyê hatin dîtin. Ku çapxane hat dîtin, êdî ramanên nû, bi rihetî li derdoran belav bûn.

Tevgerê ku li ser bingeha hezkirin û hurmetpêdana mirovan ava bû, li nav zana, hunermend û rewşenbîran belav bû. Navê vê tevgerê jî danîn Humanizma.

Peyre Edebiyata Ronesansê serî da. Her ku zeman pê ket, qîmeta mirovan hat bilindkirin. Li hember dîtin û ramanên ku mirov biçûk diditin, helwesteke dijber çêbû. Cara pêşîn, di cureyê komedyayê de, Ben Jonson (1573-1637) û Wiliam Shakespeare (1564-1616) berhem dan.

Bi vî awayî piştî çend nivîskarên cureyê Trajedyê yên navdar Aiskhylos (Ayklos) Beriya Zayinê sedsala 6’an, Sophokles (Sofokles) Beriya Zayinê sedsala 5’an, Euripides (Oripides) Beriya Zayinê sedsala 5’an, Ennius (Beriya Zayinê sedsala 3’yan, ji nû ve şano ketiye jiyana mirovahiyê.

Pey re li ser bingeha bizava Klasîzmê, Pierre Corneille (1606-1684), Jean Racine (1635-1699) û Moliér (1622-1673) berhemên şanoyê dan.

Heta ku Victor Hugo (1802-1885), bi navê Cromwell listikekê dinivîsîne û di pêşgotina wê de, taybetmendiyên bizava Romantîzmê diyar dike, bayê vê bizavê bi lez û bez li Ewropayê belav dibe. Heta tê digihîje edîbên Rûs û Rojhilatî.

DÎROKA ŞANOYA KURD

Ne lêkolerên biyanî (Ewropî, Rûsî û yên din ên cihanê) ne jî lêkolerên kurd ên ku li dîroka şanoyê digerin, heta niha, - bi qasî ku em pê dizanin - li ser dîroka şanoya gelê kurd,

tiştêkî zanistî yê ku ji şanoya kurd a hemdem re bibe binge, dîtine û rayî me dane.

Li ser berhemên kevneşopî yên gelê me, zanîn û belgeyên berbiçav tune ne li ber destê me. Gelo berî qebûlkirina ola Îslamê, me çî kevneşopî, erf û edetên çandî hebûn, hê baş nehatine dîtin. Mîna gelên cihanê me çî cureyên şanoyê hebûne, dibe ku derbikevin holê.

Heke ev pirs bête bersivandin, dibe ku “Şanoya Kevneşopî Ya Kurdan” jî derbikeve holê. Êdî wê hingê Şanoya Geli ya Kevneşopî, Şanoya Kevneşopî ya Gundan e, dê xweş cihê bibe ji hev. Bela ku ev listik li gundan tene listin, dibe ku berhemên gundiyan bin. Wehakî, dê dîroka şanoya me jî derkeve pêşberî me.

Digel van tarîtiyan, bi takekesî, em weke hilberinên pêşî yên şanoya kurd, bi navê van listikan dizanin:

Sersal, Lêpok, Dengbêjî, Bûka Baranê, Giskê Ezepan, Bêcgirtina Şeva Yekcîkirina Bûk û Zava.

Ev cure şanoyên kurdî, mîna kevneşopiya şanoyên devkî yên gelên cihanê, hemû “devkî” ne.

Ev cure şanoyên me yên devkî, serê çendik û çend sedsalî ne ku di nav gelê me de hatine listin, hêjayî mereqê ye.

ŞANOYA GELÊRÎ Û REWIŞTA WÊ

Em dê bi çî awayî şanoya xwe ya gel, tevî tevger, listikvan, awayê listikê û gotinên listikê derxin ber ronikahiya dikê?

Gelên cihanê, ji şanoya xwe ya netewî ya hemdem re, ev şanoyên gel, weke binge girt û şanoya xwe li serê dan avakirin. Ciyê xebînetê ye ku hîna me ciyekî baş û hêja nedaye şanoya xwe ya devkî/gelêrî.

Şanoya gelê tirk, piştî Serdema Tenzîmatê, cara pêşî, li bajarê Stenbolê, sala 1869’an, ji aliyê Gullu Agop – ev şanoger bi eslê xwe ji gelê ermen e – hatiye damezrandin. Pey re, ji şanoyên Ewropî, werger hatine kirin û ser û ber li şanoya hemdem û gelêrî ya gelê tirk hatiye vekirin. Bi deteka îmkânên dewletê jî, şanoya gelê tirk, îro bi rihetî, serî bi şanoyên cihanê re derdixe.

DI MÊJÛYA ŞANOYÊ DE REWŞA DEVKÎ, NIVÎSKÎ Û PRATÎKÎ

Şanoya gelê kurd, ji ber ku di nav gel de hepskirî ma, qels ket. Piştî ku navgînên modern ên piştaftinê jî ketin nava gel, êdî mîna aliyên din ên çandî, şanoya me jî, lawaz bû û xêr tê de nema. Heta ku Navenda Çanda Mezopotamya venebû, tew witînî pê neket.

Şanoya Seyrî Mesel, wê salê li ser şanoya gundane, listikeke pir balkêş û xweş derxist hemberî temaşevanên kurd. Wer dixuyê ku dê, şanoya hemdem a ku bi Evdirehman Rehmiyê Hekarî, dest pê kir, bigihîje rewîştaya xwe ya netewî.

Em dikarin ji du aliyên ve li mêjûya şanoya me binihêrin. Yek jê, aliyê devkî yê şanoya kurdî ye; aliyê din jî, hêla nivîskî ya şanoya kurdî ye.

Şanoya kurdî ya devkî, pir zêde kevn e. Dibe ku destpêka wê bigihîje bi hezaran salan.

Şanoya kurdî ya nivîskî, xwedî tarîxeke baş e. Bi ser berhema pêşî ya şanoya kurdî re, nêzî not salî derbas bûye.

Îcar ji xeynî van her du rûyên şanoya kurdî, rûyekî din ê girîng heye: Ji aliyê listikvan, kom û xebatkarên şanoyê ve mêjûya şanoya kurdî...

ŞANOYA KURDÎ YA DEVKÎ

Halê şanoya me ya devkî jî, ne baş e. Şanoyên devkî yên gelan, - weke şanoyên gelê pontos, gelê girek, gelê tirk û gelê çin - bi awayekî pîsporî, ji aliyê şanogerên pîspor ve, bi awayekî rêkûpêkî hatine jiyandin. Mixabin şanoya me ya devkî ku Xwedê dizane çi qas qedîm e, ji aliyê şanogerên pîspor ve, bi awayekî rêkûpêkî, li nav gel nehatiye - heke hebe jî, me jê hay nîn e - listin û berfirehkirin.

Dewlemendiyê me ya mezin di hêla Şanoya Gelêrî de heye. Bo ev dewlemendiyê me wenda nebe, berevajiyê vê, hê çêtir bixemile, divê em dest bidine destê wan kesên ku hewlkarên vê hêlê ne. Gelo hîç dibe ku ev gel destekê nede wan şanogerên xwe yên netewî?

Ev şanoya ha jî, xweserî gelê me ye. Kal û Pîra Sersalê - li nav dimiliyan ev nav heye -, li her hêlên welatê me heye. Tenê Xwedê dizane bê ka gelo eve serê çendik û çend sedsalan e ku ev kevneşopî jiyaye li nava vî gelî.

Di bingeha xwe de teatr, ji deng, derbirîna rû (mimîk) û tevgerên wicûdê, (jest, makyaj, serpûş-maske, kostum...) û şîran diyalogan, axaftinan (metn- tekst) pêk tê. Digel van hêmanan çîrokek an efsaneyek (mijar, bûyer) jî tê vegotin. Ev jî di nava çarçoveyekê de (dik, dekor, ronahî) têne berepêşkirin. Ev yek jî, bi xêra kesan (aktor) li hemberî temaşevanên tê pêşkêşkirin. Ev metn/tekst, dibe ku nivîskî be an devkî be. Bi muheweriyê, monologê an koroyê jî be, dikare bête honandin. Dibe ku li ber roniya lembeyên sahneyê be an jî dibe ku li ber roniya rojê be. Dibe ku li ser dikeke taybetî ya şanoyê be jî, dibe ku li manaşekê/qadekê be, an li meydanekekê be. Ha di vê çarçoveyê de me gelê kurd jî şanoyeke niştecîh/xwecîhî heye. Ev jî Lîstika Sersalê û listikên din ên gelêrî ne.

Çiqas hêmanên teatê hene gişt di vê Lîstika Sersalê de hene. Aktor, temaşevan, ciyê listikê, kostum, dekor û aksesuwar, mijar û metn. Ji ber ku gotinên vê listikê li her aliyên welêt bi heman awayî hene, zêde zêde heyf e ku ev şanoya gelêrî wiha di nava gel de sînorkirî maye. Neketîye wesfê şanoya edebî.

Hêla hunerî û çandî ya vê şanoya gelêrî, bingeha xwe ji jiyana gundane digire. Jixwe her kes jî dizane ku jiyana civakî, serê pêşî li van cîgehên hatiye pê. Ev bela ye ku em dikarin rewşa sosyolojiya gelê xwe, çêja wî ya hunerî, edebiyata gelê xwe, qerf û mîzaha gelê xwe, ku ji kûrahiya bi sedan salan tê, di vî çêsnê listikê de bibînin.

Mixabin digel van hêmanên girîng şanoya me ya gundane, bi peyveke din Şanoya Kurd a Gelêrî, li ber windabûnê ye. Wisa hêşîr, wisa bêdeng wîna dibe, ji nav civaka me dibire/dicire ku, tew me hay jê nîn e.

Ev çêsnê şanoyê, nola çêsnê TULÛATê ye. Listikvan, ku dest bi listika xwe dikan, hema çawa lê tê, wisa dikevine diyalogan. Bela ku me çandê nivîskî tunebûye di vê hêlê de, yekî/yekê aqil nekiriye ku metnekî xweş bihêle ji me re. Nemaze nivîskaran jî heta niha, dest nebirine xwe da li gorî hoy û mercên civaka serdema xwe metnên nû hilberînin. Tevger, cil û bergên listikvanan, bi awayekî rêkûpêkî neketine destê me.

Çawa ku tê zanîn, şanoya yekesiyane, li cîhanê ciyekî girîng digire. Me jî ev yek li ber çavan girt û em dirêjî kevneşopîya

“dengbêjiyê” bûn. Bi awayekî rasterast min berê xwe da çirokbêj û dengbêjan.

Gelê kurd, ev listikên xwe yên devkî, dibe ku hîna beriya serdema şaristaniya Îslamê hilebera be. Di nav vî hezar salê ku çanda Îslamê ketiye jiyana civaka kurd de, bê guman motifên olî yên Îslamî jî ketine nava van listikên civaka me ya gundî.

Çawan ku tê zanîn, ji bo zarokan, tiştê herî muhîm û ciddî, listik bi xwe ye. Li her aliyê welat, her herêm li gor rewîştê xwe, bi awayekî ji awayan Listika mezinan...

ŞANOYA KURDÎ YA NIVÎSKÎ

Şanoya me ya metnî, bi Memê Alan ku ji aliyê Evdîrehman Rehmiyê Hekarî dest pê dike. (sala 1919)

Piştî Evdîrehman Rehmiyê Hekarî, Celadet Bedîrxan, listikeke bi navê “Hevînd” dinivîsîne.

Di pey Celadet re, Mûsa Anter, bi listika xwe ya “Bîrîna Reş” berdewamî dide şanoya kurdî ya kurmançî.

Berhema ku di pey Bîrîna reş de hatiye nivîsandin, “Kula Dêrsimê” ye ku ji aliyê Felat Dilgeş ve hatiye hilberîn.

Piştî Felat Dilgeş, îca Kemal Orgun jî, berhema xwe ya bi navê “Provayên Bidarvexistinê” dide.

Rênas Jîyan jî, bi berhemeke xwe tev li nivîskarên şanoya kurmançî bû.

ŞANOYA KURDÎ YA PRATÎKÎ

Koma bi navê Teatra Jiyana Nû, cara pêşî – bi amatori be jî – digel listikvanan, sala 1991an, li bajarê Stenbolê, dest bi xebata pratîkî ya şanoya kurdî kiriye. Listikên şanoya kurdî, bi vî koma xebatê derketiye ser dikê. Heta niha – heta sala 2007an – bi qasî 40 listik derxistine hemberî temaşevanan.

Wekî din, komên bi navê Avesta û Seyrî Mesel jî hîna dixebitin.

Şanoya Devkî ya Gelên Cihanê û Şanoya Kurdî

Bi ditina min, şanoya gel a kevneşopî ya gelên cihanê, pir di dirûvê hev û din de ye. Şanoya gel a Yunana Entîke, şanoya gel a kavneşopiya Pontusan û şanoya gel a kevneşopiya gelên Mezopotamyayê, digihîjin hev.

Gelê girekî, hatine heta Kurdistanê. Gelê Pontosê, jixwe cîranê gelê kurd e.

Listika “Sersal”ê ku li nav kurdên kurmanç û kurdên dimilî tê listin, bi awayekî pir nêzî “Sernewe”ya dimilîyan, li hêla Giresûn, Trebzon, Gumuşhane, Bayburt û Şebinkarahisarê, bi navê horon û “Momoyeros” hatiye listin.

Çawa ku her neteweyek digel hilberînên xwe yên devkî yên edebî hene, neteweya me jî, digel ku hatiye ditin û tê ditin, hilberînên xwe yên devkî yên edebî, di hêla şanoyê de jî hene. Heke li her hêlên welêt, çawa ku gelên din ên cîran û ne cîran li van mîrateyên xwe geriyane, ditine, qeyd kirine, lê xwedî derketine û li gor heyama xwe nûjen kirine, em jî li van berhemên xwe yên devkî (gelî) bigerin, em dê bibînin bê çendîn dewlemend û hêja ne. Em ê jî piçek “xwê” jî kana rengê vî hunera neteweya xwe, bixîne nav şorbeya hunera mirovahiyê.

Aliyekî balkêş ê vî hêla ha, bi “muzîkê” re, bi newayê re gotina van ristan e. Gelo ne hêjayî pîrskirinê ye ku ka gelo ev yek nakeve binê banê “Tiyatroya Bimuzîkê” ya şanoya cihanê ku ew jî çeşnekî Tiyatroya Dramî ye.

Gelên cihanê, li diroka “listokên xwe yên temaşeyî” geriyane, tiştên ditine weke bingeş girtine jî şanoya xwe ya neteweyî re.

Bo nimûne gelê Japon, xwedî dramên lîrîkî yên bi navê NO; gelê Çîn, xwedî listikên Siyî û Kuklayî; gelê Hind, xwedî “zimanê figuratîf ê wicûdê; gelê tirk jî xwediyê listoka bi navê Medahê” ye.

Têbînî:

¹ ONER Sakin, Turk Dili ve Edebiyatı 1, 2001, İstanbul

² BEZİRCİ Asim ve GOKER Nalan, Turk Dili ve Edebiyatı 3, Weşanên Gendaş, 1993 İstanbul

³ Çawan ku tê zanîn, berhemên pêşî yên şanoya gelê turk jî şanoyên devkî ne. Navên wan ku Orta Oyunu, Golge Oyunu (Karagoz) û Meddah e, tîkiliya xwe bi şanoyên devkî yên gelên din ên cihanê re jî hene. Ji bo minakê, şanoya Karagoz ku listikeke siyî ye, li aliyê Çînê jî tê listin. Wekî din di vî listika Karagoz de, lehengên listikê yên ku li ser navê etnikên osmanî û nûnerên hin herêman cî digirin hene. Frenk, Zenne, Yahûdî, Ermenî, Kurd, Rûm, Erebb, Ecem û Ernavut, navê çend lehenegên vî listikê ne.

⁴ ANTER Musa, Bîrîna Reş, Weşanên Koral, Stenbol, 1965

⁵ DILGEŞ Felat, Kula Dêrsimê, Weşanên Koral, Stenbol 1992

⁶ ORGUN Kemal, Weşanên Çima, Stenbol 2000

⁷ Rojnameya Azadiya Welat, hejmar: 273

⁸ SAMULIDIS Hristos, Geleneksel Pontos Halk Tiyatrosu, Helleneceden çeviren: Sema Sandalcı Belge Yayinlari, İstanbul.

Sê Methelok

Berhevkar: KOÇER

1- Kes Qala Min Nake!

Rojek ji rojan salek ji salan li gundekî keçelokek hebû. Bi zîkekî têr û yekî birçî mala xwe didebirand. Rojek ji van rojan kû keçelok şivanê gund bu gazî kevaniya xwe dike û welê diaxive. Hermet li vî gundi gelo kes qala min dike an na?

Hermet: kuro ma kî te nas dike ku qala te bike!

Keçelok xwe li kerîtiyê datîne û diçe ber keriyê pez. Dotira rojê dîsa gazî kevaniya xwe dike û gotinên roja bihurî dubare dike,

Keçelok: Hermet do kesî pîrsa min kir an na?

Hermet: kuro belengazo ma di vî gundî de kî te nas dike, tu mirovekî xizan î xwezî me zîkê xwe têr bikira bila kesî tu carî qala me nekira.

Roja duyemîn jî bi vî awayî derbas dibê û di berbeyaniya roja sêyemîn de keçelok gazî jina xwe dike û pîrsa rojên bihurî dîsa dubare dike.

Hermet dîsa dilê xwe bi xwe dişewitîne û ber bi dilê zîlamê xwe ve diçe û keçelok vê carê bi angaşt dişexile;

Nexwe kes pîrs û qala min nake; hermet bi serê bavê te dê îro gundî giş qala min bikin.

Keçelok keriyê pez ji gund xewle dike. Berê pez dide mêrgeke şîn û li gund vedigere gava digihîje gola gund derpiyê xwe ji xwe dike û li miqabili bêrivanan dirî kaniya gund. Bêrivanên ku bûbûn şahedê vê bûyerê tevgera keçelok di nav gundiyan de didin olandan û ew roj rojeva gund dibe keçel rîtina wî.

Danê êvarê govê keçelok tê mal û ji jina xwe dipirse ku gelo kesî qala wî kiriye an na. Hermeta keçelok riya gotinê nadê û halo diaxive:

Kuro keçelok bi serê bavê te îro gundiyan ji te pêve qala tu tiştî nedikirin

2- Mala Pîrê

Li bajarê cizîrê li kolaneke xalî pîrejineke xizan dijiya. Pîrejîne bi alîkariya cîran û xwedanxeran debara xwe dikir. Bi rastî rojên bihar, havîn û payîzê bi saya xwedanxêran bêpîrsgrêk pîrejin didebirî lê zivistan ne hew qas asahî derbaz dibû.

Dîsa rojek ji rojên ber bi zivistanê mîrê bajêr bi halê pîrejîne dihesa û diçe mala pîrejîne . gava diçe mala pîrejîne dinêre di malê de ji bilî şalika nimêjê û misîn tu tiştek li mala pîrejîne tune ye. Dilê wî bi pîrejîne dişewite û ji pîrejîne re dibêje “pîrê ez mîrê cizîrê me ez dixwazim tu werî cem min ez ê li qesra xwe menzelekê (ode) bidim te û tu yê heta dawîya temenê xwe li cem min bijî. Erê?”

Pîrejin pir kêfxweş dibe, qebûl dike û diçe qesrê.

Ji wê roja pîrejîne qebul kirî pê de her şev gava diwan digeriya mîr gazî pîrejîne dikir, heya dawîya şevê li kêleka xwe dida rûdiniştandin. Dîsa şevêkê pîrejin li cem mîr rûniştî ye pîrejin aciz dibe (tira wê tê). pîrejîna reben hew xwe digire radibe ser xwe û berê xwe dide kolika xwe ya berê gava digihîje mala xwe, xwe vedizelîne, têr tir û fisên xwe dike û dû re bi xwe re diaxive “ooooo mala pîrê xweştir e ji mala hakim û wezîrê cizîrê; ma min ê çawa ev tir û fis li qesrê kiribûna”

3- Nimêja Mirtiba

Rojekê du heb mirtib bi hev re diçin mizgeftê. Cimaet dest bi nimêjê dike. Nimêj xilas dibe û hebo hebo mirov ber bi malên xwe ve diçin. Mela dest bi nimêja dirêj dike û ji van mirtibên me yek dertê derve li benda hevalê xwe disekine yê din li pey melê nimêja dirêj berdewam dike. Piştî demeke ne dûr ne dirêj yê ji derve têdigihîje ku hevalê wî nayê. Ji nişka ve berê xwe dide hundir diçe destê xwe datîne ser milê hevalê xwe wî dikişîne

Û ji hevalê xwe re dibêje:

“Kuro nimêjên melê hemû lê çûne, dixwaze li ser piştî min û te safî bike”

PIRTÛKXANE



RISTEMÊ ZAL (Roman)

Nivîskar: Edîb POLAT

Weşanwane: Evrensel Basm Yayın- 326

Amadekirina Bergê ya Giştî:

Savaş Çekiç

Pêkanîna Bergê:

Bahar Eroglu, Fırat Çaralan

Çapa Yekem:

Avrêl 2007


ISBN: 978-975-6101-54-9

Çapxane: Ezgî

Rûpel: 335

Destana Ristemê Zal ji mêj ve ye ku di civat û caxiyên Kurdan de tê zimên. Sedemê di edebiyata devkî de cih girtiye ji hezar salan vir ve ye hinda nebûye û nîfş bi nîfş gihîştiye heta îroj.

Nivîskar Edîb Polat ji Destana Ristemê Zal ku li her herêmî cûrbecur tê gotin bi awayê romaneke dîrokî hûnandiye û nivisandiye.



BALGÎFA MAR (Helbest)

Helbestvan: Murathan MÜNGAN

Ji Tirkî Wergerandin:

Lal LALEŞ & İrfan AMÎDA

Weşanwane: *Weşanên Lîs*

Redeksiyon û Tashîh:

Dilawer ZERAQ

Mîzanpaj:

Mîran JANBAR

Çapa Yekem:

Gulan 2007

ISBN: 978-975-6179-45-1

Çapxane: *Bariş*

Rûpel: 207

Guldesteyek ji nava helbestên helbestvanê navdar Murathan Mungan hatine hilbijartin û ji aliyê Lal Laleş û İrfan Amîda ve hatine wergerandin. Pirtûk hem bi kurdî hem ji bi tirkî ye.